# *Li ser têgîna dûalismê*

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

**Li ser têgîna dualismê**
Waşenên soran

nisana 2014

Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han

email: han-grafik@hotmail.de
https://www.facebook.com/kovaraxwenas

Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn

ISBN 978-3-94o997-34-0

**Li ser têgîna Dualismê**

Dualîsm(*), weke têgîneka felsefekî, ku wê di sedsale me de wê, xwe di çerçoveyek têgînî a derûnî, zêhnî û fizyolojîkî û hwd de ku wê, xwe ji gelek aliyan ve wê bike ku xwe werênê hanîn li ser ziman bê. Di vê serdema me ya hemdem a ku ew bi aqil pêşdikeve de wê dûalîsm, wê bi mijarên weke têkiliya di nava gîyan û laş, zêhn û fîzîkê, rûh(derûnî) û beden û hwd de wê, xwe bide hanîn li ser ziman. Li vir, fahmkirina laş a ji aliyê zêhnê me ve wê li wê re wê were lêpirsîn. Di nava têgînên zanistî ên fizyolojikî de ku wê, têgînên weke newrolojîyê li wan bihizirê, wê bi zêhn re wê li ser fahmkirina wan re wê li ser wê bi sekinê. Di vê rewşê û çerçoveyê de wê, weke têgîneka fîzyolojîkîya fîzîkî jî fahmkirina wê, çendî dikarê were kirin û ankû bibê, wê hinekî jî li ser wê were sekin in. Zêhnê mirov, bi fahmkirina mirov a laşî re wê çendî karibê, di heman ahengê û hevyekîyê de wê, weke hevdû bê û wê wusa di rewşa fahmkirinekê de bê? Ya ku wê hertimî wê temenekê gûmanekê jî bê, wê ev bê. Têgîna dûalismê, weke têgîneka ku mirov di serî de divê ku wê ji gelek aliyan ve wê hilde li dest û wê bike ku wê fahmbike bê. Di vê çerçoveyê de têgîna dûalîsmê weke rêzkarîyek felsefîkî, ku wê bi rewşa gîyan û laş, zêhn û fîzîk, rûh û bedenê û hwd re wê bi gelek aliyên din re wê weke pêşketineka hizrî a dîrokî û bi bawerî jî wê xwe bide dîyarkirin.

Rewşa têgîna têgîna dualismê, di serdema dûalîsmê a kevn de wê li ser têgîna fahmkirina gîyanê û laş re wê xwe rewşna têgînî ên bi fahmkirinê re bê. Her wusa, em ku di serî de bixwezin ku dûalîsmê di xate de wê fahm bikin, divê ku em ji xate yazdanîyê dûrnekevin. Bi wê re jî, ku em wê bi wê xate re wê hildina li dest, her wusa, em dibînin ku wê xwediyê dîrokek pirr kevn a bi aqil re bê. Têgînên weke ´bihûşt´ û ´dojehê´ ku ew weke vajî hevdû na, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê dûalîteyekê bê. Li vir, di têgîna dûaliteyê de ew têkiliya zêhnî a di nava herdû aliyan ve wê de têkiliyek navber wê hebe. Her

-------

(*)Gotina ´dualismê´ di kurdî de temenê wê li ser ´du´ û ankû ´duitîyê´ ya. Wê weke têgîneka dualiteyî wê, dîroka wê bi mejuya wê re wê, heta serdemên mîtannîyan û dibê ku ew ji wan jî kevntir herê. Lê di dema di dema bûhûrîna ji ya mîtannî li ya dema medîya de wê, Zerdeşt wê piştî Mîtra re wê derkeve û wê ev wê weke têgîneka felsefîkî wê pêşbixê û wê hizrên wê bênê ser ziman. Wê felsefeya dualismê wê care pêşî wê ji aliyê zerdeşt ve wê bi felsefe wre kirin û hanîn li aser ziman. Wê di felsefeya dualismê de wê, weke du aliyên vajî hevdû wê bênê li ser ziman. Wê vê jî li ser ahûra mazda û ahriman re wê bênê li ser ziman..

wusa, li vir, di serî de em vê yekê jî werênina ser ziman ku ew têkiliya navber, çendî wê têkilîya wan bi hevdû re wê hebe? Her tişta ku wê têkiliya wan bi hevdû re wê hebe, wê ne tenê ew têkiliya ku wê zêhnê me bide çêkirin bê. Têkiliya bi dîtinê di nav mejî û tiştê de wê weke têkiliyeka heyînî bê. Her wusa mirov dikarê wê bi rengê ku wê di temenê wê de wê sedem hebe, mirov wê werênê ser ziman. Rewşa têkilîya di nava zêhn û fîzîkê de wê, weke rewşeka ku wê bi xwezayî wê hebe bê. Heyîna fîzîkî a tiştê li jîyanê, dema ku mirov li wê dinerê, weke rewşekê ew di demê de ew heya. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku têgîna fîzîkê, wê weke têgîneka ku wê pirr zêde wê li ser wê were sekin in bê. Rewşa fahmkirina tişta heyî û ankû hebûnê, wê weke rewşeka têgînî bê. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku rewşa fîzîkî û ankû hebûnî a tiştê, wê her wusa, li ser wê heyînîya wê ya fîzîkî re wê xwediyê rewşek ku ew dikarin bi hevdû re bibina sedem û hwd.

Fahmkirina rewşa fîzîkê, di serdema dualîsmê a kevn de wê li ser heyînîya ku ew heya û têgîna wê ya bi gîyanî re wê xwe weke têgînekê wê bide dîyarkirin. Lê li vir, weke ku em bi nivîsên Zerdeşt ên avêstayî re wê kifş dikin ku wê weke ku çawa wê fîzîk û ankû laş were hanîn li ser ziman, wê bi heman rengî wê gîyan jî di rewşek darêjkî a ”heyî” de wê were hanîn li ser ziman. Li vir, rewşa gîyanê, wê di çerçoveya zindîtîya heyînî de wê weke ´hebûnek ku ew heyî´ wê hebe. Wê bi vê rengê wê heta ku wê ji wê jî ti gûman wê nebê. Nîqaşên li ser dûalîteya gîyan û laş(*), wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê fahmkirinê bê ku wê ew bi heyînî wê hebe. Em ji nivîsên Zerdeşt, fahm dikin ku wê gîyan, weke laş wê bi heyînî wê were hanîn li ser ziman. Her wusa, wê aqil, dervî heyînê laş û ya gîyanê jî weke elementek ´sêyem´ a ku ew afirî wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveya heyîna gîyan û laş de wê têgîna gîyanê, wê weke têgîneka ku ew dervî wê ya aqil jî wê hebe bê. Di vê çerçoveyê de mirov w bi awayekî vekirî kifş dike ku wê were hizirkirin ku wê têgîna gîyanê weke ´zanînek di derbarê de ku ew heyî´ wê bê hanîn li ser ziman. Li vir, weke ku di serdemên felsefeyê de dihê hanîn li ser ziman ku ´ber ku ez dihizirim ku ew heya´ êdî ew heya´ wê li vir, vajî wê, weke bi rengê ´ber ku ew heya, êdî ez dikarim li wê bihzirim´ û hwd, wê bahse wê bê kirin û wê were hanîn li ser ziman. Di serdemên berê ên dûalîsme kevn de mirov vê yekê bi awayekî vekirî bi teybetî ji ´avêsta´ wê kifş dike. Zerdeşt, weke fîlosof û teorîsyenê pêşî ê bi rêxistinkirina vê têgîna dûalîsmê ya piştî Mîtra re ya. Lê ev têgîn, weke têgîneka felsefîkî ku wê berî wan jî wê hebe li kurdistanê û ankû mesopotamîya. Gotina ´dûalîsmê´, wê di kurdî de wê weke gotineka ku wê temenê wê li ser ´du´ û

-------------

(*)JI hevdû cûda hanîna li ser ziman laş û gîyanê û li wê hizirkirina ku wê kîjan li ya din serwer bê wê, ew wê, di pirtûka Zerdeşt a avesta de wê li ser wê were sekin in. Wê di demên berî Zerdeşt de wê, laş wê weke maleka ku wê gîyan di wê de wê bijî wê were dîtin û heta ku wê, mirov wê bi laşê wî were şawitandin daku ew ji wê gîyane ku ew weke ´ketina gîyane xirab li laş´ de ku ew dihê li ser ziman ku ew ji wê were xilaskirin. Wê Zerdeşt wê ew wê qadaxabikê. Wê rast nebînê. Wê ji wê re wê rêyên din ên weke derxistina gîyanê ji laş wê werênê li ser ziman.

ankû ´duyan´ bê. Wê bahse ´du heyînan´ ankû ´du hebûnan´ wê bike. Bi vê rengê, wê gotina ´dûalîsmê´ wê bê weke gotineka ku ew ji kurdî û ankû ew li ser gotinên *kurdî* re ku ew hatibê afirandin û derhanîn li holê bê. Her wusa, wê di vê di vê çerçoveyê de wê rewşa fahmkina wê dûalîteyê wê bi xwe re wê têgînekê wê bide me. Di dewama wê de wê gotinên weke dûalîte û ankû dûîyîtî, wê di kurdî de wê temenê wan li ser du û ankû dûîyîtîyê wê rûnihê. Rewşa fahmkirina têgîna dûalîsmê, wê weke rewşek teybet a hizirkirinê a bi aqilê mirov re bê. Mirov li vir, dema ku wê dike ku wê fahm bike, mirov bi wê re çerçoveyek sererastkirî a bi aqil re kifş dike. Aqilê tiştê û ankû hebûna fîzîkî û yê gîyanê, weke aqilekî di derbarê de ê ku em divê ku wê dervî rastîya pêşketina aqilê xwe werênina ser zimman bê. Di vê çerçoveyê de wê rastîya wê were hanîn li ser ziman.

Rewşa Fahmkirina dûalîsmê, di vê çerçoveyê de wê dema ku mirov aqil weke beşek sêyem wê dihilde li dest, wê çaxê wê rewşa fahmkirinê û ankû derkkirinê wê weke rewşek giring a ku mirov divê ku wê hilde li dest bê. Rewşa fahmkirina bi aqil, wê li vir, zêdetirî weke mijareka giring a ku em divê ku wê pêşî hildina li dest û wê bikin ku wê fahm bikin.

Rastîya fahmkirina bi aqil a di nava rewşa fahmkirina têgîna dûalîsmê de wê weke rewşek fahmkirinê a ´*epîfenomen*(*)´îkî bê. Di vê çerçoveyê de weke ku mirov dikarê li ser zêhnê re ku wê dikarê were ser ziman, wê weke rewşek heyînî a dîtbarî bê. Lê wê her tişt, weke ku mirov dikarê bi destûrên hebûnê re wê fahm bike, wê xwediyê wateyekê bê. Rewşa fahmkirinê li vir, dema ku mirov bihizirê ku A û B wê bi hevdû re li ser sedemê re wê xwediyê têkiliyekê bin, ya ku wê bi xwezayî wê were fahmkirin wê ew bê ku wê A û B wê ji hevdû wê cuda bin. Ne wê A, wê weke B´yê bê. Û ne jî wê B, wê weke A´yê bê.

Di rewşa fahmkirina têgîna dûalîteya nava fîzîk û zêhn de wê, li vir, wê ev derkeve li holê. Mirov, dikarê ya ku mirov bi zêhnê xwe girt weke ´fahmkirinê´ wê bi ya fîzîkî re wê di hevyekîyekê de bê? Li vir, ev rewş, wê her wusa, wê weke rewşeka ku mirov wê karibê bi têgîna dûalîsmê re rewşa zêhnê di çerçoveya têrgirtin û ankû kêmgirtinê de wê bike berlêpirsînê de jî bê. Rewşa fahmkirina me, li vir, ew a ku mirov bi dîmenî û dîtbarî, ya ku wê bibînê bi seha xwe ya dîtinê, wê ew wê hilde û bigirê. Lê di aslê xwe de wê ya ku mirov bi wê dîmenê wê yê ku ew hatîya dîtin re wê tenê weke hinek ji wê fahmkirina wê ya fîzîkî a bi zêhnê bê. Yanî, weke ku mirov ji vê fahm dike, wê ew bê ku aqilê mirov û ankû zêhnê mirov, tenê ya ku ew dîbînê wê di xwe de wê digirê. Ev jî, wê tişta ku ew weke ´zanîna wê´ ya û ew hatîya girtin, wê wê tiştê û ankû hebûnê hemûyî di nava wê dîtina wê zêhnê de wê ne xwediyê wateyê bê. Yanî,

-------------

(*)Epîfenomen wê, weke têgîneka ku wê bawer bikê ku wê aktiviteyên hizirkirinê ên meji ne lê wê bêjê ku gotinên zêhnî wê bandûra wan li meji nebê. Weke wê, tirs ji nirgizê cûda ya, lê li ser nergizê bandûra wê nîn a.

bi gotinaka din, wê ew were dîtin û fahm kirin ku wê aqilê mirov wê dema ku ew fahm dike, wê têrê nekê ku ew tiştê bi tememî wê fahm bike. Her wusa li vi, tişt û ankû ew hebûn, wê bi vê rewşa xwe re wê wê girtina mirov a zêhnî wê bi xwe re wê bike berlêpirsînê de. Rewşa fahmkirinê wê li vir, weke aliyekî giring ê ku mirov di vê çerçoveyê de li ser wê bisekinê bê.

Rewşa fahmkirinê, li vir, mirov dema ku wê dike ku wê hilde li dest, wê di serî de wê bi rewşa fahmkirina zêhn û fîzîkê de wê xwe bide hanîn li ser ziman. Li vir, em dikarin wê girtina mirov a zêhnî a ji fîzîkê weke bi gotina sedemê´ re wê werênina ser ziman. Ez wûsa di wê zanê de me ku wê ya ku wê weke biriqîna wê fîzîkê bê, wê çawa bi gotina sedemê re wê xwe werênê ser ziman, wê mijaraka ku wê pirr bigûman bê.

Em li vir, divê ku vê rewşê hinekî din, ji ber vê yekê bi kûrehî li ser wê bisekin in û wê bikin ku wê fahm bikin. Rewşa ku mirov wê dike ku wê fahm bike, her wusa, wê weke rewşek teybet a bi aqilê mirov re bê. Aqilê mirov, wê ne têr bê ku ew wê bi temenî wê fahm bike bê. Ya ku mirov wê dibînê ku mirov wê fahm bike, wê ev ne têr bê ku ew hebûnê û ankû wê tişta fîzîkî a ku ew dihê dîtin ku wê karibê wê bi fahmkirinekê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de rewşa fahmkirina bi aqil, wê her wusa weke rewşek teybet a ku mirov wê bike ku wê fahm bike.

Li vir, mirov dikarê bêjê ku ya rewşên zêhnê weke sedema rewşên sedemên fîzîkî na. Lê li vir, em divê ku vê pirsê jî bikin, wê di rewşa fahmkirinê de wê tişt ew dîtina wê ya ku mirov ew bi zêhn ew girt, wê çawa bi wê gotina sedemê re wê were hanîn li ser ziman? Li vir, ev rewşa bi dîtina fîzîkê û rastîya wê re wê rewşa fahmkirina bizêhnê ku ew li ser gotina ´sedemê´ re ew dihê ser ziman, wê awrekî gûmanî li ser wê bide çêkirin. Tabî, dema ku rewş bi vê rengê ew dihê ser ziman, wê hingî bi xwe re wê rewşek din jî wê bide dîyarkirin. Ew jî ew a ku wê rewşa zêhnê me, wê karibê li ser rewşên fîzîkî bandûrê çê bike. Di sedsale me de wê newrolojî û hwd, wê bi têgînên weke derûnîyê û hwd re de wê hinekî jî di vê xalê û çerçoveyê de wê serî li ser rewşa têkiliya di nava zêhn û fîzîkê de wê bide westandin. Li vir, rewşa fahmkirina fîzîkê, wê tenê karibê sedemekê bo me çê bike? Li vir, ya ku wê nebê, wê ev bê. Li vir, di serî de têgîna sedemê, divê ku mirov hinekî jî li ser rewşa dîtbarîya fîzîkî re wê hilde li dest Zêhn, wê hinekî tenê di rewşa fahmkirinê de wê di pozisyonekê de bê. Fahmkirin, wê çendî karibê, li ser qarakterê mirov bandûrê çê bike? Hinekî jî, di vê çerçoveyê de mirov dikarê serî bi vê xalê re li ser wê biwastênê.

Em li vir, divê ku vê yekê jî di dewama wê de wê werênina ser ziman ku wê zêhn, wê bi fahmkirinê re wê hebe. Fahmkirin, wê bi laş û gîyanê re wê ´bi serê xwe´ wê hebe. Yanî, bigotinaka din, wê zêhn, ji ezmûnên jîyane mirov bê. Li vir, du têgîn, wê hebin ku wê werina ser ziman di nava rengê pêşketina dûalîsme kevn de. Yek ew a ku wê bi wê were bawerkirin ku ´wê aqil, ji aliyê xwûdê ve wê were dayîn li mirov.´ Lê li rex wê jî wê, bê bawerkirin û hizirkirin

ku wê ji ezmûnên mirov jî wê aqil biafirê. Li ser wê re weke hizrek sêyem jî wê were ser ziman ku ´ew aqilê ku xwûdê daya, wê ew bi ezmûnên jîyanî wê pêşbikeve.´ Yanî bi gotinaka din, dihat gotin ku wê jîyan xwe di nava aqil de wê werênê ser ziman û ankû wê jîyan xwe di nava aqil de wê bide hanîn li ser ziman.

Rewşa fahmkirina aqil, wê di vê çerçoveyê de wê were hanîn li ser ziman. Lê bi wê re wê weke têgînekê wê ew întîba di rengê hanîna li ser ziman a têgîna dûalîtîkî de wê bi mirov re çê bibê ku ´wê, bo jîyankirinê zêhn, ne mihtacê heyînek fîzîkî bê û wê fîzîk, ne mihtacê zêhnê fîzîkîyekê bê ku ew bi wê bijî bê. Yanî, wê karibin, bi serê xwe bijîn. Di vê têgîna fahmkirina zêhnê de wê bê hizirkirin ku wê ´zêhn, wê weke tozek ku ew di mekana ku ew ne zêhna, wê di wê de belavbûyî wê hebe.

Di serdemên kevnera de wê were hanîn li ser ziman ku wê mirov wê hem xwedîyê gîyanê bê û hem jî wê xwedîyê laş bê. Laş wê bi demê re wê ji holê rabê û wê herê. Wê gîyan bimênê. Zerdeşt, bi têgîna ´wê her tişt li aslê xwe vegerihê´, wê bike ku ew vê rewşê werênê ser ziman. Minaq, gîyanek pîroz û serdem ew heya û wê her gîyan wê li wê vegerihê. Bêhn wê herê hewayê. Laş wê herê axê.

Di nava vê rewşê de wê li ser rewşa aqil û hebûna aqil jî wê weke beşek sêyem wê were hizirîn. Ew jî, wê li rex laş û gîyanê wê li wê were hizirîn. Di wê demê de mirov fahm dike ku wê li ser mirinê û jîyanê re wê pirr bi aqil jî wê werê hizirîn. Her wusa, piştî ku laş mir, wê çi ji aqil were? Di vê çerçoveyê de wê pirr zêde wê li ser wê were hizirîn.

Li vir, em dema ku wê dihizirin, bi wê re em wê jî kifş dikin ku wê aqil, wê pirr zêde wê weke beşek teybet wê li wê were hizirîn. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê di çerçoveya aqilê kirinî û ankû piretîkî de wê hebûna aqil wê di gîyanê û laş de wê were hanîn li ser ziman. Bi aqil re wê, tişta baş û nebaş û hwd, wê bi wê re wê were kifşkirin. Têgîna ´başî´ û ´nebaşîyê´ wê wek têgînek bi aqil wê were dîtin. Heta roja me jî ku wê weke têgîneka wê encama wê bê ku wê di nava kurdan de wê bê bawerkirin û wê gotin ku ´mirov, bi aqilê xwe ya baş û ne baş ji hevdû kifş dike û derdix´, wê di çerçoveya vê têgînê de wê hatibê gotin bê. Aqilê baş, wê li vir, wê derkeve li pêş. Li gorî ya ´baş´ mirov ku wê bihizirê û wê werênê ser ziman. Di aslê xwe de wê ya ´têgîna başîyê´ wê weke têgîneka bipîvanî wê derkeve li pêş. Her wusa, wê weke xal û rêgezek aqilê mirov ê ku ew bi mirov re pêş dikeve jî bê. Rewşa bi fahmkirina ´aqilê baş´ re divê ku mirov wê bi teybetî hilde li dest. Em vê yekê bi Zerdeşt û zaneyên dema wî ên bawerîya yazdaniyê re dibînin ku wê ´aqilê baş´ weke têgîneka bi pîvan wê were hiildan li dest. Her wusa, wê di jîyanê de di nava aqilê mirov ê kirinî û her wusa rengê pêşketina rewîst û qarakterê mirov de jî wê têgîna aqilê baş, wê weke rewşek rêgezî wê were hildan li dest. Wê ne tenê weke hêstekê wê were hildan li dest.

Mirov, di wê jîyane ku wê dijî de wê kifş bike ku wê ´çi baş´ bê û çi ´ne baş´ bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê li ser wê bihizirê. Hizirkirina li ser aqilê baş, wê şêwayekî aqil ê dervî fîzîkê a li ser tevger, kirin û nerîna li rewşê re wê bi xwe re wê pêşbixe. Em li vir, vê yekê jî kifş dikin ku wê di temenê têgîna kirinî de ku em bi aqilê kirinî re werênina ser ziman, wê ´xwestek´ weke rengekî û ankû destûrek heyînî a kifşkar wê xwe de bidîyarkirin. Li vir, mirov wê kirina ku mirov wê dike, mirov wê dihizirê û dike. Her wusa ew hizirkirin, wê di wê de wê mêylek, xwestekek bi hizrî wê hebe. Ew, hatibê dîyarkirin. Aqilê mirov ê kirinî ku ew bo wê weke rêgezekî pêwîstî bi kirina çalakiyê heya bo bûyîna wê, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek heyînî wê êdî wê xwe werênê ser ziman.

Rewşa fahmkirinê li vir, em dema ku bi aqil re di vê çerçoveyê de wê bikin ku wê werênina ser ziman, em divê ku wê jî bi wê re werênina ser ziman ku wê aqilê kirinî, wê xwe weke rewşek dîyarker wê bide dîyarkirin. Kirin, her wusa, li vir, wê tevger û ankû çalakîya mirov, wê d hîmê wê de weke rêgezek destûrî wê hebe. Wê li ser wê re wê xwe werênê ser ziman.

Di rewşa fahmkirina aqil de em li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku ya ku ew bi aqil re li vir ew dihê dîtin ew a ku aqil weke rewşek têkiliyê a navbera gîyanê û laş û ankû têkiliya nava fîzîkê de wê hebe. Em li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku bi wê bi têgîna dûalismê wê rewşa nerînê a bi dîtinî ku ew hatî girtin, wê bi wê rewşa fîzîkî û ankû hebûnî ku ew ji wê bi biriqîna wê hatîya derhanîn, wê di rewşekê de di hemanê de bê. Di rewşa di weke wê bûnê de jî wê ev rewş, wê aliyê dîtinî, wê weke têgînekê wê bimênê. Li vir, em divê ku vê yekê jî bibêjin ku wê hertimî ev jî wê werê nîqaşkirin ku wê ew fîzîk û biriqîna wê ya weke aqilê wê jî ku ew dihê bi navkirin, wê karibê bibê weke wê û ankû na. Ev rewş, wê rewşek ku wê pirr zêde wê li ser wê, wê bi hizirkirinê wê were sekin in û hizir kirin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku rewşa aqil, li vir, her wusa, wê di rewşek ku wê biwê re wê were lê hizirîn bê. Di nava serdemên dûalîtîkî ên berê de ew jî hatîya hizirîn ku wê ew dengê ku mirov derxist, ew gotina ku me bi deng bi lêv kir, ew hizirkirina ku me bi demê re kir û ew jîyane ku me jînkirîya, wê ew di nava mekan, dem û fezeyê de wê bijî. Ew nemirê. Ev jî, wê weke rewşekê wê hertimî ku wê heta roja me jî wê di nava kurdan de wê were hanîn li ser ziman bê.

Em li vir, divê ku vê jî werênina ser ziman ku rewşa aqil, wê di nava gîyan û laş de wê weke rewşek ku ew heya bê. Çendî ku li ser tevger, kirin û çalakîyên mirov ên ku mirov wan dijî de ku wê aqil weke rewşek têkilî wê hebe jî, lê wê di aslê xwe de wê wê weke elementek pêşketî û afirî a bi serê xwe bê. Her wusa, ew tenê bi serê xwe ya û di mejî me de ya. Tişta ku ew dibînê bi nerîna mirov re wê di xwe de wê qayd bike. Wê her tişt, jîyankirin, tevger û her çalakî, wê hinekî jî aqilê kirinî bê. Mirov, wê li ser têgîna aqil re wê bigihijê têgîna

başîyê û nebaşîyê. Mirov wê bi aqil re wê, kifş bike. Ev jî, wê weke rewşekê wê werê ser ziman. Li vir, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku ya ku wê were dîtin ew a ku wê her tişt ku ew zindî bê û ne zindî jî bê, wê bêî aqil wê di rewş bêalî de bê û ne di çerçoveya têgîna darazî de bê. Têgînên weke ên başî û nebaşîyê, wê weke têgînna darazî bin. Têgîna darazîyê(*), wê weke rewşên rewîst û hwd, wê rengê aqilê kirinî ê dervî fîzîkê wê bi xwe re wê werênina ser ziman. Lê em vê jî bi wê re divê ku wê werênina ser ziman ku wê aqilê kirinî, wê bi wê re wê di nava xwe de wê bihiş bike.

Aqil, di serî de hişê mirov ê di derbarê mirov de ya. Mirov bi wê re di derbarê xwe de bi hiş a. Mirov xwediyê hişê xwe bixwe ya. Yanî, bi gotinaka din, mirov xwediyê hişê hebûna xwe ya. Hebûna mirov, dervî aqil bi laşî û ankû fîzîkî ew heya.

Rewşa têgîna fahmkirinê a biqil, wê li vir, wê weke têgîneka teybet a bihişmendî bê. Her wusa aqil, wê li vir, xwediyê têgînek teybet a metafîzîkî bê. Em vê yekê jî bi wê re wê kifş dikin. Aqil, ji kûve hatîya? Armanca bûyîna wê, çi ya? Aqil, çawa heya? (*) Wê heta kengî wê aqil hebe? Wê aqil di dawîya xwe de wê bigihijê çi? Cihê berê aqil bi wê ve ya û aqil diçiyê de, ew kûder a? Her wusa bi vî rengî mirov dikarê pirsên ku mirov wan bike zêdetir bike. Bersiva van pirsan, wê ji aliyekî ve wê aqilê me jî wê hin bi hin wê bi xwe re wê li ser rewşa bûyîna fîzîkê(*) re wê pêşbixe. Ji aliyekî ve bûyîna fîzîkê û piştre ji holê windabûna wê, wê weke rewşek di xizmeta pêşketina aqilê mirov a di jîyanê de bê. Bi wê re jî çendî  ku wê aqil pêşbikeve, wê bi wê re wê hiş wê xwe bide dîyarkirin. Hiş, wê bi hebûna xwe re wê wê nêvî bi nêvî xwezayî bê û nêvî bi nêvî jî wê nexwezayî bê. Her wusa, wê ev herdû alî jî wê hevdû wê temem bikin. Her wusa, aqil, dema ku em bi hizirkirinê dikarin bi wê re biafirênin, têgîn û darazan pêşbixin û hwd, wê ev weke aliyekî wê yê afrîner bê. Her wusa, di nava mekan û demê de wê li ser pêvajoyên bûyîn û nebûnê ên fîzîkî û hwd de wê aqil, weke rastîyek ´mayînda(*)´ a di demê de bê. Ew jî, wê xwe bide jîyankirin. Weke ku wê heta roja me jî di nava kurdan de wê bi navê Zerdeşt re wê werê hanîn li ser ziman ku ´aqil, piştî ku ew bû û pê de, wê êdî ew aqil wê hebê û wê winda nebê. Tevî ku mirov piştre bimirê û herê jî wê, ew aqil, piştre wê hebûna xwe wê bide domandin. Şîroveyên ku wê li ser wê aqilê re wê

------------------

(*)Daraz wê muhakame mirov bê. Dema ku mirov li ser rewş û bûyarekê aqil meşend wê ew wê bibê.

(*)Dema ku mirov berê êqil ku ew bi kûve ve û diçê kûderê ku mirov bi wê rengê li wê bihizirê û wê lêbipirsê wê, ew wê bibê weke rewşeka ku mirov wê, dikarê bi têgîmnka metafizkî re jî wê werênê li ser ziman bê. Di wê rengê û awayê de wê, têgîna metafizika aqil wê, xwe bi wê rengê aqilkirin û hizirkirinê re wê bide dîyarkirin bi mirov re. Li vir wê, ev wê weke aliyekê aqilî ê şûbjektiv wê, mirov dikarê wê, di çerçoveya daraza xwe de jî wê werênê li ser ziman û wê, fahmbikê. Di wê rengê û awayê de wê, ev wê, weke aliyekê wê yê giring bê ku mirov wê, li wê bihizirê û wê fahmbikê bê.

(*)Bi gotina bûyîna fizikê re wê, rewşa hebûna fizikê û ku mirov ji wê gav biavêjê wê were li ser zimam.

(*)Bi gotina mayindatiyê re wê bahse tişta ku ew ji holê neçê wê were qastkirin.

werina kirin, wê pirr balkêş bin. Heta roja me jî wê, di nava kurdan de wê werê gotin ku ´piştî ku mirov mir, wê ew aqil ji kirinên me re li hemberî ´dadgeha mehşerê´ wê şahîdîyê ji mirov re bike. Ev gotina ku wê bi wê re têgînek mayînda wê bi navê aqil wê di xwe de wê bênê ser ziman, wê li ser wê rewşa aqil re wê bê gotin.

Di vê çerçoveyê de wê rewşa aqil û hanîna wê ya li ser ziman, wê bi hanîna wê ya navendî re wê xwediyê wateyê bê. Ku aqil nava gotina A bê û hebûna gotina aqil jî B bê, wê ev herdû alî wê ne weke hevdû bin. Her wusa, Aqil, wê ya ku bibînê wê werênê ser ziman. Her wusa, bi wê re mirov dikarê wê jî werênê ser ziman ku aqil, wê navaroka wê weke gotinaka ne şenber bê. Em bi gotina aqil re bahse çi aqilê dikin. Her wusa, em dema ku bahse aqil dikin, em bahse hemû hanînîya li ser ziman dikin. Gotina aqil, dikarê ji van hanînên li ser ziman re bibê nav? An jî, dema ku mirov bahse gotina aqil dike û ankû gotina aqil bi nav dike, mirov dikarê bênê ser ziman û bibêjê ku wê aqil, hemû hanînîyên li ser ziman, wê bi xwe re wê werênê ser ziman? Di xwezayê de wê aqil, weke mijarek giring bê. Her wusa, bi aqil re wê tişta ku ew weke biriqîna tiştê ku ew heya wê were hanîn li ser ziman.

Di nava kurdan de dema ku wê di demenên berê de wê bahse aqil biheta kirin, wê aqil weke ´kefa sabûnê´ wê li ser hebûna fîzîkê a ku ew heyî li jîyanê re wê bihanîyan li ser ziman. Bi vê rengê, wê hinek gotinên bi vî rengî ku wê bi hezaran salan wê bên hanîn ser ziman, wê hebin. Hebûna aqil û tiştayîya wê ya heyînî û hebûnî, wê dervî têgîna gîyan û laş wê bê hanîn li ser ziman.Lê bi demê re wê nîqaşên ku wê werina kirin, wê di wan de wê bahse hebûna laş ku ew jî bi demê re wê di demekê de wê hebe û wê di demek piştî wê heyîna xwe ya di demê de re wê êdî ew nebê, wê werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi têgîna ´demekê heya û demek piştre nîn a(*)´ wê ew heyîna wê ya fîzîkî wê werê hanîn li ser ziman. Têgîna ti tişt weke xwe namênê, wê weke têgînek rêgezî a destûrî wê were hanîn li ser ziman. Bi heman rengî, wê di dewama wê de wê li ser wê têgîna ku wê her tişt, wê weke xwe menênê re wê bê hizirîn. Hewldana fahmkirina wê rastiya ku wê her tişt weke xwe nemênê, wê weke mijaraka ku wê hertimî di mejiyê mirov de wê miriov meşkul bike bê.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê di dewama wê de werênê ser ziman ku wê têgîna ´her tişt, wê weke xwe nemênê´, wê weke têgîneka bûhûrîner bo hemû tiştên fîzîkî ên ku ew hena bê. Em divê ku vê li ser rewşa fîzîkî a ku ew heya re wê fahm bikin. Tiştekî ku ew heya, wê ew gûharîn bi wê re heya. Yanî, têgîna gûharînê, weke ku em bi kurdî jî ji wê fahm dikin, di xwe de wê weke kirdeyek vêşarî wê  têgîna hebûna fîzîkî a tiştê jî wê bi zindîyî û ne zindiyî wê di xwe de

-----------

(*)Wê dema ku mirov bêjê demekê heya û demekê nîn a wê, ew wê bê weke darazaka li ser rewşa fizikî re jî. Fizik jî û tiştên bi wê re hena ku ew çi jî bin wê, weke xwe nemênin û wê bi demê re wê bi gûharin, awa û reng bi gûharênin û wê, piştre wê, ji holê biçin. Weke ku çawa mirov tê dunyê, mazin dibê, pîr dibê û piûtre dimirê wê ev wê weke destûreka fîzîkî a ku wê li hemû rewşên hebûnî wê serdest bê bê.

wê bihawênê. Rewşa fahmkirina têgîna´ti tişt, wê weke xwe nemênê´,wê weke têgîneka ku ew li ser rastîya fîzîkê re ku ew wê were ser ziman bê. Li vir, ev dihê fahmkirin ku wê bo ku ew gûharîn bibê, divê ku ew hebûnîya fîzîkî a tiştî ew divê ku ew hebe. Yanî li vir, wê gûharîn, ji xwe re wê hebûna fîzîkî, bike hîm bo ku ew hebe û bibê. Rewşa tiştê, wê hertimî di vê çerçoveyê de wê mijara nîqaşê bê. Tişt, bi wê rewşa xwe ya demkî a ku ew di wê de heya re wê, were herêkirin ku ew heya. Yanî, li vir, têgîna dûalîsmê, wê heyîna tiştî a demkî ku ew heya wê herê bike. Heta ku wê, ew wê weke pêwîstînîyeka jîyanî bibînê bi rewşa wê ya gûharînî û heyînî re. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê vê jî werênê ser ziman ku wê tişt, wê weke heyîna ku ew heya, wê aqilê me, wê ew wê herê bike. Aqilê dûalîtîkî, wê ew vê yekê bi xwe re wê bike. Her wusa, weke rêgezekê, mirov dikarê vê jî di dewamê de werênê ser ziman ku wê aqil, bi herêkirina wê hebûnîya fîzîkî re wê, di çerçoveya têgînek rastîtîyî de wê xwediyê rengekî hizirkirinê a li ser wê rewşa fîzîkî bê. Ev wê hebe. Lê bi wê re wê, ew tişta fîzîkî ku ew heya, wê ew weke heyînekê wê were dîtin bi aqilê me re. Aqilê me, dema ku wê tiştê dibînê, çendî dikarê weke wê tiştê di heman wekhevîyê û ankû hevyekîyê de bê? Li vir, em dema ku di çerçoveya têgîna hevyekîyê de li wê rewşa fîzîkîyê a hebûnî, dihizirin, em wê bi wê re dibînin ku wê li vir, çendî ku wê aqilê me, wê weke di hevyekîyekê de bê bi wê heyîna ku ew ji wê dibiriqê jî, lê wê aqil, wê bi xwe re wê weke rewşek dîtbarî bê. Wê, tenê bi serrûtîya wê ya ku ew bi dîtina çav re dibînê re wê ew dîtin bi sînor bê. Minaq, em dema ku em di destpêkê de kefa sabûnê dibînin, em w kefa sabûnê, weke kefa sabûnê wê dibînin û herê dikin. Ew wê bi heyînîya xwe re wê were li berçav, lê ew di hîmê wê yê heyînî de wê, çi hebe jî ew wê weke rewşek hundûrînî wê hebe. Wê ew rewş, di wê de bin. Em dema ku bahse kefa sabûnê dikin, em sabûnê jî û avê jî weke kirdeyna vêşarî bi wê re weke ku wan bi wê re dihênina ser ziman. Lê ew tenê li ser zanîna me ya ku ew di temenê wê de ya ku em dizanin a. Me berê dîtîya ku wê aqil, wê di temenê wê de sabûn hebe, wê av hebe û wê hewa wê hebe.

Rewşa fezeyê, mirov dikarê wê bişibihênê wê kefa sabûnê, ew jî wê bi wê re wê dayîmî weke wê hewaya ku ew di nava kefê de dibê û wê dayimî weke ku mazin dibê bê. Wê bi wê re wê hertimî wê ew kef, wê mazin bibê. Lê ew kef, wê weke ku wê bi wê heyîna xwe ya hebûnî a fîzîkî ve wê ji aliyekî ve wê kêm bibê û ji holê winda bibê û ji aliyekî ve jî wê, ew li wê zêde bibê. Hiinekî wê ev jî weke reng û şêwayekî giring ê wê têgîna gûharînê a li ser fîzîkê re jî bê.

Rewşa fahmkirina fîzîkê a bi aqil re wê, weke rewşek teybet bê. Wê aqil, hertimî di ya ku ew di wê de bihişa re wê xwediyê wê rewşa aqilî bê. Yanî, li vir, ew bi ezmûnî dihê dîtin û derdikeve li holê ku em divê ku rewşa aqilkirinê, divê ku wê li ser hiş re wê hildina li dest. Her wusa rewşa hişkirinê, wê weke aliyekî giring ê ku mirov wê divê ku wê hilde li dest. Rewşa aqil, wê weke rewşa ku mirov bi hiş bê. Bi aqil, mirov wê di hişê xwe bixwe de jî bê.

Aqil, li vir, wê weke rewşek giring a fahmkirinê wê xwe bide dîyarkirin. Em li vir divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê aqil, xwezayê, wê bi dîtinê re wê dinava xwe de wê qayd bike. Aqil, rewşa wê, ew a ku bi wê rewşa fîzîkî a hebûnî re ku mirov li wê dihizirê, wê ji wê zêdetirî wê weke ku wê ew xwediyê têgînek mayînda bê. Di nava kurdan de wê hebûna aqil, weke têgînek ´*sermed*´ wê werê hanîn li ser ziman. Yanî, bi gotinek din, wê nemirîbûnek(*) wê li aqil wê were baxşkirin. Li ser wê re wê gelek têgînên ´axîretî´ wê werênina ser ziman. Minaq, gotina weke "mirov, piştî ku mir wê ew aqilê me yê ku me ew hizir kirî, wê bi rengê xwe re wê weke ku ew bê şahîdê me di ´dadgeha axîretê´ de. Her wusa, li gorî kurdan, mirov ku tişt hizirî û pê de, ew êdî heya. Mirov, nikarê wê înkar bê. Mirov, çendî ku wê înkar bike jî wê ew hebe. Wê ew newê înkarkirin. Bi înkarkirinê jî, wê ew newê ji holê rakirinê. Tiştekî ku ew hebe, ku mirov bêjê ´ew nîn a´ wê nebê nîn a. Ew ku heya, wê hebe. Li vir, weke rêgezek destûrî, wê tişta ku ew bûya, wê hebe bê. Divê ku mirov wê herê bike. Li ser wê re wê bahse wê were kirin. Aqilê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê were hizirkirin. Wê ew aqil, wê were hanîn li ser ziman.

Rewşa hanîna li ser ziman a aqil, li vir, divê ku mirov hinekî din jî li ser wê re kûrtir herê. Her wusa, ya ku wê ´navê xwûdê´ jî wê mayînda bike, wê dîsa aqil bê. Di aslê xwe de mirov, dikarê ´navê xwûdê´, weke birhana nemirîtîya bi aqil re jî li vir werênina ser ziman. Weke têgînek bihiş mirov dikarê wê di vê çerçoveyê de wê werênê ser ziman. Her wusa rewşa fahmkirina aqil û hanîna wê ya li ser ziman, wê weke rewşek jîyanî bê. Jîyanîya bi aqil re wê bi rengê hem zindîyî bê û hem jî ne zindiyî bê. Aliyê zindîyê ku mirov jî di nav de ya, wê tenê aliyek ji wan herdû aliyan bê.

Li vir, em divê ku vê jî fahm bikin ku wê aqil, weke aliyekî giring, wê xwe bide dîyarkirin. Ew giringîya wê, wê bi wê têgîna wê ya heyînî a bi gotina mayîndatîya wê ya navxweyî re bê. Rewşa fahmkirina aqil, wê bi wê re wê xwediyê rewşek bi vê rengê bê. Mayîndatîya bi aqil re wê li vir, xwe li ser hizirkirinê û rengê hizirkirinê re wê bide dîyarkirin. Her wusa, hizirkirin, wê li vir, bi serê xwe wê weke mijareka ku em li vir di dewama vê mijarê de ku wê, hildina li dest bê. Mijara hizirkirinê, wê weke rewşeka ku wê dema ku mirov dihizirê, mirov bi çi di hizirê re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî wê, xwestek, mêyl û hwd, wê xwe di hîmê hizirkirinê de wê werênina hanîn li ser ziman. Xwestek, wê weke têgîneka ku wê rengê mêyla hizirkirina me wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Li vir, em divê ku têgîna xwestekê, li ser hizirkirinê re wê, hinekî din kûrtir hildina li dest.Wê fahm bikin. Wê ev têgîna ´xwestekê´ wê biqasî têgîna ´başîyê´ û ´nebaşîyê´ wê giring bê di rastîya

------------

(*)Hizra nemirbûnê wê weke hizreka ku wê li jîyanê wê bi gîyanê re wê li ser ziman. Piştî mirina li dunyê hebûna jîyanê wê hinekî jî wê di wê çerçoveyê de wê, were li ser ziman. Di destana gilgamêş de wê, ew li nemirbûnê wê bigerihê û wê bikeve pey serûwane wê de. Destan di derbarê wê rêwitiya wî de ya. Ev dide nîşandin ku wê bi wê rengê wê were bawerkirin ku nemirbûn heya ku mirov xwe bigihêniyê de.

fahmkirina aqil de. Xwestek, di nava rewşa aqilê me de wê weke rewşek teybet a hizirkirinê a hîmî jî bê. Wê bi xwe re wê rengê aqilê me bide dîyarkirin. Mirov, li vir, xwestekê divê ku weke têgîneka hizrî a ku ew bimêylî wê berê hizrê me wê bide dîyarkirin bê. Têgînên weke hazê û hwd ku wê Epîkuris(*) wê di nava felsefeyê de wê derve li pêş, berî wî wê Zerdeşt, wê di nava bawermendên xwe de wê li ser wê nîqaşna bide kirin. Wê hewl bide ku wê rastîya xwestekê fahm bike. Ya ku xwestekê dide dîyarkirin çi ya, wî xwestibû ku wê fahm bike.

Xwestek, wê weke têgînek hizrî a hîmî wê di temenê rengê hizirkirinên me yên weke bi ´başî´ û ´nebaşîyê´ de jî bê. Hizrên weke ên başî û nebaşîyê, wê weke hizirna ku wê li ser rengê dîtina xwestekê re wê xwe bidina dîyarkirin bin.

Mijara hizirkirinê, wê di nava dûalîsmê de wê, weke mijarek teybet bê. Wê bi wê re wê weke têgînek hevrastîtî a ku ew pêş dikeve bê. Tişt û ankû hebûna ku ew dîtina wê ji wê dibê, wê hertimî mijara nîqaşê bê ku wê di nava wan de hevyekî hebe û ankû wê nebê. Ev rewş, wê weke rewşek teybet a fahmkirinê ku wê mirov pirr zêde wê li ser wê serî biwastênê bê. Di nava wê têgîna dûalîsmê de wê hizirkirina bûyîna tiştê û dîtbarîya wê, wê weke têgîneka ku wê bi hevdû re di ahengê de bê. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê têgîna bûyîna hebûnê û ankû tiştê û ya dîtbarîya wê, ku mirov li ser wê dihizirê, bi bûyîna tiştê re ew afirîna dîtbarîya wê, ew rewşa weke ya heyîna hevyekîyê di nava wan de wê weke rewşek dîtbar a ku wê bi hevdû re di ahengekê de bê. Li vir, rewşa derkkirinê û ya heyîna ku ew ji wê derkkirin bûya, wê weke rewşek di wê çerçoveya wê têgîna hevyekîyê de ku wê xwe bide dîyarkirin bê. Derkkirina mejiyê mirov, her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê li ser derkkirina di xwe de wê rewşek ku wê bi hevdû re di ahengê de bê, wê li vir wê bike wê bide dîyarkirin. Lê li vir, dema ku em ji aliyê derkkirina mejî ve jî wê hildina li dest, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê rewşa bûyînê, wê hertimî li vir pêşanî û paşanîya wê, wê hebe. Kîjan pêşî wê hebe û kîjan piştre wê xwe bide dîyarkirin, wê bibê. Em dema ku li ser rewşên dîtbarî re ku em bi têgîna derûnîyê dihizirin, her wusa ya ku mirov bi hizirkirina xwe re dibînê, wê ew bê ku wê carna wê rewş wê biafirê û wê derkkirina wê li ser wê re wê paşê wê bibê. Lê derkkirina ji rewşê, di mejî de carna jî dikarê bi şêwayekî ku ew dikarê xwe bide pêşxistin li ser ezmûnên mirovî re ew dikarê ne wekhevîyekîyê bi rewşê re ew bide dîyarkirin.

Li vir, rewşa têkiliya di nava herdû rewşan de wê, weke rewşek têkilî a navber ku wê xwe bi rewşê re wê bide dîyarkirin bê. Rewşa têkiliyê, dema ku ew dihê

-----------

(*)Epikur we filosofek greki bê û li dora 341ê berî zayina isa wê bijî. Wê dibistanaka bo perwerdekirinê ku wê weke ´baxçê epkur´ jî were bi navkirin wê avabikê. Wî felsefeya rewîstê pêşxist û li ser şahî û neşahîyamirov û sedemên wê hizirkir û hewlda ku wê werênê li ser ziman. Li gorî wê, biqasî ku mirov karibê bi wê bijî û bi tendûrûst bê bixwe. Lê ya zêde weke xwarin û hwd wê, ne baş bê. Bi vê rengê wê hizra *têrbûnê* wê derxê li pêş û li ser wê bisekinê

ser ziman, bi wê re di dih de weke ku ew dihê hanîn li ser ziman, têgîna *´sedemê´* ew dihê berbîra mirov. Li vir, rewşa hevyekîya rewşê û dîtbarîya wê de wê, weke têgîneka ku mirov wê li vir rastîya wê baş fahm bike wê li holê bimênê. Di vê rewşê û xalê de wê mijara têgîna ´sedemê´ wê ji gelek aliyan ve wê li ser wê were hizirîn. Di rewşek weke ya hevyekîyê de wê fahmkirina têgîna sedemê, wê hinekî xwe li şûn bihêlê. Wê xwe zêde nedê dîyarkirin li pêş. Ev tê çi wateyê? Ev tê wê wateyê ku mijare têgîna sedemê, wê weke mijareka ku wê li vir, weke mijareka cuda bê ku mirov wê hilde li dest. Di çerçoveya vê têgîna hevyekî a dualîstîkî de têgîna sedemê, em nikarin di hemû rewşan de wê hildina li dest. Her wusa, wê bi wê re wê di gelek rewşan de wê di nava wê rewşa bûyînê û dîtbarîya rewşê de wê weke dervî wê nerîna dîtbarîyê wê sedem bimênê. Di roja me de zanist pêşketîya. Bi teybetî zanistên weke derûnîyê û ên newrolojîyê ku ew bi wê re wê di têkiliyek felsefîkî û enîşkî de bin, di warê wê têkiliya di nava rewşê û dîtîna wê de wê dem bi dem bahse ne li hevdûbûnekê jî bikin. Ev rewşa ku weke rewşek ´nelevkirî´ xwe di nava rewş û dîtîna wê de dide dîyarkirin, wê bibê sedema wê ku wê hinek têgînên bi rengê ku ew wê têgînên weke hevyekîya di nava rewşê û dîtîna wê de wê werina ser ziman, wê bikina mijara nîqaşan jî. Li vir, ev rewş, wê her her wusa wê hevyekîya nava rewşê û dîtinê ji rewşê û heta mejiyê me ku wê bi nerîna me re wê bê dîtin, wê aliyê hîmî ê ku em divê ku wê hinekî din jî li ser wê bisekin in bin. Di rewşên weke newrolojîkî ên weke danîşandina sînîran û hwd, wê weke rewşna ku wê di wê rewşa dîtbarîya newekhevîyê de ku wê bê hanîn li ser ziman jî bê. Rewşa hêrsbûnê û danîşandina sînîrên xwe, wê çawa mirov karibê bi rewşekê de wê di *hevyekîyekê* de wê werênê ser ziman? Ev rewş, wê weke rewşek *nehevyekî* wê xwe bide danîşandin. Lê ev rewş, wê dide nîşandin ku wê di nava bûjarên zêhnî û bûjarên mejîyî de wê hevyekîyekê wê di nerînê de wê bi xwe re wê weke ku wê bide nîşandin. Ev rewşa hevyekîyê, wê weke têkilî û ankû girêdana sedemî jî wê dem bi dem wê were şîrovekirin û xwendin.

Di vê hûsûsê de mirov divê ku hinekî din wê têgîna sedemê bi rewşê re wê fahm bike. Her wusa, li vir, em dema ku wê rewşa têgînî a derkkirina dûalîsmê bi çerçoveya wê re wê dihildina li dest, em wê di hundûr demekê de wê dihildina li dest. Wê têgîna *demê* wê xwe weke têgînek heyî wê bide dîyarkirin. Em li vir, li ser vê minaqê re bimeşîn. Ku em A û B´yê hildina li dest û ku ew di heman demê de bi hevyekîyekê bûna li wan bihizirin, û ku A ku hinekî û ankû bi tememî ku ew ji B´yê cudabûna wê hebe, û ku A berî B´yê ku ew bûbê bê, wê hingî ji aliyê têgîna vacê(mantiqê) ve wê ne di hevyekîyekê de bin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî bi wê re wê hildina li dest, ku dûalîsm weke têgînekê zêhnê ku ew dihênê ser ziman ku ew bi rewşa fîzîkî re ew bibê, wê

---------------

(*)Di rewşa demê û fahmkirina wê de wê, di nava tevgeran de wê dema cûda wê li wê bihizirê. Wê Zerdeşt jî bi wê bawerbikê. Li gorî wî, mirov di demekê de dest bi tevgerekê dikê û di demek din dawî li wê tînê.

hingî ew rewşa wê di çerçoveyek hevyekîya fîzîk û zêhnê de wê xwe bide hanîn li ser ziman. Li vir, dema ku hevyekîyek, di nava bûyîna fîzîkê û zêhnê de ku ew hebe, ew navê redkirina dûalîsmê. Vajî wê, ew dibê di çerçoveya wê pêvajoya wê ya di demê de a bûyînê de ku ew dihê ser ziman bê. Lê li vir, hertimî wê ev pirs were pirsîn ku wê rewş û bûyarên zêhnî bi rewş û bûyarên fîzîkî re di hevyekîyekê de dibin û ankû nabin. Ev jî, wê bi serê xwe wê weke mijareka ku wê weke ku wê li ser wê re wê were hizirîn. Li vir, ez divê ku vê yekê bibêjim ku bûyîna rewş û bûyarên zêhnî bi rewş û bûyarên fîzîkî re di hevyekîyekê de wê, li vir tenê sedema pêvajoyek din a fahmkirinê û bûyîna wê bê. Ew jî, rewşa bûyîna fîzîkê û rewşên wê yên heyînî û bi wê re rûdana zêhnî bê. Di destpêka dema dûalîsmê a kevn de wê her wusa pêvajoyek bi vî rengî wê dinava hevdû de wê were hildan li dest. Minaq, dema ku mirov avêstaya Zerdeşt dixwênê, ya ku mirov wê di cih de kifş bike, wê ew bê ku wê ew bênê ser ziman ku wê rewş û bûyarên zêhnî bi rewş û bûyarên fîzîkî re di hevyekîyekê de ne di ahengekê de bin. Li vir, ew wê li ser aqil û ankû zêhnê re wê bi şêwayekî wê bihizirê ku wê aqilê mirov wê xwediyê wê karîna afirandinê bê. Lê ew afirîna aqilî û ankû zêhnî ku wê çendî ku ew bixwe bi xwe wê biafirê jî, wê di jîyanê û ahenge jîyanê de wê ahengek wê di nava wê pêşketina zêhnî û jîyanî de wê hebe. Di vê çerçoveyê de wê Zerdeşt wê bi têgîn, rewş û bûyarên zêhnî bi rewş û bûyarên fîzîkî re di hevyekîyekê de re wê li ahengekê jî bi wê re di jîyanê de wê li wan bigerihê. Li gorî ku mirov ji vê rewşê û têgînê fahm dike, wê ew bê ku wê her rewşên zêhnî, wê ne rewşna fîzîkî bin. Yan jî, wê her rewşên zêhnî ên ku ew afirîna, wê ne ji rewşna fîzîkî bin.

Dualîsm, weke pergelek hizirkirinê, a ku mirov divê ku wê ji gelek aliyan ve wê hilde li dest bê. Her wusa wê aliyê pêşî, wê yekîtî û dûîtîya wê ya dûalîtîkî a ku em bi hevdû re di ahengekî de wê bikin ku wê werênina ser ziman bê. Heta roja me, rengê dûalîsmê ê ku ew hatî hizirkirin, di çerçoveya wê aliyê wê yê duyem ê dûalîtîkî de bê. Her wusa, li vir, dema ku mirov di vê çerçoveyê de bi aliyê wê yê duyemin dihizirê, mirov dihizirê, mirov bi hizirkirina xwe re digihijê wê encamê ku weke ku ´xwûdê´ hebe jî û nebê jî wê ew dûalîtîkî wê bi jîyanê re wê hebe. Aliyê ku wê pirr zêde wê bi heyîna têgîna dûalîtîkî re wê bê mijara nîqaşan jî wê ev alî bê. Lê em hinekî bi şûn ve herin û herina deme Zerdeşt û li wê rengê hizirkirina wî û pergale wî ya hizirkirinê li wê bihizirin. Zerdeşt, wê jîyanê dualî bibînê. Aliyekî wê destpêk û jîyan a. Aliyê din jî, *bûyîn* û piştre *mirin* a. Wê jîyan di nava van herdû aliyan de wê herê. Bûyîna şev û rojê, kifşkirina bi têgînê başî û nebaşîyê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê hinekî jî wê rengê wê yê pêşketinê wê bide dîyarkirin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê dûalîsm, weke ku em di dema Zerdeşt de û bi rengê hizrên wî re wê kifş dikin, wê ji yekîtîyek´*zerwanî*´ ber dûîtîya´angra-maînyu´ û ´spente-maînyu´ ve wê xwediyê rengekî pêşketinê bê.Di vê

çerçoveyê de ya ku mirov wê kifş dike ku wê, ji yekîtîyekê bi ber dûîtîyekê wê herê. `Zerwan(*)´, wê di wateye ´demê´ û ankû ´zaman´ de bê.

Li vir, divê ku mirov ji bîrnekê û vê jî werênê ser ziman ku wê dûalîsm, weke têgîneka ku wê xwe bi aqil re wê werênê ser ziman bê. Ji aliyê felsefîkî ve wê di dema zerdeşt de wê, temenekî wê hizirkî ê felsefîkî wê bê avêtin û bê hanîn li ser ziman. Her wusa, binetera bi navê ´avêsta´ mirov dikarê weke binetera wê têgîna dûalîsmê a teorîkî û felsefîkî a wê demê werênê ser ziman. Wê li ser wê re wê êdî wê bê hanîn li ser ziman. Di wê serdemê de wê di nava têgîna dûalîsmê de wê hewldana fahmkirina tevger û kirinan, bi têgînek zêhnî, wê bike ku wê ji vê aliyê ve wê dûalîsmê li ser tefsîrek zêhnî re wê êdî wê werênê ser ziman. Li vir, tefsîrên zêhnî, wê di vê demê de wê pêşbikevin. Di jîyanê de ew tefsîrên zêhnî, wê temenekî wan ê bi ezmûnî wê li ser tefsîrên fîzîkî re wê hebe. Lê li vir, çendî ku wê bi vê rengê temenek bi tefsîrên fîzîkî re wê hebe jî, mirov nikarê, bi tememî bi wê re salix bike û wê werênê ser ziman. Mirov nikarê bi tememî rewşa tefsîrên zêhnî bi yên fîzîkî re di heman rengê û rewşê de wê werênê ser ziman.

Di hundûrê mejiyê mirov de wê mirov xwediyê rewşên derkkirî bê. Mejî bi rêyên derkkirinê û hwd, wê tevgerên di nava mekanê û demê de wê bigirê û wan di xwe de wê qayd bike. Ew girtin, wê weke ezmûnekê jî bê. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê têgîna dûalîsmê, wê li ser tefsîrên xwe yên zêhnî re wê ew ezmûn, wê di pêşxistin û hanîna wê ya li ser ziman de wê, xwediyê wateyek giring bin.

Em li vir, vê yekê jî divê ku wê bibêjin ku wê tefsîrên zêhnî, wê ji aliyê derkkirinê ve wê her wusa bi şêwayekî aqilê piretîkî û ankû kirinî wê xwediyê wateyekê bê. Tevgerek û ankû kirinek, dema ku ew bû, mirov wê êdî li ser wê bûyîna wê re wê, kifş bike û wê werênê ser ziman. Ew tevger, berî ku ew bibê, ew nebû. Mirov nikaribê bahse wê bike. Tevger, çendî ku berî ku ew bibê û di wê kêlîka ku wê ew bibê jî ku ew hizrê wê bûbê jî di serê mirov de wê, ew hizre wê, wê hebe. Li vir, rewşek pirr zde tenik heya. Minaq, ev rewş tevger, dema ku mirov li wê dihizirê ku wê bike, wê ew hizre wê êdî wê di serê mirov de çê bûbê bê. Mirov, wê tevgerê, dike. Lê mirov nizanê ku mirov ku ew heta ku wê tevgerê nekê, wê çi rengê pêşketinê wê derkeve ber mirov. Di kirinê de mirov, çendî ku weke rewşek dîzaynkirî wê rewşa tevgerê mirov li wê dihizirê jî, lê mirov ne di wê têgihiştinê de ya ku ew tevger dema ku ew bû, wê çi bi xwe re wê bênê. Di dema ku ew tevger bû jî, wê ew tevger gelek hûrgilên ku mirov di wê dema hizirkir de ku ew hizir nekirîya wê ew jî wê biafirin bi wê bûyîna wê

----------

(*)Zerwan wê weke hebûna dem û gerdûnê jî wê were dîtin. Wê ew hertiştê di wê de wê bide kifşkirin. Wê weke baxê ahûra mazda jî û ahriman jî wê were tefsirkirin. Felsefeya zerwanismê wê weke felsefeyeke kosmogonikî wê li fezeyê wê xwediyê rengekê hizirkirinî bê. Wê hebûna fezeyê wê, di sekneka bi tevger de wê bibînê û wê werênê li ser ziman. Wê li ser dûalisma bi ahûra mazda û ahriman re wê, weke têgîneka monist jî wê, xwe bide dîyarkirin.

tevgerê re. Wê di wê demê de wê ew tevger, wê bê tevgerek ku ew bûyî bi gelek reng û hûrgilên bi wê re bûna. Ti tişt, mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku ew heta ku ew newê kirin, wê weke ku ew nebûbê bê. Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku weke ku em bi têgîna avêsta re kifş dikin, wê Zerdeşt bihizirê ku wê **mirov** di tevgerên xwe de wê serbest bê. Lê wê di jîyanê de wê du hêz wê hebin. Yek baş a û yek jî nebaş a. Wê her yekê ji aliyê xwe ve wê bike ku wê bandûrê li wan tevgerên me bike, di dema bûyîna wan de. Ev rengê têgîna wî, wê têgîneka metafîzîkî wê li ser wê gotina ´başî´ û ´nebaşîyê´ bi xwe re wê bênê ser ziman. Her wusa, ev rengê gotinê ê hanîna ser ziman ê weke têgîna başîyê û ne başîyê ku wê di dem kirina tevgerên mirov de ku wê bandûrê bikin, li vir, wê Zerdeşt, di mejiyê xwe de wê bihizirê ku wê tevger weke dû kirdeyên vêşarî ê bi dema bûyîna wan re wê hebe. Ew jî, divê ku mirov di hişê wan de bê. Li vir, ev rewş, wê zêdetîrî, dema ku mirov li ser wê dihizirê, wê mirov di nava *metafîzîka dûalîsmê*(*) **de** wê bi xwe re wê bibê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê têgîna metafîzîkê a dûalîsmê, wê li vir, wê hertimî wê weke xiyeletekê wê xwe bi tevgerên mirov ên ku mirov divê ku wan bi aqilê xwe yê kirinî(piretîk) re wan werênê ser ziman re wê bijî. Rewşa tevgerê, li vir, dema ku mirov li ser wê dihizirê, her wusa wê ev weke rewşek teybet bê. Em vê yekê bi rengê tefsîrkirina Zerdeşt û her wusa pêşveçûnên zêhnî ên bi aqil ku ew hatina hanîn li ser ziman re wê kifş dikin. Li vir, bi tefsîrên zêhnî re wê mirov, derkeve dervî rewş û heyînên fîzîkî û wê bi rewş û heyînên zêhnî re wê bijî. Salixkirina bi tefsîrên zêhnî, wê di vê çerçoveyê de wê xwe weke rewşek teybet wê bide dîyarkirin. Minaq, êş, hêvî, bêrî, vekêşan û hwd, wê rewşna ku mirov dikarê wan li vir bihizirê bê. Têkiliya tevgeran a bi êş re wê çawa were fahm kirin. Ankû, tevgerek bi êş, wê çawa were salixkirin. Bêgûman, li vir, tevger û êş, dû rewşên ku em dikarin wan bi zêhnî fahm bike na. Di rewşa tevgerê de wê heta ku ew tevger pêkneyê, wê weke ku ew nîn a bê. Her wusa, li vir têgîna gotinî a weke êşê, wê ew jî, weke rewşek zêhnî a bi wê re bê. Êş, wê bijî. Bi wê jîyankirinê re wê ew hebe.

Li vir, dema ku mirov li ser minaq êşê dihizirê, bi tevgerê re ew, weke ku wê di encama tevgerê de ew heya.Yanî bi gotinaka din weke ku ew bi tevgerê re bûya.Tevger bûya *sedema*(*) bûyîna wê. Lê ji aliyekî din ve jî ew hizir weke têgînekê di mejiyê mirov de ew çê dibê ku ew êş weke ku ew ji xwe heya, tenê

----------

(*)Metafizike dualismê wê xwediyê têgîneka ku mirov wê bi herdû aliyên weke bi başî û nebaşîyê re wê di serî de wê werênina li ser ziman bê. Wê li gorî wê têgînê wê mirov çi bikê wê bi awayekê karmayî wê hemberê wê bibînê. Ku ew bi qanci jî bê û neqanci jî bê. Lê wê bê bawerkirin ku wê hemû rewş wê di ahenge di nava aliyê baş dû nebas de wê bibin. Her çendî ku ew li dijî hevdû disekinin û xwe di labitênin û bi hev re şer dikin wê, pêşketin wê bi wê re wê, li gorî wê bibin. Wê bi bawerîya wê ahengê wê, li jîyanê ku ew li ser rastiya wê li ser pîyan digirê wê were hanîn li ser ziman.

(*)Wê sedem wê bi rewşên jîyanî re wê were li ser ziman. Sedem wê weke têgîneka şûbjektiv wê were dîtin û hanîn li ser ziman.

ew tevger bûya sedema xwe dîyarkirina wê. Ev rewş, dema ku mirov hinekî din li ser wê re dihizirê, bi êşê re wê tevger wê weke ku  wê di hevyekîyekê de wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, weke ku mirov li ser têgîna gotinî re jî wê kifş dike û ew jî xwe dide dîyarkirin, wê du têgînên hevyek ku ew yek tevger bê û ya din jî êş bê, wê xwe bide dîyarkirin. Lê dema ku mirov bahse wê dike, ew dihê li holê û dîyar dibê. Tevger, weke têgînekê, wê bi têgîna tevgerî bê. Êş jî wê bitêgîna êşî bê. Dema ku mirov got tevger, wê êş newê ser ziman, ku çendî ku ew êş di tevgerê de ew hebe jî. Wê weke kirdeyek vêşarî wê xwe bi wê re wê bijî.

Di rewşa fahmkirina hevyekîya têgîna êşê û tevgerê de wê êş, wê ew hebê. Lê êş û tevger, wê çendî wê karibin, di hevîyekîyekê de wê xwe bidina dîyarkirin? Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ev rewş, wê weke rewşek teybet a ku mirov wê hilde li dest bê. Tevger, piştî ku ew bû, bi zêhnî wê ew weke tevgerek zêhnî bê. Ber ku ew bûya ya.

Rewşa bûyîna tevgerê, wê weke bûyînaka ku ew bûyî bê. Piştî bûyîna wê re mirov dikarê ji gotina tevgerê re wê gotina *hebûnê*(*) wê bikarbênê. Lê em dema ku wê gotina hebûnê bikardihênin, em ne ji wê gotina tevgerê re wê bikardihênin. Em, ji wê rewşa bûyî re wê gotinê bikardihênin. Ew rewşa bûyî, wê pêşî bi tevgerî wê hebe. Piştre, wê salixkirinî wê hebe. Ew dema ku ew tevger bû û pê de wê, ew karibê hêstan û ankû hîsan bi mirov re bide çê kirin. Tişta ku ew bûya û heya, wê temenê afîrînerîyên hêstî û ankû hêstîyarî bê. Bi wê re mirov wê karibê wê hîs bike. Berî ku ew tevger bibê, wê ew nebê.

Li vir, hinekî li jor jî me hanî ser ziman ku weke ku em bi hanînîya Zerdeşt a li ser ziman re wê kifş dikin ku ew kirina tevgerê ´serbest´ dibînê. Bo vê yekê, ew tevger, ji bandûra başîye re jî û ji bandûra nebaşîyê re jî wê vekirî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê di vê xalê de wê were hizirîn ku wê hişek pêwîst bê, di wê dema bûyîna wê tevgerê de. Her wusa di kirina wê tevgerê de ku mirov di hişê wê de bê. Heta roja me jî di nava kurdan de wê bê gotin ku ´di hişê kirina xwe de be´ û ankû w bê gotin ku ´di farqe wê de be ku te çi kir.´ Bi vê rengê, mirov wê jî kifş dike ku wê gelek gotinên bi vî rengî wê werênina hanîn li ser ziman.Ev gotin, wê bi xwe re wê têgînekê wê bidina me. Her wusa, hewldana şîyarkirina mirov di derbarê tevgerên mirov de wê, xwe bi wê rewşê re wê bide nîşandin.

Tabî, ew rewşa şîyarbûna di derbarê tevgerê de wê ew bi xwe re wê aqilê bi kirinî wê weke zêhnekê wê bide me ku mirov, di dema berî kirina wê tevgera ku mirov wê ew wê bike de wê xwediyê hişekî wê tevgerê bê. Bi gotinaka din, mirov, wê xwediyê aqil û têgîna rewşa bûyîna wê ya berî ku ew bibê bê. Ev jî,

-----------

(*)Wê hebûn wê bi ya ku ew li jîyanê heya û dijî re wê xwediyê wateyê bê. Wê fizik wê li duyan were beşkirin. Fizika ku mirov dikarê dest lêbide û ya ku mirov niikarê destlêbide. Li dengekê mirov nikarê destlêbide. Mirov nikarê hewayê di nava kafamista destê xwe de bigrê. Lê mirov dikarê avê bigirê. Mirov dikarê rajê kevir û ankû tiştekê din weke wê. Wê bi wê rengê wê were li ser ziman.

wê weke aqilekî bê. Her tevger, wê xwediyê rastîyeka weke bizêhnî bê. Mirov dikarê tevgerê, bi piştî bûyîna wê re wê weke rewşek zêhnî wê hilde li dest û wê werênê ser ziman. Li vir, tevger di bûyîna wê de aqilê mirov ê weke xwestekê, êş, hêvî, bêrî û hwd, wê weke têgînna ku mirov di hîm de wan hilde li dest bê. Xwestek û hwd, wê mêyla kirinê wê bi xwe re wê bi tevgerê re wê bide afirandin. Bi gotinaka din, weke ku wê bi wê tevgerê re wê ew xwestek û mêyla wê, wê bi laş bibê wê lê were. Di aslê xwe de mirov, di vê rewşê de ku dihizirê, ya ku mirov wê kifş dike, wê ew bê ku weke ku xwestek û hwd, wê weke têgînek xwe di hîm de wê bide dîyarkirin. Di her kirinê de wê xwestek wê bi mêylê re wê hebe. Xwestek, weke têgînekê wê rengê xwe bi wê têgîna hişî a aqilî ku mirov wê dihizirê bi ´başî´ û ankû ´nebaşî´ û hwd re wê bide dîyarkirin. Li vir, wê mêyla mirov wê hertimî li ser gotina ´başîyê´ re bê. Gotina başîyê, wê weke gotineka têgîna dûalîsmê a bingihîn bê. Ev gotin ber ku wusa weke gotineka bingihînî ya, wê ew bi dûalîteye xwe re ku ew ya bi têgîna ya vajî xwe a ´nebaş´ re wê ew hebe. Têgîna başîyê, bi wê re mirov çendî ku ya ne başîyê tê digihihê, wê bi heman rengê, wê vajî wê jî wê xwe wusa bide dîyarkirin. Kurd, vê rewşê bi vê rengê dihênina ser ziman ku "mirov, heta ya ´nebaş´ nizanibê, mirov wê qiymetê ya ´baş´ nizanibê."

Têgîna başîyê, wê weke aqilekî darazî wê xwe bide dîyarkirin. Di nava aqilê mey zêhnî de wê her wusa têgîna başîyê wê weke têgîneka darazî a nerînî bê. Bi wê re wê ev têgîna darazî, wê weke têgîneka ku wê weke rengekî fahmkirinê ê li ser aqil me yê zêhnî ê ne fîzîkî re bê.

Têgîna aqilê me yê ne fîzîkî wê weke têgîneka ku wê ne xwedî hacm bê. Her wusa, wê ne bi fîzîkê re wê xwe bide nîşandin. Li vir, em dema ku bahse aqilê ne bi fîzîkê re bikin, divê ku em hinekî jî li ser tevger, kirin û rûdayîna rewşan re wê hilde li dest. Dengek, tevgerek û hwd, wê ne bi hacm û rewşa fîzîkî bê. Lê li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê piştî bûyîna rewşê, tevgerê û ankû derxistina dengê û hwd, wê ew weke heyîneka ku ew heyî wê hebe. Li ev ew heyîna ku ew heyî, wê piştî wê rewşa bûyîna wê re wê ew êdî wê hebe. Rewşa wê ya ku ew bi wê heya, wê rewşa heyîna ku ew bi wê heya bê. Li vir, rewşa heyîna ku ew heya, wê piştî wê bûyînê re wê hebe. Em vê tevgera ku hatî û bûyî û wê dengê ku ew bi darêjkî bi gotinî hatî derxistin, em piştî wê re nikarin wê înkar bikin. Her wusa, li vir, li gorî têgîna dûalîsmê jî mirov, ku wê werênê ser ziman, wê bê dîtin û hanîn li ser ziman ku ´ ew bûya û êdî ew heya.´ Di vê çerçoveyê de wê newê înkarkirin. Piştî wê bûyînê re wê li gorî têgîna pêwîstînîya dûalîstîkî wê ew di demê de wê hebe. Ew wê weke heyînekê wê piştî bûyîna wê re wê were herê kirin.

Me li jor, bahse dengan kir, her wusa, di nava civake kurd de wê çawa bê bawerkirin ku mirov ku dengek kir, ew deng wê mayinda bê û wê ew winda nebê, me li jor bahse wê kir. Her wusa, bi wê re wê li ser wê rewşa ´mayînda´ a deng re wê şîroveyên cuda wê werina kirin. Minaq, têgîna dadî a darazî a

dûalîtikî, wê bi wê were bawerkirin, ew deng, wê weke wê kirin û ankû gotina me ya ku me gotîya, wê ew li demê wê hebe û wê ew newê înkar kirin. Ew êdî heya. Di vê çerçoveyê de wê ew rewş, weke rewşek têgînî wê hebe. Heta ku wê were gotin ku ´wê, mirov piştî ku mir, wê gîyane wî herî ber yazdanê mazin. Li wir jî wê, mirov hasabê kirinên xwe bide. Di wê demê de mirov, ku tiştekî ne rast bibêjê, ew gotinên ku wî gotina, wê derkevina ber wî û wê bênina bîra wî ku wî ew kirîya û di kîjan demê de ew kirîya.´ Wê di vê çerçoveyê de wê têgîneka bi darazî, wê bahse wê were kirin. Yanî, tişta ku ew hat gotin bi bawerîya ku ew mayînda ya û winda nabê re wê ev hanînên li ser ziman, wê werina gotin û wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê têgîna demê û ankû zimên(zaman), wê weke têgîneka ku wê li vir, weke ardnîgarîya vê gotinê ku ew li ser wê dijî di hundûrê têgîna fezeyê de bê. Ev rewş, wê di vê çerçoveyê de wê rastîyek têgînî a zêhnî a giring wê bi xwe re wê werênê ser ziman. Rewşa ku mirov wê werênê ser ziman, wê bi demê re bê. Li vir, têgîna demê, wê ji destpêkê ve wê weke têgîneka ku ew´heyî´ wê bahse wê were kirin. Her wusa, li ser wê têgînê re wê têgîneka baxtî û ankû qadarî a dûalîsmê wê hebe. Li gorî têgîna dûalismê e kevn, wê bê bawerkirin ku wê baxtê mirov wê kifşkirî bê. Bo vê yekê, wê rêmildarên medî û berî wî ên mîtrayî di dema mîtannîyan de wê, li ser hewldana dîtin, xwandin û ankû kifşkirina bûyîna rewşên di pêşarojê de wê pirr zêde wê serî wê wastênin. Mîtrayîyan, pergale falvanîyê wan bi rêxistin kir. Her wusa, roj, heyv, şêr, tûpişk, tîrûkavan û hwd, ku ew wê bên bi wate kirin, û weke wan wê her tiştê di jîyanê de ku ew heya, wê werina bi wate kirin. Di vê çerçoveyê de em di dema wan de jî û di dema Medîyayîyan de jî wê kifş dikin ku wê giringîyê bidina dîtina xewnê. Xewn, ku mirov çi cismê û bi çi rengê wê dît û hwd, ku tiştekî zindî bê û ankû ne zindî bê, wê li gorî xosletê wê, wê wate ji wê were derxistin. Wê ew hewl bê dayîn ku ew were fahm kirin. Rewşa fahmkirina wê, her wusa wê, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Rêmildarên medî, di vê çerçoveyê de wê biqasî ku ew bawermendek bin, wê bi heman rengî wê mirovna ku ew pêşaroja mirov ji baxtê mirov dixwênin jî bin. Her wusa tevlîhevdû kirina têgîna bawerîyê û ya biaqilî xwendina pêşarojê û li ser wê re danîna darazê û hanîna li ser ziman a aqil bi darazî, wê êdî wê bibê. Gotinên weke ´wê di rojên pêş de wê ev bê serê tê` û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke gotinna ku wê di derbarê pêşarojê de wê gotinên darazî bin.

Di dema medîyayîyan de wê medî, wê rêmildarên wan ku ew weke oldarna na jî wê, weke yên ku ew dikarin di derbarê pêşarojê de ku ew bibina xwedî zanebûn jî. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê, vê jî li ser têgîna ´gîyane baş´ û ´gîyane nebaş´ re wê bikin. Hizra bi rengê ´hewldana xwe gihandina zanîna pêşarojê bo xwe xilaskirina ji xirabiyên gîyane xirab a ahrîman´, wê di vê çerçoveyê de wê were hanîn li ser ziman. Weke vebijartekekê(*) wê hewldana xwe gihandina têgîna başîyê bê. Yan jî, wê weke hewldanaka ku ew bi wê dikin

ku ew xwe ji xirabiyên ku wê derkevina pêşîya wan, ew pêşî wan bibînin û pêşîya wan bigrin. Li vir, ji du aliyan ve wê ew xwe bi zanebûn bikin. Aliyê pêşî ew a ku wê xwe bi têgîhiştina zanebûnê re wê bizanebûn bikin û wê di wê warê de wê bihiş û zanebûn bin. Hişê başîyê, wê ji wan re bibê temen û hîm ku ew karibin ya baş û nebaş ji hevdû cuda bikin. Bi wê re wê li ser başîyê re wê ew wê bikin. Her wusa aliyê din ê duyemin wê bi hewldana xwe gihandina nîşanakna di derbarê pêşarojê û qawimînên ku wê li pêşîya wan bibin. Ew qawimîn ku ew çawa bin û çawa biqawimin jî wê, ew di derbarê wan de wê bikin ku wê zanebûna wê bidest bixin. Ev jî, wê bi têgîneka ´pêşdîtinê(*)´ re wê, xwe bi gihandina hizra pêşarojê re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, em divê ku van herdû aliyan jî, bi hevdû re wê ji aliyekî ve wê hildina li dest. Ew alî jî ew a ku wê bigihîna zanebûnê re bê. Rêmildarên medî(*), wê bawer bikin ku wê, di nava jîyane mirov de rewş û bûyarên ku wê derkevina li pêşîya û wê biawimin ku mirov wan baş fahm bike, mirov wê bi wan re nîşanakên di derbarê bûyar û qawîmînên ku wê di pêşarojê de wê biqawimîn jî wê, mirov agahdar bikin. Bo vê yekê, divê ku mirov jîyanê bi bûyîn, hebûn û xate pêşketina wê ya ku ew bi ber pêşarojê ve ew diçê mirov, divê ku wê baş bişopênê û fahm bike. Ji aliyekî din ve jî ew têgîna başîyê, wê weke ku kurd heta roja me jî ew di nava xwe de wê bênina ser ziman û wê bibêjin ku ´wê ya baş, wê ya nebaş jî ku ew çi ya wê mirov bike farqe wê de. Ev jî, wê çawa wê were fahmkirin? Ev jî, wê bi bi baş fahmkirin û ketina têgihiştina wê ya başîyê re bê. Başî, ku mirov zanibê ew çi ya, mirov wê zanibê ku ya nebaş jî çi ya. Yanî, bi gotinaka din, wê ya baş, wê têgîn û têgihiştina ya *´nebaş´* jî wê di xwe de wê bi fahma di derbarê xwe de re wê bê li holê û di mejîyê me de wê, bi me bide têgihiştin. Dema ku ez zanibim ku ez qanciyekê bi mirovekî bikim, ew baş, wê çaxê, ez dizanim ku ez dema ku xirabiyekê bi mirovekî bikin ew jî xirabî ya. Ev têgîna dûalîteya di nava başî û ne başîyê de wê xwe di hevdû re wê bide dîyarkirin. Her wusa, ev rewş, wê weke bixwezayî wê weke rêgezek destûrî a fahmkirinê jî bê.

Li vir, ya ku ez di farqe wê de me ku ew baş a, wê bi hişkirina min ya li ser fahmkirina min a li ser gotinan re bê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê, hişkirina min, wê her wusa, li vir, têgîna başîyê, wê weke têgîna fîzîkî a kirdeyî wê xwe bide dîyarkirin. Şenberîya di hiş de wê li ser hebûna tiştê re bê. Li vir, em dema ku di çerçoveya dûalîsmê de li ser wê dihizirin, ya ku em dikin, ew a

--------------

(*)Vebijartin wê weke aliyekê ku mirov wê li wê bihizirê bê. Mirov çiqasî dikarê bivebijêrê? Mafê mirov wê çiqasî di jîyanê de wê hebê. Ankû heta kûderê mirov dikarê vebijêrê? Wê bi vê rengê wê têgîna pêwîstînî û ankû ya ´determismê´ wê xwe bi wê re wê bide hanîn li ser ziman. Zerdeşt biqasî ku mirov ji felsefeya wî û avesteya wêî fahmdikê ew bi du rengan wê dihênê li ser ziman. Di çerçoveya fizikê de wê, heta ku ew sînorê fizikê destûrê bide wê ew bijêartin wê bibê. Mirov nikarê serê xwe bi zivirênê li pişt xwe û bi rûyê xwe li pişt xwe binerê.

(*)Remildarên medî, weke mecu jî dihên zanîn ew wê weke kifşkarên dema xwe bin.

(*)Pêşdîtin wê, bi wateya pêşarojê xwandinê û fahmkirinê bê. Wê mirov wê hertimî wê serê xwe li ser pêşarojê wê biqastênê ku mirov dikarê wê fahmbikê û ankû na. Remildarên medî di wê qannatê de bûn ku mirov dikarê pêşarojê bibînê û ankû fahmbikê.

ku mirov bi hizrê xwe ya şenber ku mirov ji wê têgîna ku mirov ji heyîna fîzîkî a tiştê girtî, wê zannîna me wê bi aliyekî xwe yê bi ser heyîna hebûnê re wê bide dîyarkirin bê. Lê ji aliyekî din ve jî wê ew hişê me, wê li şûna ku ew di encama fêrbûn û ezmûn, fîzîk, tişt, heyîn û hebûnekê de ew bûya, wê hişê me, wê fêrbûn, ezmûn, tişt, heyîn û hebûnekê wê karibê wê biafirênê. Li vir, ya ku em divê ku ji vê aliyê ve wê herê bikin, wê ew bê ku wê rewşek zêhnî wê xwe bêî fîzîkê bi aqil, wê karibê werênê ser ziman. Weke ku çawa ku wê rewş û bûyarên fîzîkî wê bandûra wan wê bibê, wê bi heman rengî wê rewş û bûyarên zêhnî jî wê bandûra wan wê hebe. Li vir, divê ku mirov bahse têgîneka hevrast a li ser rewşa zêhnê û fîzîkê re bike ku wê bi xwe re wê bide nîşandin ku wê rewşên bûjenî û yên zêhnî, wê weke ku ew bi demê re wê bi aqilê me re wê di herikînê de bin. Ev rewş, wê bide dîyarkirin ku wê aqilê me, wê karibî dervî rewşa fîzîkî ew bijî. Li vir, em dema ku vê rewşê bi vê rengê bi wê têgîna hevrastiyê re wê dihênina ser ziman, wê ev jî xwe di mejiyê me de weke lêpirsînekê wê bide dîyarkirin ku rewş û bûyarên zêhnî bandûrên wan ên fîzîkî û ankû vajî wê rewş û bûyarên fîzîkî bandûra wan ya zêhnî, wê ev wê xwe bide nîşandin. An jî, em vê çawa fahm bikin? Bêgûman, em divê vê yekê herê bikin ku em hertiştî bi aqilê xwe dibînin û wê dikarin bi hiş bikin. Her wusa, ew hişkirina me, piştî ku rewş û ankû heyîna fîzîkî a ku ew ji wê afirîya ku ew ji holê winda bibê jî wê ew hişkirin wê êdî ew bi rengê xwe yê ku ew heya wê weke zêhnekê wê hebe. Di dûalîsme kevn de wê weke ku mirov wê ji têgînên avêsta bê û ankû rewş û rengê aqilê ji wê ku ew bi bineterên ji wê demê mana bê, mirov wê bibînnê ku wê di wan de wê were dîtin ku wê ev bandûra ji zêhnê li fîzîkê û yan jî bandûra ji fîzîkê ya li zêhnê wê bi şêwayekî wê were red kirin. Wê bê hanîn li ser ziman ku her tişt ji xwûdê destpê dike. Di ahengekê de wê, wê di dewama xwe de wê hebûna xwe de bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê were ser ziman ku ew ahenge di nava wê de jî wê ji berê ve wê hatibê çêkirin û kifşkirin. Wê li gorî wê ahenga wê ya ku ew berî wê bûyîna wê ku wê bûya, wê rewşa wê pêşbikeve. Di vê çerçoveyê de bandûra li hevdû, wê bi şêwayekî bi têgînek pêwîstînî a bi dayîna kifşkirinê ji aliyê ´xwûdê(*)´ ve wê bê hanîn li ser ziman. Wê bê bawer kirin ku xwûdê destpêka rewş û bûyarên di zêhnên me de bi sedemên wan re ew daya destpêkirin û hem jî rewş û bûyarên di laşê me û ankû ên fîzîkî bi heman rengî destpêka wan ew bi wan re daya destpêkirin. Di vê çerçoveyê de wê di nava rewşa zêhnê, fîzîkê û hwd de wê sazûmana wê hebe. Mirov, dema ku bi dîtina xwe li wê herîkîna zêhnî û ya fîzîkî a bi hevdû re di ahengekê de ku ew dibin ku mirov dinerê, wê mirov wê weke ku ew bi sedemê bi hevdû re girêdayî ya wê hiş bi me re wê bide çêkirin. Piştre wê, di serdemên piştre, weke ku emê bi rewşa fahmkirina dûalîsme dema nû a me de jî emê kifş dikin, wê hebûna

---------------

(*)Gotina ´xwûdê´ wê ji dema qasîtîyan bê. Wê di kurdî de bi wateya ´yê ji xwe da´ û ankû ´xwe da´ de bê. Wekî din jî wê wateyeka wê ya din a sereka jî wê wateya ´yê xwedî´ û ankû ´yê xwedî hemû tiştî´ bê.

xwûdê di wê kifşkirinê de wê hin aliyna ve wê were red kirin. Wê rewşa zincîra bi hevdû ve girêdayî a sedemî wê bê hanîn li ser ziman. Her wusa, rewşa zincîra domîna zêhnê ya fîzîkê de bi hevdû re wê li rex hevdû wê hevdûna xwe bide domandin. Lê wê bandûra wan li ser hevdû wê hebe. Lê di serdema nû a dûalîsmê de wê hinek hizir jî wê bi wê re wê werina hanîn li ser ziman ku wê bandûra wan li hevdû nebê. Di vê çerçoveyê de ev rewşa dema dûalîsme nû ku mirov wê bike fahm bike, divê ku mirov serî li ya dema dûalîsme kevn bixe. Di serdema dûalîsme kevn de wê bê bawer kirin ku ´wê xwûdê, destpêkê bide çêkirin, lê wê mudahaleyê li wê nebê.” Her wusa Zerdeşt, wê bênê ser ziman ku Aliyê gîyanî ê nebaş, wê rewşa ku ew mudahale lê nebê, wê bike ku ew mudahaleyê li wê bike. Di vê çerçoveyê de wê bixwezê ku ew bi wê mudahaleyê wê ahenga di navê de wê xira bike. Li vir, ew herîkîna bi zêhnê û fîzîkê re ku wê ew weke rewşek hevrast a ahengî wê xwe bide nîşandin, wê li vir, wê ew rewşa mudahaleya li wê, wê were ser ziman. Rewşa mudahaleyê, wê li vir, wê weke ´rewşek mudahaleyî a ku ew wê ji aliyê xirab ê ahrîman ve wê bikê´ bê. Lê aliyê baş ku wê Zerdeşt bi Ahûra Mazda re wê werênê ser ziman, wê bê hanîn li ser ziman ku wî mafê baxt kifşkirinê bidest xistîya û her tişt daya kifşkirin û wê ew rewş, bêî ku ti tevlîbûn li wê bibin, wê ew di ahenge xwe de wê herîkînê wê bi xwe re wê bide çêkirin û wê hebûna xwe bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê her tişt di nava ´sazûmanakê´ de wê hebûna xwe wê bide domandin.

Rewş û hewldana fahmkirina zêhnê, wê weke rewşek giring û teybet wê derkeve ber me. Pirsgirêka fahmkirina zêhnê, wê weke beşek zanyarî(*) a ku wê di nava xwe wê gelek rêkarîyên saûzmanî wê bihawênê bê. Her wusa, ev weke mijaraka ku wê çendî ku wê di nava xwe de wê weke mijarana ku wê ji gelek aliyan ve ji mirov bixwezê ku mirov nêzîkatîyê li wê bike û bi wê re fahm kirina xwe re pêşbixe û bi heman rengê ji dervîyayîya wê ve jî wê bi heman rengî wê nêzîkatîyê wê ji me bixwezê. Pirsgirêka fahmkirina zêhnê wê hertimî wê xwe di warê hewldana fahmkirina têkiliya zêhnê û laşê a bihevdû re de wê xwe bide nîşandin. Zêhn çî ya? laş çî ya? Têkiliyek çawa di nava zêhn û laş de heya? An jî, têkilî di nava zêhn û laş de, ma heya? Ku têkilî hebe wê têkiliyek çawa bê? Ya zêhnî çî ya û ya fîzîkî çî ya? Wê bi vê wê pirsên ku ew hatina avêtin li holê, wê hewl bê dayîn ku bersivek rast ji wan re were dayîn. Ya rastî li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman zêhn, weke teorîyeka ku wê di warê bersivdayînê de wê gotin û bêjeyên xwe bi çerçoveyek berfireh wê bike ku wan biafirênê û bênê ser ziman. Li ser wê re jî ew wê bike ku wê bersivê bide. Li vir, hewldana fahmkirinê wê zêhn, di vê çerçoveyê de wê bi afirandina çerçoveya xwe û di nava wê çerçoveyê de hewldana dayîna bersivê re wê bike ku wê bike. Di warê zêhnê de wê teorîyên felsefeyê ên weke yên mantiqê, mengîwerî,

---------

(*)Zanyarî wê di wateya zanina bi diyardeya xwe re ew heya û tê zanin bê. Gotina zaninê temenê wê ya û ji dema hûrîyan a.

pêzawerî, karîgerîyîtî û ankû ´fonksiyonalîsm(*)´, teorîyên dirûyîtîyê´ û hwd, wê bi têgîna dûalîsmê re wê di çerçoveya têgînên felsefîkî ên zêhnî de wê weke têgînên felsefîkî wê hebin bin. Li vir, rewşa tevgerîyê û hevyekîyê, wê weke ku em di serdemên dûalîsme kevn de wê kifş dikin, wê pêşbikevin. Her wusa, ev felsefe, wê bi vê rengê weke dûalîsmê, wê hertimî bi şêwayekî weke felsefeya zêhnê, wê hebûna xwe wê bide dîyarkirin û bide hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de em di aslê xwe de dema ku li wan pêşveçûnên felsefîkî û hwd ên li herêmên dûr û nêzî ên Asya ku ew pêşketina ku mirov li wan dinerê, mirov bi wan pêşketin û pêşveçûnan re vê rastîyê piştrast dike. Piştî Zerdeşt re wê Bûda(*) û hwd, wê derkevin. Felsefeyên ku ew pêş dixin, wê bi şêwayekî weke şêwazgerîyên (metodolojîyên) (*) felsefîkî ên zêhnî wê pêşbikevin. Piştre wê bi demê re wê li gorî pêşketin û pêdîvî û pêwîstîyên jîyanî û aqilî wê beşên felsefîkî û hwd wê bên afirandin. Ev jî, wê bi hanîna li ser ziman re wê bibê. Hemû jî, wê di çerçoveyekê de wê bi armanca xwe gihandina şêwayekî felsefîkî ê ku wê mirov bi wê karibê fahm bike û xwe bigihênê ´rastîyê´ bê. Piştî Bûda re pêşxistina felsefeyên weke yên ´karma´ û hwd, wê vê yekê wê bide dîyarkirin.

Rewşa dûalîsmê û hewldana fahmkirina wê, wê bi rewşa xwe re wê hertimî temenê şîrove û pêşveçûnên zêhnî bê. Li vir, di hewldana fahmkirina dûalîsmê de wê wê hem ji destpêka fahmkirina xwe û hem jî li navarok û dawîya fahmkirina ve wê pirr zêde wê xwediyê rengekî fahmkirinê ê ku ew pirr dîmenî û di nava hevdû de dibûhûrê. Li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku çendî ku dûalîsm, wê weke felsefeyek bi dûîyîtî bê, lê bi wê re wê bi têgînek ´yekîtî´ weke ya olên ´monîst(*)´ wê nêzîkatî li wê were kirin. Ankû, wê di nava wan de wê weke têgînekê wê were hildan li dest. Ev rewş, di aslê xwe de wê ji aliyekî ve rastîya nêzîkatîya vê felsefeya bi nav dûalîsmê wê bixwe re wê bide dîyarkirin. Li vir, dema ku mirov hewld bide ku dûalîsmê û felsefeya wê fahm bike, divê ku mirov bi du şêwayan nêzîkatîyê li wê bike û

-----------------

(*)Funksyonalism wê karigeriyiti jî bê. Wê dema mirov wê di wê çerçoveyê de wê, werênê li ser ziman wê weke tişta ku ew bi fizikê heya û kêrî çi tê bê. Di mantiqê wê yê felsefikî de wê ew jî wê were ser ziman ku wê, her tişt ku ew afirî û ankû hat afirandin wê, kêrî çi were wê ew bi têgînî wê bi wê re wê ji xwe wê biafirê. Li gorî wê, tişt bi rewşê dihê afirandin û ankû rewş bi tiştê re dihê afirandin wê weke aliyekê wê yê giring ku wê li ser wê were hizirkirin bê.

(*)Bûda wê, weke zane, filozof û oldarekê Asya dur wê li dawîya sedsale 6´min de wê bibê. Wê gelek têgihên felsefeya serdest wê bi bandûrî mirov dikarê ji wî, nêzîkatî û felsefeya wî bixwênê. Rêbazên weke reankarnasyonê ên gîyan ku ew ji laş goç bikê wê bi wê bawerbikê. Wê rewşên weke meditasyonê wê weke rêyên xwe gihandina zaninê û rastiyê wê kifşbikê.

(*)Di felsefeyê de wê weke aliyê pêşî wê rêbaz û ankû ´metodologî´ bê. Rêbaz wê, hertimî wê di rewşa nivîsandin û hanîna li ser ziman wê heta roja me jî wê weke aliyekê giring wê were dîtin û wê li ser wê were sekinandin. Di rewşên vegotina dîrokê û hwd de jî wê, ew wê bi heman rengê wê derrkeve li pêş. Wê li ser wê bihizirê. Wê bi wê re wê, mirov dikarê weke aliyekê din ê giring wê werênê li ser ziman ku wê rewşa metodologiyê wê derkeve li pêş.

(*)Monism wê yekîtî bê. Wê li gorî wê minaq wê olên kiu ew bawerîya wan bi xwûdayekê dihênin wê weke olên monist bin.

hewl bide ku wê bi wan re wê fahm bike. Aliyê pêşî, weke ku em bi têgîna dûalîteyê re li ser dûlîtîya baş û nebaş, sipî û reş, şev û roj û hwd re dihênina ser ziman, wê weke rengekî ku mirov wê di çerçoveya nêzîkatîyek ku mirov wê li jîyanê û xwezayê dinerê û wê dike ku fahm bike bê. Yanî, bi gotinekê, wê ev weke rewşek ezmûnê û zêhnî bê. Lê aliyekî din jî ew a ku mirov divê ku wê bi têgînek hîyererşîkî wê hilde li dest bê. Ev jî, ew a ku mirov dema ku wê di rewşa bi demê re û ankû wê di hundûrê demê de ku mirov wê werênê ser ziman, divê ku mirov wê bi wê hîyarerşîya wê re wê, hilde li dest û werênê ser ziman. Weke ku Zerdeşt jî, wê dike, wê di destpêkê de bi zerwan re wê di têgîna yekîtîyekê de wê destpê bike. Piştre wê, weke zaroyên wî, ahrîman û ahûra mazda, wê bi wan re wê bi dûîtîyekê re wê werênê ser ziman. Ev jî, wê bi wê re wê ji zerwan û bi bi ber ahrîman-ahûramazda ve wê hîyererşîyeka fahmkirinê a di hundûrê zêhnê de ku wê ew were afirandin û wê bi wê re were hanîn li ser ziman re wê ew bê hanîn li ser ziman. Li vir, em di dema dûalîsmê a Zerdeşt e wê kifş dikin ku wê Zerdeşt, ahengek pirr baş wê di nava wê dûalîteyê bi ahrîman-ahûramazda û yekîtîya zerwanî re wê bide çêkirin. Di aslê xwe de mirov, dema ku wê ahengê çê bike û bi wê re fahm bike, wê hingî fahmkirina rast a dûalîsmê wê xwe bide nîşandin bi me re ku em wê werênina ser ziman. Wekî din, wê her hanîna me ya li ser ziman, wê weke qatna aqilî û ankû zêhnî ên ku em wan dihênina ser ziman bin.

Em li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê zêhn û fîzîk, wê çawa bi têkiliyekê wê xwe di çerçoveyekê de wê bide dîyarkirin. Em li vir, zêhnê, divê ku weke rewşek aqilî a li ser rewşên bûyî re wê bikin ku wê werênina ser ziman. Emê li vir, di dema ku wê rewşa zêhnê werênina ser ziman ku emê wê nekin ku rewşa fîzîkî a ku ew li jîyanê bi heyînî, hacm û hwd heya red bikin. Emê wê herê bikin û li ser wê re wê bikin ku wê werênina ser ziman. Ji xwe ya ku wê dûalîsm jî wê di rastîya xwe de wê bike jî wê, ev bê. Di vê çerçoveyê de wê di wê çerçoveya wê têgîna xwe ya dûîyîtîyî de wê bike ku wê bike. Bo vê yekê, li vir, ew rewşa zêhnê, em li vir, di serî de wê ku em bi aqil bê, wê weke rewşek aqilî a pêkatî, wê werênina ser ziman.Dema ku em rewşên fîzîkî û hwd, hemûyan weke rewşna zêhnî wan werênina ser ziman, wê li vir, weke ku em bi rengê hanîna li ser ziman a îdealîsmê re ku wê hertiştî bike ku ew biaqil bike û rewşa fîzîkê jî weke ´aqilekî´ wê werênê ser ziman re wê li ser wê re wê ji aliyekî ve heyîna zêhnê bixwe jî wê weke ku wê were red kirin. Ev rengê hanîna li ser ziman jî, weke ku çawa ku wê ji aliyekî ve wê bê wateya redkirina zêhnê, wê bi wê re wê weke ku wê bê redkirina dûalîsmê bixwe jî. Her wusa, li vir, rewşa dûalîsmê, weke ku ew xwe li ser zêhnê re wê dike ku werênê ser ziman.

Di rewşa fahmkirina dûalîsmê de wê li vir, wê rewşek teybet wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, weke ku mirov wê karibê bi rewşa dûalîsmê re wê kifş dike, wê zêhn û fîzîk, wê bi hevdû re di ahengekê de wê di hundûrê

zamanê(zamên) de wê hebûna xwe wê bi wê bi hevdû re wê bidina domandin. Wê hevrastîya zêhn û fîzîkê a di jîyanê de wê bi rewşa fîzîk û afirîna wê û ji aliyê din ve ya zêhnê re jî wê xwe bide nîşandin. Ev rewş, weke ku em di dema dûalîsma kevn de dibînin ku wê bê gotin û hanîn li ser ziman ku´wê başî û nebaşî wê bi hevdû re hertimî dinava tekoşînê de bê. Wê afirandin jî wê, bi wê re wê bibê.´ Li gorî, têgîna dûalîsma kevn, başî û nebaşî, hertimî wê hebin û wê bi hevdû re li dijî hevdû wê xwe seknekê bin û wê tekoşîna wan bi hevdû re wê hebe. Li gorî vê têgînê jî wê bê gotin ku ´wê hertimî, ya nebaşî, wê di nava hewldana xirakirina ahenga ya a bisazûmanî de bê. Wê rewşa nebaş, wê hertimî wê xwe di wê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin. Di gerdûnê de wê, vejene herênî û ya nehêrênî wê hebe. Li vir, mirov, di vê çerçoveyê de hertimî bike ku xwe ji ya nebaş rizgar bike. Di vê çerçoveyê de wê ya nebaş, wê weke ancamên wê, wê bikirinên nebaş, diltangî, xirabî, êş û elemê re wê xwe bide nîşandin. Ya baş jî, wê bi dilfirehî, bihêvîbûnê, xwe baş hîskirinê û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Ya baş, wê hertimî wê mirov rehet bike. Ya ne baş jî, wê mirov ne rehet û tang bike. Mirov, wê xwe di rehetîyê de hîs nekê bi ya nebaş re. Bo vê yekê, mirov divê ku hertimî, di vê çerçoveyê de xwe ji tiştên ku wê ne rehetîyê, êş û elemê bidina mirov dûr bide girtin. Ev rewş, wê her wusa wê weke rewşek zêhnî jî bê. Li vir, rewşa baş û nebaşîyê a fahmkirina wê ya li ser zêhnê re jî wê, bi vê rengê bê ku mirov xwe ji zêhnên nebaş paqij bike. Ev rewş, weke lewîtînên zêhnî jî dihê bi navkirin û ser ziman di serdemên berê ên kevn de.

Li vir, minaq hêskirin, dilxweşî, hêvîkirin û hwd, wê weke têgînna ku mirov ne dikarê wan bi bidest bigirê û ne dikarê wan di hundûrê demê de wan birewşî werênê ser ziman. Di hundûrê gotinên me de wê hêstên weke hêskirin, dilxweşî, hêvîkirin û hwd, wê bi mêylên xwe re wê li ser xwestekê re wê bidina dîyarkirin. Bi wê re wê di hîmê xwestekê de jî wê rewşek ajoyî jî wê hebe. Ev rewş hemû wê xwe bi hevdû re di ahengekê de wê bidina dîyarkirin. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku mejiyê me yê ku ew bûjenekê ew heya û ji gelek şaneyên ku ew bi hevdû re bikomî na ku ji wan afirîya, wê xwediyê rewş, tevger û gelek kirinên navxweyî ên tevlîhev bê. Wê ew jî wê bihevdû re û bi têkiliyên bi hevdû re wê kêfxweşî, hêvîkirin, tirsê, bêrîyê û hwd wê, bi xwe re wê bina sedema afirîna zêhnê me jî. Bêgûman, di vê rewşê de wê fahmkirina van rewşan û afirîna wan ya bi wan têkiliyên navxweyî ên mejî re wê pirr zor bê. Lê em divê ku vê yekê, werênina ser ziman ku wê zêhn, bi me re wê weke rengekî bi wê çerçoveya mêjî û afirîna wê re jî bê.

Li vir, pirsgirêka fahmkirina zêhnê a bi mejî re wê weke pirsgirêke kûr xwe bide dîyarkirin. Her wusa, têgîna dûalîsmê a kevn, wê bawer bike ku wê hevrastîya zêhnî û ya fîzîkî ku ew heya di herîkîna demê û jîyanê de wê dervî me wê hebe. Li vir mejî, wê weke rewşek ku ew dike fahm bike, wê li dervî wan wê bimênê. Li vir, em dema ku vê rewşê li wê dihizirin, em li wê jî divê ku wê werênina ser ziman ku mirov, di fahmkirina rewşên zêhnî û rewşên fîzîkî

weke ku ew di hevyekîyekê de na jî, wê mirov di wê de bikeve gûmanê û zorê de. Ber ku ew rewşên meji û heyîna pirr-şaneyên mejîyî ên bi hevdû re wê, bi têkiliyên xwe re wê çawa rewşek bi vî rengî wê karibin bi afirênin, ew jî weke mijareka ku ew fahmkirina wê zore dibê ya. Zêhn û gîyanê, mirov, di serdemên kevn ên dûalîsmê de dibînin ku wê ew bi hevdû re di hevyekîyekê de wê newina dîtin. Gîyan, wê dervî wê weke têgînekê wê ku ew hebe wê bê herê kirin. Her wusa, li ser wê re wê nîqaşên li ser aqil re wê bên dayîn kirin ku wê piştî mirinê wê çi aqil wê were. Wê aqil wê bi laşê ku ew mir û çû axê re wê ew jî bimirê û yan jî wê ew bi gîyanê re wê hebûna xwe bi jîyane re wê bide domandin. Ev rewş, wê bike ku mirov gîyanê jî û laş jî dervî aqil ji hevdû cuda wan weke ´zombî´yan hilde li dest. Gîyanek ku mirov dikarê wê dervî aqil li wê bihizirê, laşekî ku mirov dikarê bêî gîyanê li wê bihizirê, gîyanek ku ew bêî laş a ku mirov dikarê li wê bihizirê û hwd, wê li vir, weke fenomenên ku mirov li vir wan bike ku fahm bike na. Her fenomenek ji van ku ew bi xwe re wê çawa hebe û bijî? Ankû wê çawa were dîtin? Ev jî wê, weke mijarna ku wê di vê çerçoveyê de mereqa biafirênin bin.

Di gelek tefsîrên ku wê li ser jîyanê û domandina wê ya piştî mirinê bi gîyanê re wê gîyan, di şêwayekî ku ew biaqila de wê werê hanîn li ser ziman. Her wusa, hanîna li ser ziman, têgînên weke ´axîret û dunya´, ´dojeh û bihûşt´ û hwd, wê bi wê re wê weke dûalîteyeka dûalîsmê ku wê ku wê rengê pêşketinên olên semewî ên piştre ên weke cihûtî, mesîhî û îslamê jî wê, bide kifşkirin bê. Lê têgîna dûalîsmê, di aslê xwe de wê weke têgîneka yazdanîyê û xate wê ya pêşketinê a bi demê re **bê**.

Ev rewşa jîyankirina gîyanê piştî mirinê û her wusa dervî fîzîkê hizirkirina li zêhnê û hanîna li ser ziman a hebûna wê, wê bi xwe re wê weke rewşna ku wê bi aqilê mirov pir zêde wê mijul bikin bin. Bi birhankirina hebûna zêhnê dervî fîzîkê û ankû laş, wê li şûna wê bi bawerîyekê wê li wê werê nerîn. Di nava hemû bawerîyên yazdanî û piştre ên semewî de jî wê ev têgîna dûalîteyê wê mirin û jîyanê, axîret û dunyê, dojeh û bihûştê û hwd re wê xwe bide jîyan kirin.

Rewşa fahmkirina aqil li vir, wê xwe li ser wê dûalîteyê re wê bênê hanîn li ser ziman. Mirov di nava xwezayê de dijî. Dema ku mirov di nava xwezayê de dijî, mirov wê hîs dike. Kevirekî ku mirov wê dihilde li dest ew fîzîkî ya. Lê zêhnê mirovî weke xîyalî û ankû nîqaşî na. Mirov, sawalek minaq weke gamêşekê, malek(xanîyek) ew fîzîkî na. Lê derkkirina wan û bîrhanîna wan wê xîyalî û ankû hizrî bê. Xanî bixwe fîzîkî ya, lê dema ku mirov li hemberê wê disekinê û li wê dinerê, ew zêhnî ya. Minaq, dema ku mirov tefsîreka şerê a fîzîkî ya rejima tirk ê li ser serê civake kurd ku mirov wê bike, di wê tefsîra zelal de wê dengê gûleyan, lez û rêya wan ya ku ew têr çû û li laşê mirovan ket, laşên mirov ên qatbûyî û axa ku ew hertimî hatî bombabarkirin, wê di wê tefsîrê de wê hebe. Ew dengên ku wê werin û rohnîya ku mirov bi wê re kifş bike, wê sînirên mirov ên bihîstinê û çavên mirov wê bibandûr bike. Mejî, weke bûjenek

heyînî wê, rewşên bîolojîkî û kimyewî ku di wê de dibin, wê di hundurê nava rewşa dem û fezeyî de wê bibin. Feze, di her halûkarê di xwedîyê rewşa kişînaardê ya. Dema ku mirov, minaq gûleyek lê ket, ew kişînaardê wê wî bikişênê bi ber ardê ve û bike wê rewşa ´ketî ardî´ de. Rewşa tefsîra şerê rejima tirk a li ser serê civake kurd, wê van rewşan hemûyan di xwe de wê bihawênê. Lê bi wê re jî, wê rewşên weke hîskirin û jîyankirina êşê, dîtin û hîskirina tûndûtûjiyê û hwd wê bi wê re wê hebin. Ew rewş, wê bi hemû aliyên xwe yên ku ew dijî re wê weke navaroka wê, wê ew hebin. Her tişta ku ew hatîya jînkirin û her wusa hatîya hîskirin, wê ew di wê tefsîrkirinê û pêşnûmaya wê de wê hebin. Her tişta ku ew di jîyanê de jîyanbûya û ew hatîya tefsîrkirin, wê li aliyekî ew hebe û wê di mejî de ew bi zêhnî jîyankirina wê, wê ew hebe. Li vir, em vê yekê bibêjin, di tefsîrek bi vî rengî de wê farqe tefsîrkirina bifîzîkî û ya bizêhnî wê çi hebe? Bêgûman wê hebe. Minaq, di tefsîrkirina fîzîkî a bûjenî de wê deng, êşkişandin û hîskirin wê nebê. Lê di tefsîrkirina zêhnî de wê ew hebin. Pirtûkek ku ew hatîya nivîsandin, dibêt ku ew gelek zanyarîyan di xwe de bihawênê. Lê ew pirtûk ji rûpelan pêktê û ew tiştek hebûnî a fîzîkî ya a ne zindî ya. Ew êşa ku pirtûk bi tefsîrkirinê di xwe de dihênê ser ziman, wê bi gotinan di pirtûkê de wê hebin. Lê dema ku ew bi zindîyî mirov wê bijî, wê mirov wê bijî û hîs bikê. Di tefsîra zêhnî de wê farqe wê, ew bê ku wê hertişt wê bizîndî bê. Wê bi wê zindîbûnê re ew tefsîra zêhnî wê xwe bide dîyarkirin. Tefsîra fîzîkî, wê weke tefsîrek ku ew çendî ku wê êşê di xwe de bi gotin bike jî, wê ew hîskirina wê ya ji wê gotinê a piştî xwandinê, wê ne weke ya wê jîyankirinê bê. Li vir, rewşa zêhnî, wê hinekî jî rewşa zindîtîya mirov a jîyanî wê di temenê xwe de wê **bihawênê**.

Di nava çanda kurdistanî û ankû mesopotamîkî de wê bi giringî dayîna jîyankirina bi menewîyetê wê zêdetir wê hebe. Di nava zêhnê xwe de û ankû weke ku ew bi nav dikin wê di nava zanebûna xwe de wê li wê bigerihin. Gelek rewşên ku mirov wan dijî, wê bersiva wan li wir di wan de li wê bigerihê. Dibêt ku mirov dema ku dike ku rewşek xwezayî a ku ew heya, bi hewldana fahmkirinê re mirov wê fahm bike. Lê rewşa dîtina xewnekê û bi hebûna wê û ber çi ew xewn hatîya dîtin, li bersiva wê gerîn, wê weke çandaka aqilî bê. Li vir, ev rewş, wê bi serê xwe wê weke rewşek zêhnî bê. Mirov, dema ku wê xewnê dibînê, wê ji girtinên xêva mirov û her wusa jîyankirinên ku mirov ên berê wê gelek tişt wê weke fêrbûnên me wê di wê xewnê de wê hebin. Lê em çima bi pirranî, wê dema ku wê xewnê dibînin, dibêt ku em ne wê farqê de bin ku ew di wê de hena. Ber ku ew jîyankirinên me, bi rewşên ku em dijîn, bi wê dîmenê ku me ew jîyankirîya, ji wê zêdetirî, wê darêjka wan, wê di wê de wê hebe. Em dema ku rewşekê dijîn, em bi dîtina rewşê re li rewşê heyîder in. Lê bi darêjka rewşê re em, ne heyîder û ne difarqê de na. Rewşek ku me ew jîyankir, em tenê ji wê rewşê, hinekî dizanin û di farqe wê de na bi dîtin û kifşkirina xwe ya bi hişmendî a bi aqilê xwe re. Lê ji wê zêdetirî jî wê rewş wê xwediyê

rewşna heyînî a bi xwe re bê. Di vê çerçoveyê de em divê ku vê jî werênina ser ziman, em gelek tiştên ku wan dijîn, ew bi dîtina me re dibê ku di mejiyê me de ew bîn qaydkirin. Lê em wê dema wê qaydkirinê, dibê ku em ne di hişê wê de bin. Minaq, dema ku mirov di taksîyekê de na û taksî bi lez di nava bajêr de diçê, mirov wê kêlîkê di camê re li derve dinerê û wê gelek tişt, mirov û rewşên ku ew di wê kêlîka ku ew dikevina ber dîtina me de dibin. Lê em tenê bi dîtinekê wan dibînin û dibûhûr in. Lê mejî, dibê ku em ne di farqê de jî bin, wê darêjkekê ji wan tişt û rewşan bi dîtina wan mirovan û çûn û hatina wan re wê di xwe de wê qayd bike. Ev rewşên ku em ne di hişê wan de na, wê ew bi me re wê hebin. Wê ew, weke rewşna heyînî wê hebin. Mejî wê di xwe de wê bi xêvê re wê wan dîtinan wê, di xwe de wê bênê cem hevdû. Ev, wê weke rewşe ku mirov li mirovekî bihizirê ku mirov destê mirovekî ji deverekê, çav ji deverekê, ling ji deverekê, serî ji deverekê, gûh ji deverekê, rewşa ku ew di wê de dijî ji deverekê, gotinên ku wê ji devê wî derkevin ji deverekê, û hwd, wê bi hemû rewşên ku ew heya û dijî û ankû di wê de ya, wê weke hevgirtinekê û ankû sentezekê wê hebê. Ev rewş, wê xwe bide dîyarkirin. Di dawîya dawî de wê ew mirov, ji gelek qatkên ku ew hatina berhevdû û ew mirov afirîya û hwd, wê rewş biafirê û wê xwe bide dîyarkirin. Her xewnek, wê weke hevgirtinekê bê ji xêvê afrînerîya xêvê.

Rewşa zêhnê, li vir, wê her wusa, wê di xwe de wê weke ku wê cihane ku mirov wê derve dijî wê di xwe de wê ava bike. Rewşa mayîndatîya biaqil û ankû bi bûyîna zêhnê re wê, her wusa, wê li vir, rewşek teybet wê bi cihane hundûrê mirov re wê bide mirov. Li ser wê re wê weke ku ne wê dem û cihane ku ew di wê de dijî, wê ew wê bijî. Wê ew wê cihane ku ew cihane ku ew di mejîyê xwe de wê diafirênê wê ew wê bijî. Mirovê mesopotamîkî ku ew zêdetirî di aqilê xwe de dijî, wê her wusa ne wusa zêde bi dunya dervî xwe ve wê alaqadar bê. Ev jî, wê sedema wê bê ku ew di xiyale xwe de bijî. Di aslê xwe de dema ku rewş ev bê, wê gotinên weke ´bihûştê(*)´ ku wê weke cihanek bêkêmesî ku wê li wê were hizirîn, wê di mejiyê vê mirovê mesopotamîkî de wê weke afsûneka ku ew bi afsûn dike û ankû weke ku wê mirov bike rewşeka ji xwe çûyî de. Di vê çerçoveyê de mirov, dema ku qaraktekê mirovê mesopotamîkî li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet a bi qarakter bê. Dema ku rewş ev bê, wê êdî rewşa dîzaynkirina rewş, tevger û kirinên xwe û bi wate kirina wan, wê di çerçoveya mantiqê tevger, rewş û kirinê de wê xwediyê giringîyek mazin bê. Di vê rewşê de wê mirov, wê zêdetirî li ser rewş kirinên xwe re wê, li dîzaynkirinekê û levkirineka ahengî wê lê bigiherihê.

Li vir, wê ev têgîn wê weke rengek ku mirov wê bi wê re wê jîyane xwe birêxistin bike bê. Ev jî, wê li ser têgîna tevgerên vacî û ankû mantiqî û hwd re

----------------

(*)Gotina ´bihûştê´ û ankû ya ´dojehê´ wê du gotinên kurdî bin û wê yek wateya wê baş û yen ne baş bê. Wê bihûşt wê weke aliyê baş bê. Tefsirên ku ew dihên kirin bi wê re wê weke cihanek sermed û bêkêmesî wê bi wê re wê were tefsirkirin. Wê bê gotin ku ´mirov ku çu dunya din wê li wir wê jîyane bêmirin wê bijî.

wê bibê. Têgîna tevgerên mantiqî jî wê ew bê ku mirov, di çerçove û hundûrê aqilê xwe de wê mirov ku ew xwediyê rewş, tevger û rengekî jîyanê ê ku ew bi xwe re wê pêşxistibê bê. Li vir, divê ku mirov di dewama wê de wê jî werênê ser ziman ku wê tevgerên mirov ku ew bi hevdû re wê di ahengekê de wê pêşbikevin bin wê, li vir, weke rengekî jîyanê ê jîyane mirov jî wê bi xwe re wê bênina li holê û bidina nîşandin bê. Dema ku mirov bahse tevgerê bi vê rengê bike, mirov vê jî divê ku wê bênê ser ziman ku wê hêvîkirin, çavdêrkirin, hizirkirin, bîrkirin û hwd jî wê bi wê re wê weke rengna wê tevgerên bixûyê û ankû aferendêrîyê bin. Li vir, zêhn jî, wê weke rewşek aqlî a ku ew ji xûy û tevgerên mirov ên aferêndêrî wê ne cuda bê. Li vir, tevgerên xûyî ku em bahse wan dikin, di çerçoveya gavavêtinên mirovî de ku wê mirov wê bi rewşa gîyane mirovî û hwd re ku wê bên kifşkirin bin. Minaq, li ser ziman re gotin, wê bi rengê xwe re wê xûy jî bi tevgerî wê bide nîşandin. Gotin minaq weke derkkirin, hizirkirin, bîrhanîn û hwd, wê bi xwe re wê rengekî tevgerî ê xûy û aferendêrî jî wê bidine nîşandin. Em dikarin vê tevgerîya xûyî a bi qarakter, weke tevgerîya(aferêndêrîya) mantiqî û ankû vacî jî wê werênina ser ziman.

Li vir, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku qarakter, her wusa bi xûy û aferendêrîyên keseyetîyê re wê rengekî keseyetî ê bi dîmenî wê xwe bide dîyarkirin. Gotinên weke keseyet, hizirkirin, hêvî, bihêrsbûn û hwd, wê weke rewşna ku wê rengê keseyetîyê bi xûy û rewşa rûhî a mirov re wê heyîna rewşa bi mirov re wê bide dîyarkirin.

Keseyet, wê di encama rewşe pêşketina di mejiyê mirov de wê xwe bide nîşandin. Her wusa di temenê wê de wê zanîn û asta zanîna mirov a weke pêşketina mirov jî wê hebe. Li vir, tevger, kirin, çûnûhatinên bi keseyetîyê ên rewşî, jîyanî, derûnî û hwd, wê li vir, weke rewşna aqilî ên zêhnî jî bin. Kirinek û ankû tevgerekê, mirov nikarê wê bidest bigirê. Lê em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku wê di çerçoveya heyîna keseyetîyê de wê di nava dem û wûcana fezeyî de wê ew rewş bibê. Di bûyîna wê rewşê de wê çi kifşkar bê. Li vir, dema ku mirov bahse kirinê bike, wê hertimî di temenê wê de wê hizrek wê xwe weke ji ber çi û ankû ew çawa bû, wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa ku mirov wê, dide dîyarkirin, wê rewşek têgînî a bi aqil bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê xwestek û hwd, wê rewşna ku wê di hîmê wê de mêyl wê hebe û wê bide nîşandin. Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku xwestek û ankû rewşên weke xwestekê, ên weke hêvîkirin, hêrsbûn, bêrîkirin û hwd, wê rewşna ku wê li ser aqilê mirov ê kirinî re ku wê bibin bin. Ev rewş, wê ji aliyekî ve wê bi heyîna mirovî a jîyanî û pêşketina aqilê mirov ê ku ew êdî ew di jîyanê de jîyane mirov dide kifşkirin bê. Mirov, li vir, dema ku vê rewşa aqil, dikê ku wê hilde li dest, di serî de wê aqil, bi serê xwe de wê weke heyînek ku wê, ew bi wê rewşa zindîyîya mirov re wê hebe bê.

Rewşên têgînî ên weke ku em bi aqilê xwe re dikevina bîr û hişê wan de gîyan û hwd, wê bi wê re wê xwe bi me re bidina dîyarkirin. Lê li vir, dema ku

mirov bi vê têgîna dûalîsmê re dihizirê, li ser wê têgîna ´ketina farqê´ û ankû *´ketina hişê´* wê de wê, bi rengê bi bîrhanînê re wê ew rewşa gîyanî wê xwe heyîneka ku ew ´heya´ wê xwe bide dîyarkirin. Bi wê zan , hîs û hêsta ku ew dide mirov ku ew ´ber ku ew heya mirov dikeve farqe wê de bihiş´, wê li vir, wê weke rewşek ku wê di temenê wê hişê wê de bê. Zaneyên ku wê bi felsefîkî wê aqil li ser gîyanê wê bimeşênin ên weke Platon ku ew di dema serdema kevnera de ew derketîya, wê li ser gîyanê re wê weke têgîneka bi birhanî wê bênê ser ziman û wê di renge wê de wê bihizirê ku ´ew(gîyan) heya, ber vê yekê ez gihiştina bîra wê.´. Bi wê re jî, her wusa bi demê re serdestbûna têgîna gîyanê jî wê, di vê çerçoveyê de wê weke rewşekê wê were hanîn li ser ziman. Ev rewşên ku wê platon, wê bi hizrên xwe re wê werênê ser ziman, miirov nîşanakên wan bi rengekî din ên bihizirkirinê, mirov bi zerdeşt re kifş dike. Zerdeşt, her wusa, ew jî di wê hizrê û têgînê de ya ku ´ew(gîyan) nebê, mirov wê nikaribê li wê bihizirê jî.´ Bi wê re jî, ev rewşa hizirkirina li ser gîyanê, wê weke rewşek teybet a hizirkî bê. Ev rengên hizir ên weke ´ber ku ew heya, ez wê hîs dikim´ û ankû ´ber ku ew heya, ez wê bibîr dikim´ wê, weke rengekî wê hizrê bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê rewşa têgînê a rengê hizra têgîmna dûalîsmê, wê li ser wê rewşa xwe ya dûîyîtîyê re wê weke rewşek serdest a bihizir a hemû deman bê. Dualîteya nava fîzîk û hizir, wê li vir, wê bi hizir re wê bi demê re wê şêwayên weke *´mengîwerî(îdealîsmê(*))´* û *´pêzawerîyê(metalyalismê(*))´* wê bi xwe re wê biafirênê. Mengîwerî, wê ji zêhnê mirov wê gavê biavêjê. Her tiştê bi hizir re dihênê ser ziman. Her tişt, ji hizrekê ku ew afirîya wê bi wê rengê wê werênê ser ziman. Aliyê pêzawerî jî wê ew bê ku wê heyîna fîzîkê wê dênê li pêşîya hizirkirinê û wê li ser wê biriqîna wê(bûjenê) re wê bike ku wê ew werênê ser ziman.Rewşa fahmkirina herdû alîyan, wê bi hevdû re wê nebê. Yanî, wê weke rewşna li vajî hevdû, wê werênina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê ew vajîbûn, wê bi dijberîyê re wê were hanîn li ser ziman, weke ku çawa ku Zerdeşt, wê bi ´gîyane baş´ û gîyane nebaş´ re wê werênê ser ziman. Di vê rewşê de wê herdû alî wê bi hevdû re di hevyekîyekê de bin û wê di hevrastîyekê dibin. Ev jî, wê bi vê rengê, wê werê hanîn li ser ziman. Heta ku ya baş wê hebe, wê li hemberî wê ya nebaş jî wê hebe. Her wusa wê bi şêwayekê, wê hebûna hevdû wê ji hevdû biafirênin.Li vir, ev rewş, wê di nava rengê hizirkirina dûalîsme kevn de wê pirr zêde wê hebe û wê xwe bide dîyarkirin. Piştre jî wê di dema dûalîsme nû de jî wê li

----------------

(*)Idealism wê weke aliyekê felsefikî ku ew hizrê didênê li pêşîya bûjenê û ankû ´madeyê´ bê. Wê li gorî wê, her tişt wê tasawura mirov a bi hizirkirin û xiyalkirinê jî bê. Wê karibê hemû tiştî şûbjektivite bikê ku bi aqil werênê ser ziman. Kesên weke berkeley wê bi wê rengê wê bikin. Wê hertiştê aliyê wê yê made wê redbikin û wê weke hizirkirinekê û ankû dîtineka xiyalî wê bênê li ser ziman.

(*)Metalyalism wê, vaji idealismê wê bênê ser ziman ku wê temenê hizirkirin û dîtinên me wê, hebûna dervî me ku ew heya a madeyî bê. Wê hertiştê wê bi madeyê re wê werênê li ser ziman. Bêî wê hizirkirin wê nebê wê, werênê li ser ziman.

ser hizirkirinê û hwd re wê ev rewş wê xwe bide dîyarkirin. Em li vir, di dewama wê de dema ku em li wê rewşa dûalîsme nû dihizirin, li ser rewşa aqil re wê xwe meşandin wê bibê. Her wusa, hewldana fahmkirina aqil û di rewşek çawa de wê aqil û ankû zêhn, wê were fahmkirin, wê li ser wê pirr zêde wê serî werê wastandin. Ev jî, wê bi demê re wê xwe pirr zêde wê bi aqil re wê bi şêwayên nû û cuda re wê bê hanîn li ser ziman. Rewşa weke fîzîkê û zêhnê ku mirov wê bi hevdû re wê werênê ser ziman, wê çawa bê? Li vir, ahenge di nava fîzîk û zêhnê de wê weke rewşek ku ew dû xat û ankû aliyên ku ew bi hevdû re di **ahengekê, hevrastîyekê û hevyekîyekê** de bin, wê bi wê rengê wê werênina hanîn li ser ziman. Di serdeme me ya ku ew weke serdema aqil û zanîn û ragihandinê jî ew dihê bi navkirin de wê, di wê de wê bi aqilî di dema hanîna li ser ziman de wê rengê pêzawerî, wê were danîn li pêşîyê û wê bi wê re wê li ser wê re wê hizirîn. Her wusa, li gorî wê mantiqê û ankû vacê jî wê ew bê ku wê bûjena ku ew heya bi hebûnî, wê ji wê biriqîna wê, wê hişkirin wê bibê. Bi dîtina çav re wê, wê mirov tişta ku ew li jîyanê heya ku ew zindî bê û ne zindî bê, wê bibînê û wê derk bike. Li ser wê re wê aqilê wê bi heyînî wê bi mirov re wê çê bibê. Ev rewş û rengê fahmkirina bi aqil, wê weke reng û rewşek teybet a ku mirov wê bi rengê fîzîkê didênê li pêşîya hizirkirinê û bi derkkirina wê re ku mirov wê derk dike û bi wê re êdî mirov bihiş dibê ya. Lê li vir, aqilê ku ew afirî, wê çawa karibê were bi birhankirin ku ew aqil ji wê heyîna fîzîkî û ankû bûjenî a ku ew heya bê? Ev jî, wê weke pirsek ku wê were pirsîn bê. Minaq, xwestek, hêrsbûn, bêrîkirin, hêvîkirin û hwd, mirov nikarê li jîyanê bahse fîzîkîya wan bike. Ew jî lê bi mirov re ew çê dibin. Di nava tur û têkiliyên nava mejiyê mirov de wê, ew biafirin û wê bibin. Li ser wê re minaq, ez dikarim vê yekê jî werênima ser ziman ku mirov dema ku bihizirê bi ber pêşarojê ve û bibêjê ´ezê herim ser tanûrê û nan bipêjim´, wê ev weke gotinaka ku ew fîzîkîya wê û kirinî û ankû pîretîkîya wê nebûya wê, bibê. Her wusa, wê ev gotin, wê weke xwediyê pêşnûmeyek ku ew hatî hizirkirin bê. Berê nan hatîya pijtin. Çendî ku ew berê ew kirin bûbê jî, wê ew newê wê wateyê ku ez, dema ku bêjim ku ´ezê herim ser tanûrê û nan bipêjim´ wê, weke gotineka ku ew hatî li cih bê. Ew, wê were li cih. Lê divê ku ez wî hevîrî bibiim ber tanûrê û wê nanê li wê bipêjim. Yanî, ew rewşa ku min biryara kirina wê daya û ku ew hê nebûya û wê bibê. Çi ewlahîya wê heya ku wê ew rewş weke ku ew hatîya biplan û sazûmankirin di mejî de wê bibê? Ti ewlahîya wê tûna ya. Ti tişta ku ew nebûya, wê ewlahîya bûyîna wê nebê. Kengî ku ew bû, hingî ew bûya. Lê ti kesek, wê nizanê jî bê ku wê ew rewş bibê û ankû nebê. Li vir, ya ku wê bikeve, wê bîryar, vîn û hêza kirina mirov bikeve. Vîn, wê li ser hişmendîyê re wê bi mêyle xwestekê re wê xwe bide dîyarkirin û hebe. Vîn, wê rewşa xwestekê wê, bi hişmendîyê re wê têgîneka serbestîtîyê jî wê bixwe re di temenê xwe de wê bi hawênê. Vîn, wê encama hişê me yê bixwestek bê. Bi wê re jî wê vîn, wê têgîna azadîyê ku wê weke xwesteka bi aqilê mirov a, wê bi wê re wê ew hebe. Vîn,

wê weke aliyekî xwestinî ê di rêgezek ku ew liser têgîna xwestekê re wê bi heyîna rastiyê ve jî wê girêdayî bê. Vîn, weke rengekî xwestekê ê afrîner jî mirov dikarê wê werênê ser ziman. Wê hertimî di kirinê de wê bi hûrgilên bûyînê re wê bibê. Ti tişt, mirov nikarê bahse dûbarekirina wê bike. Dûbarekirin, mirov dikarê weke carek din kirinê wê werênê ser ziman. Ev jî, wê weke ku em dikarin li ser wateya gotinan re wan werênina ser ziman, em dikarin bêjin ku wê ji aliyê wateyên gotinên ´dûbare kirinê´ û ya ´carek din kirinê´ wê ji hevdû cudahî wê hebe. Ev cuda jî, ew a ku yek ku wê wateya ku wê ´dûbarekirinê´ wê bide me. Li vir, em li vir vê jî bibêjin ku em li ser mantiqê wateyê ê gotinê û yê wateya rewşê re mirov nikarê hertimî wê levkirinê bibînê û wê bi wê re werênê ser ziman. Gotin, bi kirde, darêjk û wateya lêkerî a bi gotinê re wê levkirinê mirov dem bi dem dikarê bi gotinê re bibînê. Lê ew, bi rewşê nabê. Minaq, çendî ku mirov dikarê bahse ´dûbarekirinê´ bike bi gotinê re wê, dûbarekirin di rastîyê de di jîyanê de wê hebe? Li vir, ku em li ser rewşên jîyanî re wê werênina ser ziman jî ku ew gotina ´dûbarekirinê´ werê hişê mirov jî, ku mirov li şûna wê gotina ´carek din kirinê´ wê bikarbênê wê weke ku wê rasttir bê. Li vir, dema ku rewş ev bê, wê çaxê, ev pirs jî dihê berbîra me. Kîjan li aliyên din mantiqê xwe dide serdest kirin? Aliyê aqilî dide serdestkirin û ankû aliyê jîyanî dide serdest kirin. Di vê dûalîteya li ser gotinê de wê ev rewş, wê hertimî di nava têgîna dûalîsmê de jî wê weke mijarek ku wê di nava mijarên nîqaşên bi rengê li ser rastteqînîyê de wê weke rengekî dîyarker ê nîqaşê jî bê. Kîjan rast a, wê weke temenê lêgerîna mirov a di jîyanê de bê. Zaneyên weke Bûda ên Asyayî ku wê pişt Zerdeşt re wê werin û wê pirr zêde ji hizrên Zerdeşt û hwd, wê sûdwergirin, wê balê bikişênina li ser vê nûqtê û wê bibêjin ku miirov divê ku xwe lewîtênên zêhnî(*) paqij bike û bi çavek û ankû nerînek paqij a rût li jîyanê binerê û wê fahm bike. Rêya gihiştina ya rastîyê, wê di vê de wê bibînê.

Têgînên weke bi gotinên weke ´gihiştina rastîyê´, ´rêya rastîyê´, ´rastteqînî´ û hwd, wê weke gotinna ku wê di derbarê rewşa jîyan û mejiyê mirovê herêmê de wê pirr zêde wê vegotinbar bê. Her wusa, di nava jîyane xwe de em dibînin ku wê ji serdema sûmerîyan ve li herêmê wê zaneyên civakî ên weke ku ew xwe didina hizirkirinê wê bibin. Ew jî, weke mirovna ´şêwirmend(*)´, ´rewşenbîr(*)´, ´zane´, û hwd hatina bi navkirin. Dema ku mirov, bi kîjan wasifî xwe bi wasif bikira, ku xwe weke ´oldar´ bi wasif bikira û ankû bi rengekî din bi heman rengî bi wasif bikira, wê di vê çerçoveyê de wê ´zanebûne rast´ wê ji bihata xwestin. Her wusa, ev gotina ´zanebûna rast´, wê weke gotineka giring a ku mirov divê

------------

(*)Şêwirmend, kesê ku mirov bi wî li ser tiştekê û ankû mijare dişêwirê bê.

(*)Rewşenbîr kesê ku ew dihziirê, diafirênê, dinivîsênê û dihênê li ser ziman bê. Bi nivîsandinên xwe re rê şanî civakê û endamên wê yên nava wê dide.

(*)Lewitinên zêhnê wê piştî Zerdeşt re wê Bûda jî wê werênê li ser ziman. Li gorî Bûda, heta ku mirov ji lewitînên zêhnê xilas nekê wê nikaribê xwe bigihênê li rastiyê û fahmkirina wê.

ku wê biawayekî rast wê fahm bike û wê werênê ser ziman. Li vir, berî hertiştî ew têgîna bi gotina ´zanebûna rast´ re wê aqilekî demî û bi hişmendî wê di xwe de bi hawanda. Her wusa, bi wê re aqilekî bi têgîna wijdan û ya rewîstê ku ew hatîya xamilandin, wê ji mirov wê bihata xwestin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku têgîna ´zanebûna rast´ wê weke têgîneka ku wê bi wê re wê li tevgerên mirov wê biheta nerîn. Mirov, di nêzîkatî, tevger, kirin û gotinên xwe de çendî rast a û dikarê di cih de gotinan bibêjê, rast tevbigerê, kirinên di cih de ên rast bike û gotina xwe re bi zanebûn û rast bibêjê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê li wê biheta nerîn. Her wusa, nêzîkatîya mirov a ji mirov û hewirdora mirov re jî wê li vir, di wê çerçoveyê de wê bi aqil û zanebûna mirov re wê biheta xistin berlêpirsînê de. Ev yek, heta roja me jî, wê di nava civake kurd de wê weke kevneşopîyeka ku wê li ser zanebûnê re bê.

Têgîna zanebûna rast, wê li vir, di aslê xwe de wê di wateya gotina kirina rast, tevgera rast, kirina rast, gotina rast û hwd de wê were gotin. Ev rengê gotina ´rastîyê´ ku me di hevoka xwe ya pêşî vê de hanî ser ziman de jî wê, di rengekî ku mirov wê ´bi başîyê´ re wê hilde li dest bê. Başî, wê li vir, wê weke rengekî pîvanî ê li ser tevgerên mirov re jî bê. Di rengên aqilî ên weke bi zêhnî ên weke rewîstê û hwd jî, wê ji wê re wê weke hem aliyek û pîvanekê jî bê. Rewşa têgîna başîyê, wê li vir, wê weke aliyekî bê. Ew alî weke aliyê ´baş´ a. Aliyê li dijî wê, wê aliyê nebaş bê. Her wusa, wê li vir, wê ev weke rewşek teybet bê. Hanîna rewşa biahlaq û rewîst li ser têgîna başîyê re wê li vir, gotina başîyê hem bike weke hîm û hem jî wê bike weke rengekî tevger û kirinên bi wê re jî. Mirov, di kirinên xwe yên ku ew li hemberî hevdû dike de wê mirov, her wusa li başîyê bigerihê di wê de. Mirov dema ku wê ji yekî wê li bendî tevgerekê bê ku ew ji wî re bide nîşandin, wê bi hêstî wê li bendê bê ku ew bi başî bê. Ya baş, wê dil xwest bike. Wê hazekê bide mirov, wê rehetî û dilxweşîyekê wê bide mirov. Li vir, wê têgîna başîyê, wê bi tevger û kirin û li ser nêzîkatîyên mirovî re wê xwediyê rengekî jîyanî ê ku wê xwe bi mirov re wê bide nîşandin bê.

Têgîna başîyê, wê weke aliyê ku wê bi wê re wê jîyan bi aliyê wê yê hêrênî re ku wê were hanîn li ser ziman bê.Di rastîyê de mirov, divê ku vê yekê werênê ser ziman ku wê ya başî, wê weke têgîneka giring a wê weke rengên tevgerên mirov ên bi başî jî bê. Mirov bi wê re tevgerên xwe dide dîyarkirin. Ankû bi wê re dide salixkirin. Her wusa li vir, rengê salixkirina tevgeran, wê xwe bi rengê hişmendîya weke başîyê û hwd re wê bide dîyarkirin. Ya ku baş a, wê ji min re ya bi fêde bê, ya rehet û biaramî bê, ya di jîyanê de bihêstek baş bê, ya ku mirov hês wê dike bê û ya ku wê dilxweşîyê bi mirov re çê bike bê. Weke van, wê gelek kirin û tevgerên ku wê bi wê re wê werina hanîn li ser ziman wê hebin. Hemû jî wê, di vê çerçoveyê de wê bi rastîya gotina ´başîyê´ re wê xwediyê rengekî biwatekirinî bin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê rastîya hizirkirina mirov wê li vir, wê di wê de jî wê xwediyê wateyê bê. Heta ku em vê jî li ser têgîna başîyê re wê werênina ser ziman ku wê Zerdeşt, wusa wê werênê ser ziman ku wê başîyê´ weke rengekî têgînî ê ku wê rengê hebûna gîyanê jî wê bide dîyarkirin. Têgîna sermedîyê ku wê Zerdeşt bi gîyanê re wê werênê ser ziman, wê bi gotina başîyê re bê. Her wusa, têgîna darizandina piştî mirinê, wê werênê ser ziman. Wê gîyane mirov, wê bikirinên mirov ên li dunyê ên nebaş re wê were derizandin. Wê hasabên wan bide. Her wusa, wê di nava agirê dojehê de wê bê şawitandin. Di vê çerçoveyê de wê weke rengekî hanîna li ser ziman wê hebe.

Bi aqil re wê têgîna başîyê, wê xwe serdest bike. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê têgîna başîyê, wê weke rengê hizirkirina mirov wê ku wê li jîyanê were, wê bênê ser ziman. Di jîyanê de wê rengê têgîna başîyê wê weke rengê aliyê têgîna afirandinê bê.Di xwezayê de hert tişta ku ew heya, di afirê, fêdeyê dide jîyanê û hwd, wê weke ya baş bê. Her tişta ku wê, bi vê rengê, bi tevgerkirinê re wê di levkirinê de bê, wê weke tişta ku wê baş bê. Fêrbûn, wê weke ya baş bê. Ya ku ew tê zanîn, wê ji baş bê. Lê wê bi ancamên xwe yên çêkirin û avakirnê re wê baş bê. Lê bi rengê xirakirinê ji holêrakirinê re wê weke ne başîyekê re wê were ser ziman. Zanebûn, tişte baş jî bê, wê encamên wê, nêvî bi nêvî wê *baş* û *nebaş* bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku têgîna başîyê, wê di jîyanê de wê weke têgîneka aqilî a ku wê temenî bê. Li vir, ji rengekî darazî zêdetirî wê bi gotina başîyê re wê hebe. Di avsta de wê biqasî ku wê zerdeşt werênê ser ziman û mirov jî wê ji wê fahm bike, wê têgîna başîyê, weke aliyê gîyanî ê mayînda wê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê têgîna başîyê, weke têgînek serdest wê ew werênê ser ziman. Ji aliyekî din ve jî wê bide nîşandin ku wê tekoşîna nava başî û nebaşîyê wê bidomê. Wê di dawîy dawî de wê başî biserkeve li hemberî ya nebaş û wê serdest bibê. Di vê çerçoveyê de wê, ev rengê hizirkirinê wê bi şêwayekê wê rengê pêşketina wê, wê di dema Mîtra de jî wê xwe bide dîyarkirin. Minaq, wê bawermendên Mîtra wê bi wî re wê werênina ser ziman ku wê Mîtra, di nava tekoşîna bi xirabî û nebaşîyê de bê. Lê bi wê re wê biserkeve. Heta ku ew dihênina ser ziman ku wê yazdanê mazin, wê piştî serkevtina Mîtra a li hemberî nebaşîyê di tekoşîna wî de wê, serdemekê bide destpêkirin. Piştre jî, wê di vê dem û serdema ku wê were de wê aşîtî û aramî wê were. Di nava wê aşîtî û aramiyê de wê gûr û meh wê bi hevdû re wê biçêrin, lê yek jî ji ya din re wê bi hebûna xwe re wê telûkeyê çênekê.Ev dema aşîtî û aramiyê wê 40 salî wê bidomê. Di dawîya wê de jî wê li ser xatirê Mîtra wê yazdanê mazin, wê dunya û bihûştê wê derîyê wan li hevdû vekê û wê bike yek. Ev jî, wê êdî destpêke jîyanek biaramî û aşîtî a sermedî bê.

Têgîna başîyê, wê weke têgîneka ku wê mirov bi mejîyê xwe re wê mêyla mirov wê bi wê ve bê. Her wusa, rewşa başîyê, wê weke rewşeka ku wê bi

gelek şêwayan wê li ser wê re wê were hizirîn bê. Rengên hizirînê ên li ser têgîna başîyê re wê weke rengên rewîstî û ankû ahlaq û hwd re wê bibê. Her felsefe, wê têgîna başîyê wê weke armanca kirdeyî a vêşarî û ankû vekirî wê di temenê wê de wê hebê. Wê hewl bidin ku ew xwe bigihênina ya baş. Têgîna ´ya baş´ û´başîyê´, wê hertimî heman têgîna başîyê re wê neyênina ser ziman.Lê weke têgînek giştî têgîna başîyê, wê di nava felsefeya dûalîsmê de jî wê, di armanca gihiştina wê de bê.

Têgîna başîyê, wê her wusa, wê weke têgîneka ku mirov wê divê ku weke aliyekî aqilê mirov ê ku ew pêş dikeve jî wê werênê ser ziman. Her wusa, başî, wê li ser aqil re wê weke têgîneka dîtbar a aqilî bê. Wê ew tenê weke aqilekî wê hebe. Di vê rewşê de ku mirov dikarê tenê weke heyîneka ku wê tenê wê bi zindîyên ku ew dikarin bihizirin re wê werênina ser ziman. Ya baş, weke ku ew ´dihê herêkirin jî mirov dikarê wê werênê ser ziman. Weke ya meşrû jî ew bi têgînên weke rewistî û hwd re hatîya herêkirin a. Ya ku mirov wê baş dibînê, her wusa ya ku mirov wê ji aliyê aqil û heyînî ve wê herê bike bê. Di vê çerçoveyê de wê ya ku mirov wê herê bike, wê weke ya ku wê ew baş bê bê.

Di nava felsefeya dûalîsm de wê di vê çerçoveyê de wê li aliyekî wê ya baş û li aliyekî vajî wê ya nebaş wê were danîn. Di vê çerçoveyê de wê bi têgînî û aqilî wê ew werina şîrove kirin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê dûalîsm, wê ya baş, di vê çerçoveyê de wê wê werênê ser ziman.

Em li vir, dema ku wê têgîna başî û nebaşîyê bi têgîna hevyekîyê ku wê bi têgîna dûalîsmê re ku wê bahse wê were kirin û ew bahse wê were kirin jî, wê li vir, weke aliyekî ku mirov wê bike ku wê hilde li dest. Di kîjan şert û mercan de wê ev hevyekî wê esas bê? Li vir, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku wê weke ku Zerdeşt wê werênê ser ziman, wê berê mirov bi aqilê mirov re wê biber ya baş ve bê. Her wusa, wê ev bi ya aramîya mirovî re wê were ser ziman. Rewşa ku mirov wê bi vê rengê wê hilde li dest, wê weke rewşek teybet a aqilî bê.

Rewşa dûalîsmê bo ku mirov wê baş fahm dike, mirov divê ku wê li ser jîyanê re wê hilde li dest. Mirov, di nerîne xwe re û bi daraza xwe re çi rast dibînê di jîyanê de? Wê ev, wê weke bi jîyanê re bi awayekî dualîteyî wê bide dîyarkirin. Mirov, dema ku mirov rehet a, wê bi wê re biwastihê û ne rehet jî bibê. Mirov dema ku xwarinê dixwe û bi wê e mirov têr dibe, mirov dema ku xwarinê nexwe jî wê bircç bê. Mirov dema ku tî bê, ku mirov avê vexwe wê tîbûna mirov wê derbas bibê, bi wê re ku mirov avê nexwezê mirov wê tî bimênê. Ev rewş, wê bi jîyanê re wê di çerçoveya heyîna wê ya ku ew xwe die domandin de wê, ew hebin.

Wê bi xwesteka jîyanê re wê hebe. Li vir, xwesteka jîyanê, wê weke xwestekek zindîyî a ku xweza wê hebe. Her wusa, wê mirov, li ser wê re wê li jîyanê wê binerê. Çendî ku mirov dikarê bijî, wê ew jîyan bi mirov re û ankû bo mirov wê hebe. Bi wê re jî wê, têgîne ku mirov wê bixwezê ku wê ew weke ku

ew dixwezê ku ew bijî jî wê li vir, wê weke aliyekî kifşkar ku wê xwe bide domandin bê. Her wusa rewşa aqilê mirov, wê bi wê re wê bi rengê jîyanê re wê heyîneka bi aqilî a ku mirov bi wê re dijî wê bide nîşandin. Li vir, rewşa têgîna ahlaqî û ankû rewîstî, wê mirov wê weke minaqeke wê bide nîşandin. Her wusa, weke pergalek jîyanî a têgînî wê aqilê ahlaqî û ankû rewistî wê xwe li ser jîyanê re wê bi serdestî wê bide dîyarkirin. Mirov, bi wê têgîna ahlaqê û hwd re wê, di çerçoveyek ku ´ew, wê herê dike de wê bijî. Wê bi wê re wê acibendin, hêskirin û hwd, wê xwe bide nîşandin. Di serî de wê hêskirinê wê weke hêskirineka cewherî ku ew di çerçoveyek xwe ecibendinê û hwd de wê bixwe re wê bijî. Di vê çerçoveyê de wê xwestek, bi teorîkî wê bi sedemê û ankû ji aliyekî xwe ve ku wê sedem di wê de û wê xwe bi wê re bide nîşandin, wê hebe. Têkilîya têgîna xwestekê û ya ahlaqî, wê weke têgînna ku wê di çerçoveya pejirendinê û hwd de wê xwe bigihênina hevdû bin. Ya ku mirov wê weke ya ahlaqî bibînê, ya ku wê mirov wê bi ´başî´ wê bi xwe re jî wê bi pejirendinekê wê herê bike û wê bi wê re wê bijî bê. Di vê çerçoveyê de wê rewîst, weke rêgezek jîyanî wê bi têgînî wê xwe bide dîyarkirin. Ya ku mirov, wê di nava rewşa aqil de ku wê ´makul(*)´ dibînê, wê ji aliyekî ve wê weke ya ku mirov wê bi vê çerçoveya têgîna rewîstî re ku wê hilde li dest bê. Di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve heyîna rewîstî, wê weke heyînek aqilî a darazî(*) jî bê. Wê bi wê rengê wê ew heyîn li jîyanê, wê xwediyê reng û rewşa têgînî a ku ew di jîyane mirov de ew serdest bê. Di vê çerçoveyê de wê rewşa têgîna rewîstî, wê ji aliyekî ve wê gotina başîyê ji xwe re wê bike weke tac û dênê ser serê xwe. Wê bi wê re wê xwe bide jîyankirin. Têgîna rewîstê, di vê çerçoveyekê de mirov dikarê wê weke rengekî aqil ê ku wê ew bi wê re wê hebe bê. Mirov dikarê bi wê re wê werênê ser ziman. Wê têgîna başîyê, wê li vir wê ew li jîyanê li ser heyîn û pêşketina aqil re wê xwe serdest bike bê.

.

**Têgîna başîyê û aqilê kirinî(*) û dûalîsm**

Rewşa têgîna başîyê, weke rêgezek heyînî a biaqilê mirov ê ku ew heya re wê divê ku wê hilde li dest û wê bike ku wê bi fahmkirinekê wê werênê ser ziman. Têgîna başîyê, wê her wusa, li vir, wê weke rengekî têgînî wê hebe.

----------------

(*)Aqilê makul wê weke têgîneka ku mirov dikarê di çerçoiveya rêgezên mantiqê de wê hilde li dest û wê werênê li ser ziman bê. Wê di wê çerçoveyê de jî wê xwediyê têgînekê bê. Di felsefeya mantiqê de wê, ya ku ew dihê dîtin weke ya ´rast´ ku ew li mirov rast tê wê weke ya ku ew li mirov makul were jî bê.

(*)Daraz wê muhakame me bê. Wê aqil meşendina me bê. Wekê din wê rengê hizirkirina me ya li ser rewş û bûyarê jî bê. Mirov bi daraza xwe re wê ´rast û ankû ne rast dibînê. Wê bi wê rengê jî wê, bi têgînî wê ew bê daraza me.

(*)Aqilê kirinî wê, aqilê bi kirin û tevgerên me re ku ew dihê pêşxistin bê. Bi gotineka din wê aqilê piretîkî bê. Felsefeya aqilê kirinî wê di roja me de wê weke felsefeyek û ankû zaninek afrîner wê pêşkeve. Her wusa di roja me de wê bahse aqilê afrîner wê were kirin. Di wê çerçoveyê de hizirkirin û bi wê re pêşxistin û çêkirina tiştan wê weje aliyekê wê yê din ê ku mirov wê dikarê wê werênê li ser ziman bê. Aqilê felsefeyê wê, wê bi kirinê re wê, li ser têgînên weke mantiqê û hwd re wê, çerçoveya darêjkî wê bi wê re wê biafirênê û wê werênê li ser ziman.

Mirov, di jîyanê de bi ya ku wê baş dibînê re wê bijî. Her wusa, bi wê re mêyl û berê mirov bi aliyê jîyankirinê ve ya. Di vê çerçoveyê de wê çawa bijî, wê dike ku bide dîyarkirin.

Têgînên weke têgîna başîyê û hwd, wê weke têgînna ku mirov dikarê li ser wan bihizirê bê. Wê ew b aqilekî wê di mejiyê mirov de wê hebin. Mirov wê karibê, li ser wan re wê bihizirê. Lê ji aliyekî ve têgînên weke ya başîyê û hwd, mirov nikarê wan bi dest bigirê û ankû bi hacm û hwd, wê werênê ser ziman. Li vir, weke têgînekê, wê xwe weke rengekî darazî a li ser aqilê me re jî ku wê were hanîn li ser ziman bê. Zerdeşt, wê başîyê, weke rengekî têgînî ê bi rewîstî jî wê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê bihizirê. Her wusa ya ku mirov wê li vir, dike ku wê fahm bike, wê weke aliyekî wê hebe.

Mirov, dema ku bidest biaqilbûnê kir û aqilê mirov afirî û pê de, wê êdî wê mirov bi aqil li jîyanê binerê, kirinan bike û wan bibînê û ankû şîrove bike. Her wusa *dîtina kirinan* wê weke rengekî darazî bê. Dema ku mirov bahse rengê dîtina kirinan bike, wê bi wê re wê ew dîtinan kirinê, wê weke rengekî ku mirov wê çawa dibînê, wê xwe bi me re wê werênê hanîn li ser ziman. Bi dîtina mirov re mirov wê kirinê baş û ankû nebaş dibînê. Di vê çerçoveyê de wê başî û ankû nebaşî, wê weke rengekî darazî ê ku mirov wê baş fahm bike bê. Her wusa, rengê hizirkirina Zerdeşt ku ew bi gotinên weke ´*kirina baş, tevgerên rast û dîtina baş*(*)´ re dihênê ser ziman, wê di van waran de wê weke destpêka hizirkirina bi felsefeya aqilê kirinê jî bê. Di serî de felsefeya aqilê kirinê ku wê weke rengekî dîtinî ku ew weke gotina bi ya başîyê û hwd re ku em nikarin bi cismekî di jîyanê de ku ew heya re wê werênina ser ziman û em nikarin wê weke tişteî ku mirov wê hilde li dest wê werênê ser ziman, wê li vir, li ser rengê hizirkirina bi aqilê felsefeya kirinîyê re wê bi têgîneka metafîzîkî wê me di nava xwe de bibû û ankû wê bide hizirkirin.

Rewşa hizirkirina  li ser rastîyê, wê bi heman rengî wê weke gotinaka ku em bi cism wê werênina ser ziman.Lê em dikarin wê bi gotina başîyê re wê werênina ser ziman.Minaq, weke rastîya başîyê´ û hwd. Têgîna bi gotina ´rastîya başîyê´ re dihê ser ziman, wê weke têgîneka razber a teorîkî bê. Mirov çi weke rastîya başîyê dibînê? Ankû ew rastîya wê çî ya? Li vir, dema ku em li ser vê dihizirin, bi wê re wê bi awayekî bixwezayî wê rewşa çalakiyê û ankû tevgerîyê wê xwe weke mijareka sereka wê bide derxistin li ber me. Em li vir, divê ku çalakiyê û ankû tevgerê bi wê re fahm bikin. Çalaki û ankû tevger, wê bi wateya kirina ku ew hatî kirin re wê bê xwediyê reng û awayekî bipêşnûmayî ê gotinê.

Her çalaki û ankû tevger, wê di kirinê de wê weke xwediyê rastîyekê bi navarokî bê. Her wusa, ya ku wê çalakiyê û ankû tevgerê dide kirin, wê çi bê. Bi wê re mêyl û ankû bi wê re xwestek û hwd, wê li vir wê xwe bide dîyarkirin.

---------------

(*)Wê gotineka zerdeşt bê.

Xwestek, mirov nikarê wê weke cismekê wê hilde li dest û werênê ser ziman. Lê rewşa fahmkirina wê bi rewşa aqilê kirinî re wê weke rengekî wê aqilê kirinî bê. Xwestek, wê bi rastîyê re wê rastîya çalakiyê û ankû tevgerê wê di dema bûyîna wê de wê bide afirandin. Ev rewşa bûyîna wê çalakiyê û ankû tevgerê, wê weke rewşek heyînî wê hebe. Çendî ku em nikarin wê weke **cismekê** hildina li dest û ew ne bi **hacm** jî bê, lê wê ew weke heyîneka ku em bi aqilê kirinî re wê hildina li dest bê. Aqilê rewşa fizîkî, wê weke ew aqilê wê tişta ku mirov dikarê destlêbide, hilde li dest, bicism û hacm bê. Aqilê rewşa fîzîkî wê weke aqilê zêhnî ê fîzîkî bê. Bi hebûna fîzîkî a heyînî re ew heya. Mirov dikarê wê bahse wê bike û wê hilde li dest. Wê bidest bigirê. Mirov dikarê enstrûmenteka musikê hilde li dest, destlêbide û wê têlên wê dest li wan bide û deng ji wan bide drxistin. Lê mirov nikarê dest li wê dengê ku ew derdixe bixe. Wê ew deng li gorî wê rewşa fîzîkî a wê enstrûmentê û ankû heyînek din a fîzîkî wê ne bi hacm û cism bê. Wê ew weke deng wê hebe. Ew deng, wê weke rewşe ku ew heya bê. mirov wê di mejiyê xwe de wê pêşnûmeya awazên dengî rast bike û wê bi reng bike. Mirov, wê levkirinekê bi wê re çê bike. Piştre jî, wê li gorî wê levkirinê wê dest li wan têlan bê xistin û wê ew deng bê derxistin. Ew deng, û hizirkirina li levkirina wê gotinên wê yên awazî, wê weke rewşek aqilê mirov ê kirinî ku em wê nikarin bi fîzîkîya bi hacm û cism re wê werênina ser ziman bê.

Ew dengê ku ew ji wê enstrûmente wê bê derxistin, wê di temenê wê de wê kifşkirina mirov a bi vîna mirov a bi aqilê mirov wê hebe. Mirov, li wê hizirîya û wê dike ku wê derxê. Deng, mirov nikarê wê bidest bigirê. Lê deng, weke heyîneka ku mirov bi rêya sehên xwe yên denggirtinê ên weke gûh û hwd re wê digirê û dihilde. Ew deng, wê rengekî wê rewşe heyînî a dengî a wê temenê ku ew ji wê derketîya bê.

Mirov, wê karibê, wê dengê bi reng û awa bike. Mirov wê karibê, wê dengê his bike û ankû deng bike. Ew deng, wê were mejîyê me. Wê mejiyê me ji wê bi awayekî bîolojikî wê ji wê dengê bi bandûr bibê. W di encama wê bandûrbûnê de wê levkirinên kimyewî wê di mejî de wê bi wê bandûrê û dengê re wê biafirin. Deng, weke têkiliyek fîzîyolojikî a ku mirov nikarê wê bidest bigrê û deng lê bide bê. Her wusa, wê bi vê rengê wê ew xwediyê awayekê bê. Lê ew deng, wê hebe.Aqilê me yê kirinî, her wusa, weke aqilê ku em li ser gotinên weke ´başîyê´ û hwd e dihênina ser ziman re wê were hanîn li ser ziman. Zerdeşt, di vê çerçoveyê de wê bi gotina başîyê re wê bike û bixwezê ku ew dîmenekî jîyanî ê bi rengê jîyanê re wê bi afirênê. Her wusa, wê li ser wê re wê bi gotinan, levkirina gotinan û têkiliyên li ser wateyê ên di nava gotinan de re wê bixwezê ku wê dîmenê bi reng, şekil û awa bike. Bi wê re wê bike ku wê werênê ser ziman.

Ya ku wê bi gotinan re wê temenê pêşketinê jî bê, wê li ser wateyê û ankû watekirinê re wê bi rengê têkilîdanînê a li ser gotinan re bê. Di vê çerçoveyê de wê, ziman, bi daçek, pêvek, pêşek û paşekên xwe û hwd re wê bi hemû rengên

xwe yên girêdanî ên bi vê rengê re wê, xwediyê afrînerîyek bi wateyî bê. Li ser gotinê re hanîna li ser ziman, wê çerçoveyekê bi aqilê kirinî ê şenber wê bi xwe re wê bide afirandin û bênê li holê. Li vir, têkiliya ziman û aqilê kirinê, wê di afrînerîya li ser ziman a bi aqilê kirinî re ku ew xwe dide diyarkirin. Di aslê xwe de ku mirov li vir li ser aqilê kirinî ê weke bi gotina başîyê û hwd re ku mirov li wê dihizirê, weke ku rengekî hizirkirinê ê aqilî ê li ser gotinan re wê xwediyê dîmenekî bê. Li vir, ev rengê şîrovekirinê wê ji gelek aliyan ve wê xwediyê rengekî fahmkirinê ê ku mirov divê ku wê fahm bike û wê bike werênê ser ziman bê.

Aqilê mirov, di vê çerçoveyê de wê bê xwediyê dûalîteyekê. Ji aliyekî ve wê weke aqilê fîzîkî bê ku mirov karibê wê bi fîzîka bi hacm û cism wê hilde li dest û fahm bike bê. Lê ji aliyekî ve jî wê weke aqilê ku em heya lê ku mirov nikarê bi hacm û cism wê bênê ser ziman. Li vir, ev rewşa têgînî ku wê carna bi aqilê pêzawarî re wê were hanîn li ser ziman ku ´wê her aqilek xwediyê rewşek fîzîkî a ku ew ji wê diafirê bê´ jî wê, ev rewş, ji aliyekî din ve wê têgînekê di serê mirov de wê bide çêkirin. Weke ku çawa ku mirov bi aqil wê kifş bike û wê fîzîkîya wê, piştî wê re biafirênê wê werênê li holê. Li vir, weke ku çawa ku wê bi aqilê felsefeyê ê pêşî re wê were dîtin û ser ziman ku ´wê ji fîzîkê wê aqil weke dîmenê wê yê duyem wê were li holê´ wê, bi wê re wê aqil wê bi şêwayekê wê bidest afirandina xwe ya ku wê pêşî bi aqilê kirinî wê kifş bike, bi pêşnûma bike û w piştre, wê biafirênê bê. Her wusa, di roja me de çêkirina arabayan, pêşxistina balafiran, internett bi bernemeyên wê re û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rengekî pêşketinê ê ji aqil bi ber afirînîya bi fîzîkî bê. Li vir, ya ku wê weke rêgezekê xwe bide dîyarkirin ku wê aqil, weke rewşek navendî a wê rewşa afirandinê wê ew were li holê. Rewşa aqil, wê weke rewşek teybet bê. Li vir, têgîna aqilê kirinî ku em wê bi rengê aqilî û ankû zanebûna bêhacm û cism re wê werênina ser ziman re wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê reng û şêwayekî giring ê fahmkirinê bê. Wê bi wê re wê ev rengê aqil, wê weke zanebûna şûbje jî, wê xwediyê rengekî afrînerîyê ê bi ber fîzîkê ve bê. Li vir, têgîna zanebûnê a berê ku ew ji rewşa fîzîkî bû, piştre li ser aqilê kirinî re ku ew têgîna zanebûnî ku wê afirandina fîzîkî wê ji wê bibê, wê weke rêgezekê li ser aqil re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, ev rewş, wê têgînê bi mirov re dide çêkirin ku wê rewşa fîzîkî, li ser şenberîya pêşnûmayî a hizirkirinê re wê xwediyê têgîneka rêgezî a metafîzîkî bê ku mirov bi wê re fahm bike ku rewşa fîzîkî weke têgîneka metafîzîkî di nava rewş aqil û zêhnê mirov re ew xwe heya û dide dîyarkirin bê.

Bêgûman, rewşa têgîna ´zanîna fîzîkê û ankû fîzîka zanînê û hwd, wê weke mijarek aqilê kirinî a bi fahmkirinê re a pirr kûr bê. Divê ku mirov wê bi awayekî hûr û kûr hilde li dest.

Ku em gotinø ji aliyê fîzîka zanînê ve wê hildina li dest, wê hingî, wê weke rengekî hizirkirinê a li gorî aqilê kirinî û ankû zanînî bê. Aqil, di xwe de wê

weke rêgezekê, wê têgîna ´karîna kirinê´ wê bihawênê. Wê li gorî wê, wê xwe werênê hanîn li ser ziman. Rewşa hanîna li ser ziman, li vir, wê li ser têgîna xosletan re bê. Xoslet, ku em bahse wan bikin, wê her wusa, ji du aliyan ve wê xwediyê wateyê bê. Aliyê pêşî jî wê ji aliyê cerb û ezmûnê ve bê. Ji aliyê din ve jî wê bi rewşa têkilîdanînê û hwd re bê.

Rengê hizirkirinê jî wê ji aliyekî ve wê li ser xosletan re bê. Minaq, hebûna trimbêlekê ku ew bi giranîya xwe re bi dehan tonan giran a. Mirov, heta ku wê cerb nekê bi ezmûnî, mirov wê hebûna wê tirimbêlê çendî ku bi çav bibînê jî mirov, wê fahm nekê ku ew giranî bi wê re heya. Her wusa, aliyê cerbî, wê bi xosleta tiştê a bi heyînî ku wê xwe bi têgîna mantiqê re wê bide dîyarkirin re wê bide nîşandin.

Rastîya heyînê, li vir ku minaq, weke tişta giran bê, wê ew di piretîkê de wê xwediyê wê giraniyê bê. Lê ew giranîya ku ew di piretîka wê tiştê de ku ew heya, wê di rengê hizirkirina aqilê mirov û her wusa dîmenê dîtina wê tiştê a bi hizirkirina mejiyê mirov re wê nebê. Tirimbêlek ku ew bi dehan tonan giran a, wê mirovek ti çarî nikaribê bi destê xwe wê rakê ji ardê. Wê li gorî ahenge wê giraniyê wê kişînaardê, wê ew wê tiştê bi ardê ve bide kişandin. Li vir, wê hêza giranîyê, wê bi tîrbûna tiştê ve girêdayî bê. Her wusa, mirov nikarê wê zêde bi hacmê ve girêdayî wê werênê ser ziman.

Bi vir ve girêdayî, mirov divê ku vê yekê jî li ser rewşa fîzîkîya rewşê re werênê ser ziman ku wê, fîzîkîya rewşê, wê xoslet û teybetîyên wê, wê di rewşa dîyarkirina mantiqê fîzîkîya wê de wê dîyarker bê. Her wusa, kevirekî ku ew hatîya kifşkirin ku ew hezar kiloyî giran a, wê ew kevir, mirov dema ku wê bike ku wê bi fîzîkîya wê re di piretîkîyê de wê hilde, mirov wê nikaribê. Lê mirov bi aqilê xwe dema ku li wê kevirê hezar kiloyî bihizirê û wê di hizra xwe de wê bike ku wê hilde, wê mirov karibê wê di hizirkirina xwe de wê hilde. Heman rewşa fîzîkî, wê ji aliyê rewşa fîzîkîya tiştê ve wê rêgezên tiştî bi destûrî li xwezaya wê tiştê wê bide serdest kirin. Lê ji aliyê aqil û hizirkirina biaqil re jî wê, rêgezên hizirkirinê ên fîzîkîya rewşê wê bike ku ew serdest bike. Kevirekî ku ew hezar kiloyî giran a, mirov nikarê wê bi fîzîkîya wê ya kirinî a ku ew heya de wê ji adê rabike. Lê ew kevir, mirov bi hizirkirina xwe re ku ew hezar kilo jî bê û deh-hezar kilo jî bê, mirov dikarê wê di hizirkirina xwe de wê hilde. Mirov, dema ku wê hizirkirinê dike, çendî ku ew hizirkirin, ji heman tiştê jî bê, lê bi hizirkirinê re wê rêgezên hizirkirinê li wê serdest bê. Rewşa hizirkirinê bi mantiqê wê re wê ji ya fîzîkîya rewşê ku ew bi rêgezên rewşa xwezaye fîzîkî re ew heya, wê bi hizirkirinê, wê di mejiyê mirov de wê, bi rengê hizirkirina me re bê. Rewşa giranîya tiştê ku ew çendî giran jî bê, wê di dema hizirkirinê de wê ew tenê weke rengekî hizirkirinê bê. Her wusa wê aqilê mirov, wê giraniyê, bi giranîya wê ya fîzîkî re wê kifş nekê. Li vir, mirov dikarê vê pirsê jî bipirsê ku ew rewşa giranîyê, ku mirov li wê dihizirê, mirov fahm dike ku ew çendî giran a, gelo ew bi rastî jî giran a, û ankû ew tenê tabîî rêgezên kişînaardê ya? Heman

kevirê ku ew bi hezaran kiloyan giran a, ku ew kişîna ardê nebê, wê weke tiştekî ku ew nexwedî giranî wê hebe. Di rewşa wê giraniyê de ku wê weke wê kevirê bi hezaran kiloyan giran bê, di nava rewşa ku wê kişîna ardê nebê de wê weke polîtankekê wê sivik bê. Her wusa, weke ku mirov çawa ku wê bi hizirkirina xwe re wê tiştê dervî wê têgîna giraniyê li wê karibê bihizirê, wê bi rewşekê re wê xwe bide dîyarkirin. Ev rewşa ku wê hizirkirina me, ne xwediyê wê sînorê fîzîkî ya. Rewşa fîzîkîyê, wê weke rewşek tabiî a bi kişîna ardê re bê. Di vê çerçoveyê re wê, aqilê me yê kirinî ku ew xwediyê wê rewş û têgîna rêgezî a dervî rêgezên fîzîkî **ya**, gelo ew rewşa nebûna kişînaardê a bêgiranî ya fîzîkê bi xwe re dihênê ser ziman? Bêî giranî, hacm û cismîtîya wê wê hebûna tiştî a fîzîkî, wê weke tiştek heyînî a têgînî wê hebe. Tiştekî ku ew xwediyê giraniyekê bê, heta ku mirov wê giranîyê ne wezinênê bi wê hebûna wê tiştê re mirov wê nizanibê ku ew tişt çiqasî xwediyê wê giraniyê ya. Çiqasî ew tişt giran bê, wê wilqasî ew tîrîtîya wê ya heyînî a bi hebûnî wê hebe.

Heyîn û hebûna aqilê kirinî ê piretîkî, wê xwediyê têgîna tiştê a heyînî a ku ew ne xwediyê giranî, hacm û cismîtîya wê bê. Di vê çerçoveyê de mirov, dikarê rewşa deng û ankû rewşa nerînê a bi dîtinê re wê, weke minaq bide nîşandin. Aqil, weke rengekê w yê hizirkirinê, wê ne xwediyê giranî, hacm û cîsmîtîyê bê. Lê wê xwediyê têgîna wan bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku wê têgîna giranî, hacmîtî û cismîtîyê a tiştê, wê bi fîzîkîya wê re wê li gorî rêgen wê yên fîzîkî n destûrî ên fîzîkîya wê re wê xwediyê heyînê bê bi tîrîtîya wê re. Rewşa aqilê mirov wê, her wusa, wê weke rewşek nerînî a bi dîtinî bê. Tişt ku ew heman tişt jî bê, wê bi aqil re wê xwediyê rewşek ku ew rewşa giran, hacm û cismê bi wê re xwe nadê dîyarkirin a. Mirov, bi aqil re wê, xwediyê wê hêst û hîsê bê ku ew xwediyê wê serdestîya li wê tiştê ya. Di nava aqilê mirov ê kirinî de wê sînorê afirandin û biawa, pêşnûma û darêjkkirinê wê nebê. Lê heman tişt, ku ew bi fîzîkîya wê re bê, wê xwediyê rewşek teybet bê. rêgezînên heyîna fîzîkîyê, li vir, wê giring bin ku mirov wan fahm bike. Farqe, heyîna fîzîkî a tiştê û dîtina wê ya bi aqil, wê her wusa, carna tenê di wê rewşa giranî, hacm û cîsmîtîya wê de bê.

Xosleta tiştê a fîzîkîyê a giraniyê, li vir, ji aliyekî ve mirov divê ku wê bi teybetî wê hilde li dest. Dema ku mirov tiştê dibînê, mirov wê biheman cismê wê re wê bibînê. Di vê çerçoveyê de wê ew weke darêjka wê tiştê wê bi aqilê me re wê xwe bide dîyarkirin. Mirov wê keve farq û têgîna wê de. Lê rewşa hacm û giraniyê, wê ne wwusa bê. Çendî ku mirov wê tiştê bi giraniya wê re jî wê kifş bike jî wê, ew tişt wê rewşa giranîya wê, wê weke kirdeyek vêşarî wê di wê de bi fîzîkîya wê re wê hebe. Di heman tiştê ku mirov wê dibînê de mirov bi dîtîna xwe re wê nikaribê wê tiştê ji hemû aliyên wê ve wê derxê têgihiştinê. Minaq, çendî ku mirov wê tiştê bi reng û şamalê wê re wê kifş bike û weke ku fahm bike jî, lê wê ew giranîya wê, ku ew hebe, wê newê zanîn. Her wusa, wê weke nepenîyekê, wê ji aqilê me re wê bimênê. Tişt, wê cerbandina wê, wê li

vir, bo fahmkirina giranî û hwd, wê weke rengekî rêgezî ê bi tîrîtîya wê tiştê a fîzîkîya wê re wê xwe bide nîşandin.

Hebûna fîzîkî a tiştê, wê hertimî li vir, wê weke mijarek ku mirov wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Hebûna tiştê a fîzîkî, wê weke rewşek tiştî a wê tiştê bê. Wê xwe weke aliyekî giring ê wê tiştê wê bide dîyarkirin bê. Rewşa wê tiştê a fîzîkî, wê ji vê aliyê ve wê weke ku wê gelek nepenîyan wê di xwe de wê bi hawênê bê. Têgîna têgezî a fîzîkî, wê bi hebûna xwe re wê hebe. Lê rewşên wê yên bi gûharina wê ya bi demê re ku ew weke rêgezek têgînî a fîzîkê xwe dide dîyarkirin, wê aliyên din ên fîzîkê ê weke bi giranî, hacm û cîsmîtîya wê re ku ew hena, wê bandûra wê li wan jî wê hebe.

Têgîna fîzîkê, wê çiqasî karibê wê rastîya wê ya heya, wê bi xwe re û di nava xwe de wê werênê ser ziman? Her wusa, ev rewş, wê hertimî wê weke mijareka ku wê li ser wê were hizirîn bê. Rewşa fahmkirina fîzîkê a tiştê wê weke rewşek rêgezî a fîzîkî wê demekê di hundûrê demê de wê hebe û piştre wê hin bi hin ew hebûna wê, wê xwe bi gûharînê û hwd, wê ji holê ra bike. Rewşa dualîteya di nava tişta fîzîkî û zanîna wê de wê, her wusa ji vê aliyê ve jî wê bi zanîna tiştê re ku mirov wê dibînê, wê xosletên tiştê ên weke giraniyê û hwd, wê weke ku ew di fîzîkê de bûhûrîner in, wê di aqilê wê tiştê û rengê aqil û ankû zanîna wê tiştê de wê nebûhûrîner bin. Ev rewş, bûya temenê wê têgînê ku wê bê hizirkirin ku wê kişînaardê, wê bo heyîna fîzîkî wê hebe, lê wê bo aqil û zanînê wê nebê. Kişîna ardê, zanîna wê, bixwe jî wê weke ku ew ne xwediyê rewşek fîzîkî bê. Lê wê weke xwediyê rewşeka ku wê fîzîkîya wê bê afirandin bê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna kişînaardê, wê xwediyê rewşekê bê. Rewşa têgîna kişîna ardê, di aslê xwe de wê rastîyek fîzîkî a giring wê bi xwe re wê bide hanîn li ser ziman. Ew jî wê, ew bê ku wê heyîna fîzîkî, wê giranîya xwe re wê weke rewşek kişînaardê wê hebe. Dema ku rewş ev bê, wê çaxê, mirov dikarê wê pirsê jî bike ku wê di rastîyê de wê bi rastî wê giranî wê hebe? Yan jî, giranî heya? Ku kişînaardê, ji holê rabê, wê çi bi navê giraniyê wê hebe. Li vir, têgîna tiştê a fîzîkî, wê her wusa, li vir, wê xwe weke rewşek aqilê kirinî, wê xwe bide nîşandin. Rewşa afirandina biaqilê mirov re wê, di vê çerçoveyê de wê heyîna fîzîkî, dervî wê têgîn û rewşa wê ya giraniyê, wê weke rewş û darêjkek bi pêşnûmayî a ku ew li wê hatîya hizirîn wê hebe.

Bêgûman ev rewşa bi têgîna fîzîkî re mirov li ser xosletên wê yên weke giraniyê hacm û cîsm re li ser zanîn û aqilê kirinî ê piretîkî re divê ku mirov hê li ser wê bihizirê û wê bênê ser ziman.

Rewşa aqilê kirinî ê piretîkî, her wusa li vir, wê xwe li ser fîzîkê re wê weke bi dîtinê re wê bide nîşandin. Her tişta ku mirov ew dît, mirov wê tenê wê bibînê. Her wusa, xosletên wê yên weke giranî, sivikî, di nava wê de çi heya û hwd, mirov wê di nerîna xwe ya pêşî de wê nizanibê. Di dema ku mirov tiştê dihilde li dest, pêşî ya ku mirov wê kifş dike û dibînê jî wê, ew bê ku mirov wê bi awayekî wê keve farqe wê de.

Di xwezayê de her tişta ku ew bi fîzîkî heya, wê dervî nerîn û dîtîna me, wê bi hacm, giranî û cîsmî bê. Nerîna me, wê ew wê tiştê bi awayekî wê bibînê. Her wusa, mirov, dema ku her û li ber latekî mazin bisekinê, mirov wê zanibê ku ew lat kevira û mazin a û pirr giran a. Lê mirov wê nizanibê ku ew çiqasî ew giran a. Ew wê,, weke aliyekî nayê zanîn wê bimênê. Gotina ´giranîyê´ wê weke gotinaka dîtbar û razber bê. *Nedîyarî* di wê de heya. Tişta ku ew giran a, çawa û çiqasî giran a, ew ne kifş a di wê de. Kengî ku ew hat kifşkirin, wê hingî ew êdî wê were kifşkirin û wê bê weke giranîyek bikifş.

Nerîna mirov a bi zanînê re wê, di nava xwe de wê rewşa giranîyê û hwd, ên weke xosletên wê tişta fîzîkî ku ew hena, wê di wê de nebê, weke ku çawa ku wê pirtûkek ji rûpelên qaxiz wê pêkwere û wê ew ne zindî bê. Rewşa dîtinê a bi aqil, wê di vê çerçoveyê de wê di rewşek ku ew hinekî dibînê de bê. Her tişta ku mirov wê dibînê, dibê ku mirov wê werênê ser ziman, wê ew dîtina wê, wê hinekî bê. Wê tenê weke ew serrûyîtîya wê ya ku ew biçav dihê dîtin bê. Tiştakî ku mirov ew dît ku ew çendi mazin a, mirov wê bi dîtin xwe re wê ew wê kifş bike. Lê mirov wê nizanibê ku ew çendî giran a. Gihiştina zanîna rewşa giranîyê û hwd jî wê, bi ceribandinê wê bibê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê ew hebe.

Ev çi dide nîşandin? Ev wê dide nîşandin ku wê di aslê xwe de wê her tişta ku mirov wê bi dîtina xwe re wê dibînê û kifş dike, wê ji aliyekî ve wê weke bicerbî jî bê. Mirov wê, wê dîtinê hilde. Ew dîtin, wê weke dîtinaka ji rewşek wê tişta fîzîkî a ku ew bi hebûnî hebê bê. Wê bi wê re wê ew tişt, wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin.

Li vir, em vê yekê jî bi wê re werênina ser ziman ku her tişt, wê weke ku di rewşek hevgirtinîyekê û ankû rewşek sentezî de bê. Her wusa, dema ku mirov ew tişt bi fîzîkîya wê re bi çav dît, mirov wê dema ku dinerê, wê ew wê tiştê weke ´tiştekî´ wê bibînê. Lê wê bi wê rengê w derk bike û wê hilde mejiyê xwe. Lê ew tişt, wê weke tişteka ku ew gelek tişt bê. Di vê çerçoveyê de wê ew tişt, wê weke gelek tiştan wê hebe. Rewşa hevgirtinîya tiştê a bi fîzîkî, wê li ser wê hevgirtinîya wê re wê ew beş bi bê.Berê li ser têgîna atomê re wê were nîqaşkirin ku wê her tişt wê were beşkirin. Yan jî, wê hertişt ji tozek piçûk wê pêkwere. Ew toz, wê weke mene herî binî ya wê tiştê bê. Atom, wê weke mene herî piçûk wê were ser ziman. Wê weke tişteke ku ew ´nayê beşkirin´ jî wê li wê were nerîn. Lê piştre wê ew hin bi hin wê atom wê were beşkirin. Li ser wê re jî wê êdî wê hizre beşkirina atomê wê pêşbikeve. Heta kûderê beşkirin dibê? Ev jî, wê êdî wê weke pirsekê wê xwe bide dîyarkirin.Di dawîya dawî de wê beşkirin, heta wê asta ku ew tişt bi fîzîkî heya wê bibê. Yanî ast û temenê beşkirinê wê heyînîya fîzîkî a tiştî bê. Heta ku ew hebe, wê beşkirin jî wê hebe. Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê têgîna fîzîkî, wê weke têgîneka ku ew bi heyînîya wê re wê ew li gorî rewşê wê hebe bê. Tiştek bi fîzîkî ew heya. Lê dema ku ew hat beşkirin, wê ew gûharîn bi darêjka wê tiştê a fîzîkî ya rewşa wê re wê bibê. Wê bi wê re ew rewşa ku wê bi heyîna fîzîkî re

wê di wê care pêşî de wê were dîtin, wê ew bigûharê. Wê li şûna wê, wê rewşek din wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê ew cardin, ji me bixwezê ku ew were salixkirin.

Her tişt, wê weke rêgezekê wê ya bingihînî, wê bi têkilîyên xosletî û teybetmendîyan, wê bi hevdû ve girêdayî bê. Her wusa, tiştek, dema ku ew ji gelek tiştan pêkwerê. Wê çaxê, mirov dikarê vê yekê jî werênê ser ziman ku wê ew tişt bi yekîtîya xwe re wê di nava xwe de wê xwediyê têkiliyên ku ew bi wê tiştê re ew hena û ankû ew tişt bi wan re di rewşa xwe ya ku ew bi wê heya de heya, wê hebe.

Rewşa fîzîkê a tiştê, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek ku mirov wê jî hertimî wê li gorî gûharîn û beşbûnên wê, ku wê fahm bike bê. Her tişt, wê bi gûharîna xwe re wê weke rewşa tiştekî din wê karibê bistênê. Lê wê cewherê wê, xwe biparêzê. Minaq, dema ku mirov kerengan ji çolê wan berhev dike û wan çê dike weke xwarinê, wê demê wê ew kerenga ku ew pêşî ji ardê hatî hildan, wê ji rewşa wê tişt li holê wê nemênê. Wê li şûna wê, rewşek kerengê ku ew hatîya piç û piç kirin wê hebe. Kereng, hatîya hûrkirin û ew hatîya kirin, weke rewşek din de. Lê ew weke kerengê, yanî heman şînahîyê wê heta wê kêlîka ku mirov ew xwar, wê ew hebe. Piştre ku ew ket hinavên mirov de wê, ew dîsa bi rengekî din wê bigûharê. Wê ew vegûharê tiştekî din. Bi wê re wê kereng, wê li holê nemênê.

Rewşa fîzîkê ku ew çi rengê fîzîkê bê, wê weke ya kerengê bê. Ew, wê xwe bigûharênê. Çendî ku ew giran a û ankû hişka, ew wê weke rewşna ku wê bi demê re wê bigûharin bin. Gûharîna hişkayîyê, wê di rewşna wê bi ber nermehiyê de wê bibê. Her wusa ya giranîyê, wê bi ber ya sivikbûnê de wê bibê. Ev jî, wê weke xosletên tiştê a bi fîzîkîya wê re bê.

Li vir, em dema ku rewşa tiştê jî bi gûharînîya wê re dikin ku wê fahm bikin, rewşa ku wê bi wê re bi fahmkirina me re wê were dîtin, wê ew bê ku wê gûharîn, bi wê ya vajî xwe re wê bibê. Hişkbûn bi ber nermbûnê ve, giranî bi ber sivikbûnê ve, zaxmbûn bi razîbûnê re wê bi ber nezaxmbûnê ve wê biçê. Li vir, pêvajoyên gûharînê ên bi fîzîkîya tiştê re di xwezayîya xwe de wê bibîn.

Lê piştî ku aqilê mirov pêşket û hişmendî bi wê re afirî û pê de, wê êdî wê mirov jî wê bi aqil re wê bidest mudaheleyê li wê gûharînê fîzîkîyê bike. Wê bi kifşkirina darêjkên nû re wê rewşên nû wê bi fîzîkê re wê derxe li holê. Darek wê ji xwe re nebê weke kiştekê. Wê mirov, wê li rewşa kiştekê wê bihizirê û wê ew wê ji wê darê wê çê bike. Dar ji xwe re nabê masa. Ew wê, bi aqilê mirov re wê bibê. Ev wê, weke afirandinên aqilê mirov ê bi piretîkî û kirinî ên di jîyanê de bin. Di vê çerçoveyê de wê mirov pêwîstîyên xwe wê çê bike. Her wusa, li vir, dema ku mirov vê rewşa çêkerîya bi aqil ku mirov li wê dihizirê, her wusa têgîna jixwerebûnê û ya nejixwerebûnê, wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, di nav şert û mercên xwezayê de wê bêî mudahale û çêkirinan wê xweza wê jixwere wê di nava xwe de wê biafirênê. Bêî ku mirov destlêbide, wê biafirê. Wê bi reng

û awa bibê. Wê şeklê wê derkeve li holê. Pelek bi darê ve wê bi şeklê xwe re wê biafirê. Darek, wê bi rewşa xwe re wê ji xwe re wê ew biafirê. Dema ku wê avek di çokên avê de wê biherikê, wê di deverên nizm de wê rêya xwe çê bike û wê herê. Li vir, aqilek nîna ku ew wê rêya çoka avê bide kifşkirin. Lê hertimî wê bi ya berjêr ve wê weke rê hilbijêrê û wê bi wê ve wê rêya xwe çêkê û wê di wê re wê herê. Ev rewşên *jixwerebûnê*(*) ên xwezayî na. Her wusa, wê ev rewş, wê di nava şert û mercên xwezayê de wê bibin. Av dema ku ew di wê çoka avê de ew diharikê, wê ew ne hizirê û nebê xwediyê wê xwestekê ku ew li şûna ku bi berjêr ve diçê, ew bi berjor ve bi herikê û herê. Ya ku wê, weke têgînekê di temenê wê rewşa herîkîna bi berjêr a ava çokê de bê, wê rewşa kişînaardê bê. Wê hertimî biber ya ardê ve wê berê wê bidê. Hêza kişînaardê, wê li vir, wê weke hêzekê wê xwediyê wê kifşkariyê bê. Li vir, em dema ku wê rewşa jixwerebûna wê herîkîna ava çokê ku mirov li wê bihizirê, mirov wê rewşa kişînaardê, wê weke rewşek ku wê xwediyê kifşkirinekê bê. Li vir jî ew rewşa jixwerebûnê, wê weke rewşek jixwerebûyî a birewşa kişînaardê re wê hebe. Li vir, rewşa heyîna vê rewşê, wê weke rewşek ji xwe re dihê afirandin wê hebe. Lê rewşên bi aqilê mirov re ku mirov wan çê dike bi çêkerîya aqilî, wê herwusa, wê weke rewşek wê hebe. Ew jî, wê weke rewşek ku ew mirov wê bidest çê dike bê. Çêkirina taksîyekê, balafirekê, kiştekê, malekê, masayekê û hwd, wê weke çêkerîyên ku wê ew li ser aqil re wê bên pêşxistin bin. Ev jî, wê weke aliyekî giring ku wê rewşa afirandina aqilê mirov wê bidine dîyarkirin bin. Divê ku mirov wê jî li vir li ser wê bisekinê.

Mirov, piştî ku wê di jîyanê de biaqil bibê û bicih bibê, wê piştre di çerçoveya wê bicihbûn û cihgirtinê de wê, fêrî nêçîrkirinê, di malê de kedîkirina sawalan û xwedîkirina, çêkirina xwarinê di malê de ji ahlên malê re û hwd, wê pêşbikevê. Rewşa çêkirina xwarinê em dikarin li vir, weke minaqekê wê bidin. Xwarin, di roja me de jî wê, weke nîşanaka şariştanbûna mirov a di jîyane mirov de wê bê şîrovekirin. Lê xwarin, çêkirina wê, weke ku çawa ku wê porîtank ji qûrmekî wê derkeve, bi bûhûarandina peresendinê, wê bi heman rengî, wê rewşekê wê bide me. Di xwarinê de wê gelek tişt wê bênxistin nava hevdû û wê ji wan wê xwarin, were  çêkirin. Wê bi wê re wê hewl bêdayîn ku ew têj û tahma wan tiştên ku wan tevlîhevdû dikin, bi wê re têj û tahmek nû a wê xwarinê bidest bixin. Ev rewşa tevlîhevdûkirina tiştan û bi wê re ji wê derxistina tiştek din a nû, wê tiştekî din wê bênê berbîra me. Rewşa *sîmyayê* ku wê bi wê re wê bi şînahîyên xwezayê wê bi gihandina zanîna wan re û bi wê re ji wê hewldana derxistina darêjkên(formên) nû li holê, wê bê kirin. Ev rewş, wê

---------------

(*)Jixwerebûn wê weke têgîneka felsefikî ku wê lêbipirsê ku hêzek weke xwûdê heya kirinên me dide dîyarkirin û ankû ew ji xwe re di herikîna jîyanê de dibin. Wê di wê warê de wê li wê were hizirkirin ku kirinek bû wê piştre wê, çi wê bide dîyarkirin. Yan jî mirov bixwezê wê kirinê weke ku ew nebûyî bide nişandin. Wê ev weke aliyekê felsefeya pêwîstînî ku li wê dihizirê bê.

bi wê re wê temenê aqilekî bê. ew xwarina ku wê di encama çêkirinê de wê bi darekî ve şîn nebê. Wê di deverek ardê de wê ne herikê. Wê weke ku çêlekek şîr dide me, wê mast û panîr jî nedê me. Ev, wê afirendinên nû ên ji hevdû derxistinê ên bi aqil bin.

Rewşa fahmkirina çêkirina mast û panîr ji şîr, wê weke rewşek gûharandina fîzyolojikî a bi destê mirov jî bê. Her wusa, wê ew rewş, wê rastiyekê wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Ew jî, ew a ku wê ji şîr mast û panîr wê bê derhanîn, weke ku çawa ku wê mirov ji sawalên weke çêlekê wê bi dohtinê û hwd, wê şîrê wê ji wê hilde. Ev rewşên kirinî ên ku em divê ku wan weke rewşna bi pêşketina aqilê xwe yê kirinî re ku em dikarin wan werênina ser ziman, wê di derbarê aqilê kirinî û pêşketina wê de wê zanîneka baş wê bide me.

Wê bi wê rengê wê hin bi hin wê biaqilê xwe re kirinî re wê kifşkirinên nû wê bike.Herwusa, wê pêşnûma û ankû dîzaynek wan di mejiyê xwe de wê çêbike û wê li ser wê re wê bidest pêşxistina wê fîzîkîya wê bike, weke ku çawa ku wê berî wê mirov wê li fîzîkê bihizirê û wê ji wê xwe bigihênê zanîna wê. Rewşa ji zanînê bi ber çêkirina fîzîkê ve çûyîn, wê rastîyeka aqilê kirinî ê di jîyanê de bê. Ev jî, wê di jîyanê de wê bi têgîna kifşkirina pêdîvî û pêwîstîyên jîyanî re wê bê kirin. Miirov, wê wan çêkirina çê bike, û wê li ser wan re wê, jîyane xwe îdeme bike. Wê bi wan re wê jîyane xwe hesantir bike. Rewşa aqilê kirinî, wê her wusa, wê weke rewşek teybet a ku mirov divê ku wê ji gelek aliyan ve wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Rewşa fahmkirina çêkirina bi aqil, wê ji aliyekî ve wê, weke rewşa gihiştina wê sîyane çêkirina çerçoveyek darêjkî a bi aqilê re xwe û ew çêkirin bê. Delevekî ku wê sawal di wê de wê were êmdan, wê ji xwe re wê nebê. Wê weke çêkirineka ku wê encama aqilê me bê. Her wusa, wê çêrnek û çêrek wê, ji xwe re wê çênekê. Ew wê mirov, wê bihizirê bi çerçoveya wê re û wê çê bike. Mirov, di vê çerçoveyê de dema ku ew gihişt wê asta ku ew aqilê xwe bikar bênê bi vê rengê di jîyane xwe de wê, êdî wê weke ku wê ew bê xwediyê wê karîna çêkirinê. Li vir, têgîna çêkirinê û ankû afirandinê, mirov dikarê bi gotinekê jî bê li ser wê bihizirê. Mirov, wê hertimî wê di destpka pêşketina aqilê xwe de wê afirandinê wê baxşî ´yazdan´ê xwe yê ku ew bi wî/wê bawer dike wê bike. `Yê afrîner û ku ew dide jî wê yazdan bê´. Mirov wê, piştre wê hin bi hin wê qaramên xwe wê bide berxwe. Kurdên berê gotinaka wan ya teybet hebû. Wan li ser navê ´xwûdê´ wê ji mirovan re wê bigotan ku ´kirin ji, dayîn jî ji min.` Yanî, wê weke ku wê xwûdê ev gotin ji mirov re wê bigota. Yan jî, wê bi rengekî din jî wê biheta gotin. Wê bigotan ku ´wê dema ku te qaramên xwe da ber xwe û kir, ez jî ezê li cem te bim.´ Yanî, wê li vir, kirinkirinê wê teşwîk bikin ji mirov re. Li ser wê re wê mirov jî wê bihizirê ku ew çi bike. Wê pêşî ji hewirdora xwe û male xwe ya ku wî ji xwe re avakirî wê dest pê bike. Wê ji wir, bidest kifşkirina çêkirinê bike. Mirov, wê wê di wê de wê li ser tiştên male xwe wê bihizirê û wê wan çê bike. Mirovê mêr, wê sawalan kedî bike û wan bê çolê biçêrênê. Mirova jin, wê li mal bê, wê xwarinê çê bike

û wê naqş bike. Wê gelek karên din wê bikin. Ev hemû wê bi aqilê xwe re wê bikin.

Lê li vir, di temenê wê çêkerîyê de wê aqilê mirov ê bi fêr û ezmûn wê hebe. Wê jinek wê pelek darê wê naqş bike. Pel di jîyanê de wê hebe. Wê nirgizekê wê naqş bike. Nergiz(*) jî heya. Lê hinek tiştên ku wê çerçoveya wan çêbike û bi çêkerî ku wê çê bike,ew dibê ku ew di jîyanê de ew tûna na. Minaq, weke tefsîra şahmaran û hwd. Lê ev di mejî de ew hatîya hizirkirin. Ya ku wê êdî wê di temenê wê de wê hebe, wê ew hizirkirina di mejî de bê.

Rewşa çêkerîya bi aqil, wê li vir, wê weke aliyekî ku mirov wê li ser karîna hizirkirina xwe re wê werênê ser ziman bê. Karîna hizirkirinê jî wê bi hişbûna di derbarê xwezayê û hwd re wê destpê bike. Wê ew bi wê re wê hebe. Wê weke pêşîya pêşî a kevnera a aqilê me, wê destpêka bi hizirkirina li xwezayê wê hebe.

Li vir, em dema ku bahse aqilê xwe û hizirkirina xwe weke mirov bikin, divê ku mirov li vir, di serî de bahse girtina xêvê bike weke temen. Wê li ser wê re ew hizirkirin wê bibê. Mirov, dema ku bidest girtina di mejîyê xwe de kir û pê de wê, wê ew zanîna ku ew girtî, wê li ser wê re wê bihizirê. Xêv, wê temenekî hizirkirinê wê biafirênê. Zanînên derkkirî ên xêvî, wê her wusa, wê temenê çêkirina aqilekî kirinî ê bi çerçoveyî jî wê bi xwe re wê biafirênê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku gotina ´aqil´ ji kurdî ya û li vir, çendî ku em dikarin wê weke navê aqil werênina ser ziman, ji aliyekî ve wê karibê wê têgînê bi xwe re wê bide me ku wê bahse wê aqilê kirinî ê bi sîyane afirandinê ê weke aqilê kirinî jî wê bi xwe re wê bike. Li vir, divê ku mirov di serî de bo fahmkirinaka rast gotinan di rastîya wan de û di cihê wan de fahm bike. Hiş, ya ku mirov dikeve farqê de weke zanînê ya. ´Bîr´, wê weke têgîneka ku ew teqebûlî xêvê dike wê bi xwe re wê werênê ser ziman û wê bahse zanîneka ku ew heya û mirov dike ku wê bênê bîra xwe, wê bi xwe re wê bi wate dike. Weke ku çawa ku wê di temenê gotina hişkirinê re wê bi derkkirinê re wê dîtînya derxe wê hebe, wê bi heman rengî wê tişta ku ew hatî hişkirin û ankû weke zanînekê ew heya, wê di temenê gotina bîrê´ de wê hebe. Zanîn, ji xwe re wê weke navê wê hişê ku ew ji wê rewşa fîzîkî ew hatîya derhanîn bê. Her wusa, wê bi wê re wê zanîn, weke navê wê hizirkirina me bê. Bi gotina zanînên re wê ew hizirkirina me, wê weke ku ew wê di çerçoveyek serbixwe weke zanînekê de wê ew were hildan li dest bê.

Rastîya gotinan, wê bi xwe re wê weke rastîyek têgînî a ku mirov wê divê ku wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Gotin wê bi wateyê re wê weke ardnîgarîya aqilê kirinî bê. Wê li ser wê re wê xwediyê wê têgîna afirandinê bê. Aqilê kirinî, wê weke aqilekî ku wê bi vê rengê wê weke ku ew di rewşên xwe yên pêşî de ew ne mihtacê rewşa fîzîkî ya wê dîtinekê wê bide dîyarkirin. Lê ev dîtîn, wê

-----------

(*)Nêrgiz wê gûleka ku ew li kurdistanê li çiyayan ji xwe re çêdibê bê.

weke dîtineka xapandinî bê. Divê ku mirov vê yekê bi wê re di serî de wê fahm bike ku wê weke ku wê bi serdemek aqilê felsefeyê xwezayê re wê ji rewşa fîzîkê wê bidest hizirkirinê û fahmkirinê wê bê pêşxistin, wê di vê rewşê de jî wê ji wê têgîna ku ew têgîna fîzîkê weke têgîneka kirdeyek vêşarî a navaroka wê ya û ew ji wê navikê weke ku dide dîyarkirin, wê xwediyê rewşek metafîzîkî a bi xwe re bê.

Aqil, weke rewşeka ku mirov wê dema ku wê bi teneserê xwe wê hildina li dest, wê bi afrînerîyekê wê xwe bide dîyarkirin bê. Li vir, aqilê kirinî, wê her wusa, wê weke aqilê darazî ê bi hiş ku ew wê biafirênê bê.

Aqilê kirinî, wê weke kirdeyek wê ya navarokî a vêşarî wê têgîna afirandinê wê hebe. Berê navê wê ´yazdan´ û ankû ´xwûdê´ bû. Piştre mirov, wê bidest afirandinê bike. Dema ku mirov bidest afirandinê kir û pê de, wê mirov bi wê afirandina xwe re wê nakokîyên mazin wê di serê wî de wê biafirin. Heta wê kêlîka ku ew dihizirî ku ´xwûdê, tenê dikarê biafirênê´ û ku ew ji wê kêlîkê û pê de dibînê ku ew jî diafirênê wê, weke ku ew xwe di kirasê xwûdê de wê bibînê. Piştre jî wê, gotinên weke ´xwe kirina cihê xwûde´ de wê bi aqilê mirov re wê rû bidin. Ya ku wê mirov, bi aqilê wî re wê hin bi hin wê li ser têgîna xwûdê re wê mirov wê bike nava pêşbazîyekê de wê ev bê. Rewşa hanîna wê tişta ku mirov wê afirand jî wê, weke mijareka ku wê divê ku ew ji wê re vegotinekê bi navê afrîner ji wê re werênê. Di vê çerçoveyê de wê êdî ´xwûdê, da´, ´yê afrîner ew a´, ´yê ji nebûnê hebûn dike wê ew bê´ û hwd, wê bi vê rengê wê were hanîn li ser ziman. Ev gotinên ku wê bi navê *xwûdê* wê werina hanîn li ser ziman, di aslê xwe de wê weke gotinna ku wê ji aliyekî ve wê teqebûlî nûqteyên xesas ên bi hizirkirina aqilê mirov re wê bikin bin û wê bi xwe re wê temenê mayîndayîya wê têgîna afirandinê a di aqilê mirov de jî wê ji aliyekî ve wê bi xwe re wê biafirênin bi mirov û aqilê mirov re jî.

Aqilê kirinî, wê dema ku mirov afirandinek çêkirin bi wê û ku wê fîzîka wê li jîyanê nebê, wê ew weke afirandina wê ya ji nebûnê a hebûnê wê xwe bide dîyarkirin. Ev rewşa bi aqilê kirinî re jî li vir wê, di çerçoveya hebûn û nebûna rewşa fîzîkî û bi pêşxistina rewşa zêhnî re wê, li vir divê ku mirov wê hinekî jî di dewama mijarê de wê werênê ser ziman û li ser wê bihizirê. Rewşa afirandina bizêhnî, wê weke rewşek zêhnî a biaqilî bê.

Aqil ku mirov ji kîjan aliyê ve li pêşketina wê bihizirê, wê xwediyê temenekî xêvî ê jîyanî û mejîyî bê. Her wusa, rewşa afirandinê, wê weke têgîneka ku wê mirov, wê hem wê di jîyane xwe de wê kifşbike û bike û hem jî wê di derbarê wê de wê hertimî xwediyê mereqna ku ew têgîna afirandinê çawa bûya û çawa ew hebûna ku ew diafirênê wê diafirênê. Ev rewş, wê weke rewşna ku wê mirov wê di destpêkê de wê nikaribê bi aqilê xwe re wê bersivekê bidiyê de. Bo vê yekê, wê bi şêwayekî afsûn û zanîn wê tevlîhevdû bibê û wê bi wê re wê were hanîn li ser ziman. Mijarên ku ew biheyînî hena û mirov dikarê wan werênê ser ziman ên weke tiştên fîzîkî û hwd ên jîyanî û xwezayî, wê ji wan re wê vegotinê

werênê. Lê di destpêka wan de wê çawa ew hebin, ankû ew çawa bûna, wê weke pirsna ku wê hê jî wê weke bêbersiv wê bimênin bin.

Têgîna dûalîsmê, wê weke têgîneka felsefîkî a serdest, wê xwe li jîyanê wê bide dîyarkirin bi aqilê mirov re. Di aslê xwe de wê dema ku aqilê mirov ew afirî û pêşket û pê de wê, weke aliyekî wê dûalîteyê wê bide dîyarkirin. Rewşa fîzîk û zêhn, laş û gîyanê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê bi wê têgîna dûalîteyê wê hebe û wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa têgîna dûalîteyê, li vir divê ku mirov wê bi teybetî weke mijarekê wê hilde li dest. Wê bi demê re wê rewşa fîzîk û zêhn, laş û gîyanê, wê bi aqil re wê werina kifşkirin. Mirov, di dema ku wê li jîyanê binerê, mirov wê heyînek fîzîkî a bi tiştayî wê bibînê. Lê bi wê re jî wê hebûna xwe ya zindiyê bi laş û têgîna gîyanê re wê li wê bihizirê. Çendî ku wê gîyan, wê piştre wê weke têgîneka ku ew bi aqil hebe, wê were şîrovekirin û hanîn li ser ziman jî lê wê, di çerçoveya hevyekîyekê de wê bi laş re wê gîyan wê bi têgînek dûalîteyî wê were hanîn li ser ziman. Weke heyîneka ku weke ya laş ku ew jî dervî aqil û zanîna me wê hebe gîyan, wê li vir, wê weke ku wê zerdeşt jî wê werênê ser ziman wê aqil, weke têgîneka ku ew bi pêşketina jîyanê re ew bûya û heya wê were şîrovekirin û hanîn li ser ziman.

Têgîna aqil, wê li vir, wê dervî wê dûalîteya laş û gîyanê wê were hanîn li ser ziman. Her wusa, wê weke têgînek sêyem wê aqil were hanîn li ser ziman. Êdî dema ku wê rewş ev bê, wê hingî wê aqil, wê ew jî bidest kifşkirna dûalîteya xwe bike di jîyanê de ew jî wê fîzîk bê. Her wusa fîzîk û zêhn, wê di vê çerçoveyê de wê li rex têgîna gîyan û laşê wê hebe û wê xwe bide dîyarkirin bê. Rewşa aqil wê li vir, wê weke rewşeka ku wê bi fahmkirinê re wê xwe bide dîyarkirin bê. Bi wê re wê heyîna fîzîkî wê fahm bike. Şert û mercên wê, ew wê bike ku wan fahm bike. Dervî wê jî wê laş fahm bike û dervî laş wê hebûna gîyanê wê bike ku wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de wê bi çerçoveyekê wê aqil xwe bi fahmkirina xwe re wê bide dîyarkirin. Rewşa têgîna gîyanê, weke ya ´kifşkar´ a li ser laş û aqil re jî wê bê hanîn li ser ziman. Her wusa, nîşanaka wê jî wê, ew bê ku wê bê bawerkirin ku wê dema ku laş mir, wê gîyan nemirê. Wê ew dema ku laş mir, wê gîyan ji wê cuda bibê. Wê jîyane xwe bide domandin. Di vê çerçoveyê de wê kifşkirina aqil jî wê di temenê wê de wê ew nemirîtîya gîyanî wê were bicihkirin. Her wusa, li vir ya ku gîyan nemir dike aqil a û ankû vajî wê, ya ku aqil nemir dike gîyan a, wê li ser wê re wê aqil werina meşandin. Kîjan kîjanê nemir dike? Ev jî, wê weke aliyekî din ê lêpirsînî bê di mejîyê mirov de. Bi wê re wê di dewama wê de wê aqil, wê weke heyîna fahmkirinê wê heta ku ew laş bijî, wê bi wê û gîyanê re wê bijî. Piştre jî, wê dema ku laş mir, wê ew xwe bi gîyanê re wê bide domandin. Têgîna *gîyane biaqil,* (*) wê di

-------------

(*)Zerdeşt wê di dema xwe de wê li gîyan û laş wê bihizirê û wê aqil weke aliyekê sêyem wê werenê ser ziman. Lê wê aqil piştî mirina laş wê çi jê were wê li ser wê pirr bihizirê. Gotina gîyane bi aqil wê, ji wê were ku rew dihizirê ku wê dema ku mirov mir û aqil bi mirov re ma wê, gîyane me bi aqil wê weke hebûna me wê bijî.

vê çerçoveyê de wê weke têgîneka biaqil a serdest wê xwe bide dîyarkirin û hanîn li ser ziman. Rewşa têgîna gîyane nemir, wê li vir, wê di temenê hizirkirina mirov a jîyanî de jî bê.

Di serdemên zanîna nû de wê, li vir, wê weke ku wê têgîna gîyan û laş wê were danîn li aliyekî û wê li ser aqil re wê şîrove li ser zêhn û fîzîkê re wê werina pêşxistin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê hewldana fahmkirina fîzîkê û zêhn a bi hevdû re wê çawa bê, wê ew weke mijarekê wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa li vir, di têgîneka hevyekî de wê weke ku wê aqilek wê bike ku ew xwe serdestî mirov bike ku mirov wê têgîna zêhnî û fîzîkî bi wê re wê hilde li dest. Lê li vir, ku em zêhn û fîzîkê di hevyekîyekê de wê hildina li dest û wê di hevyekîyekê de wê werênina ser ziman, wê çaxê, divê ku em vê yekê jî herê bikin ku wê aqilê me yê zêhnî ku em wê fahm dikin, em ne fahmkirin û têgîna wê ya hemûyî de bin. Ber ku fîzîka ku em wê dikin ku wê fahm bikin, wê bi hemû hûrgil û rewşên xwe re wê weke rewşek fîzîkî wê hebe. Dîtineka serrû a li wê, wê tenê rûyê wê fîzîkê ê ku ew tê dîtin, wê bide bidîtinkirin. Bi wê re jî, navaroka wê, hûrgilên wê û beşên wê yên din û hwd, wê di wê kêlîkê de wê ew newê dîtin. Di vê çerçoveyê de wê dema ku em rewşa fîzîkê û ya zêhnê, weke rewşek hevyekî wê werênina ser ziman, em divê ku wê zêhn û aqilê aqilê me yê ji wê fîzîkê jî weke aqilekî ku ew tam jî bê, ew bi tamemî nayê zanîn bê ji aliyê hişmendîya me bixwe ve. Wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê.

Li vir, li ser rewşa fîzîkê û têgîna hevyekîyekê re ku mirov dike ku wê rewşa zêhnî wê hilde li dest, wê ev li vir, wê weke rewşna teybet wê xwe bidina dîyarkirin. Bi wê re em, hedê farz bikin ku zêhn û fîzîk hevyek in. Wê zanîna zêhnê jî wê bi hebûna fîzîkê re wê di hevyekîyekê de bê. Wê tam bê. Lê dema ku em wê zêhnê dizanîn, em dikarin bi wê re werênina ser ziman ku em wê rewşa fîzîkî bi hemû aliyên wê re ku ew heya, em bi zêhn û hişê xwe re di farq û zanîna wê de na? Ev rewş, wê her wusa, wê li vir vê pirsê jî wê bi xwe re wê bênê ser ziman. Li vir, rewşa fahmkirinê a li ser fîzîkê a bi zêhnê re wê çaxê mirov wê bi awayekî xwezayî wê bike berlêpirsînê de.

Tamîtîya bi fahmkirina zêhnê re ku ew hebe, wê çaxê, wê demê divê ku ew bi wê re di derbarê fîzîkê de wê pirsgirêka fahmkirinê xwe nedê dîyarkirin. Lê ew tişta ku me ew fahmkir weke fîzîkê û ankû weke rewşek fîzîkî, wê ew bi tememî were zanîn? Li vir, di vê çerçoveya fahmkirina zêhnê û a bi rewşa fîzîkê re wê demê zêhn weke zanîna wê ya tam, tekûz û nekêm wê bi hebûna xwe re wê hebe. Li gorî vê rewşa fahmkirina bi fîzîkê û ya zêhnê re ku em wê bi têgînek hevyekî re wê hildina li dest wê, ew xwediyê tamîyekê bê. Wê çaxê, em bi fahmkirina xwe re wê zêhnê, bi tememîya wê re bikin ku wê fahm bikin. Li vir, ev jî, wê ji aliyekî ve wê xwe bide dîyarkirin ku wê ew pirsgirêka fahmkirinê û ankû fahmbûnê,wê ne weke pirsgirêkek derkkirina zêhnî û ya tememîya wê bê.Wê weke pirsgirêka fahmkirina wê ya temamî û tamîya zêhnê

bixwe jî, wê bê weke ya rewşa fîzîkê. Li vir, ji vê têgîhiştinê, ya ku wê were fahmkirin, wê ew bê ku wê di nava wê fahmkirina me de wê zêhn wê weke têgîneka tam û tekûz wê bi heyîna xwe re wê hebe. Li vir, dîsa pirsek xwe dide li rû. Ew jî, ew a ku wê bi rastî wê ew rewşa zêhnî wê karibê bi tamî û tekûzî ya fîzîkê bi hebûna xwe re wê werênê ser ziman? Ev ya weke nerîne ku mirov ji aliyê fîzîkê ve binerê bê.  Lê dema ku mirov ji aliyê zêhnê ve binerê, wê zêhn, weke heyînek serbixwe, wê ev pirsgirêka wê ya hevyekî a bi wê rewşa fîzîkî re wê nebê. Kengî wê zêhnê, xwe kirinî piretîkê û piretîka xwe bi rewşa xwe ya fîzîkî re afirand, wê hingî ew hevîyekî, wê were li wê lêgerîn. Dîsa wê heman pirs ji aliyê zêhnê û afirandina wê ya rewşa fîzîkî ku ew dibê de jî wê xwe bide dîyarkirin.  Ber ku ew hingî wê bi dûalîteyekê, wê xwe bide dîyarkirin û wê bi wê ew wê di çerçoveya têgîna hevyekîyê de wê ew lêgerîna wekehevî wê were lêgerîn. Ew fahmkirina me û ankû qapasîteya fahmkirina me, wê karibê wê rewşa zêhnî bi tamî û tekûzîya wê re hilda nava xwe û wê derxê têgihiştinê û rava bike? Qapasîteya mirov, ê bi asta mirov re wê bi sînor bê. Wê êdî wê çaxê wê pirsgirêk, wê bi vê rengê wê xwe li ser fahmkirinê re wê bide dîyarkirin. Yanî, wê li vir, wê heyîna zêhnê weke heyînek heyî a şenber a têgînî wê hebe. Ya ku ew tê fahmkirin jî ew a.

Têgînên zêhnî, wê weke rewşna derkî ên ji rewşa fîzîkî bin. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê weke kirdeyekê wê *zêhna fîzîkî* jî wê ew têgîna fîzîkî a bi rewşa wê re wê hebe. Wê xwe bi wê re wê weke têgînekê wê zêhn, bi çerçoveyî wê werênê ser ziman û bide dîyarkirin. Rewşa fahmkirina rewşa zêhnê û ya rewşa fîzîkê li vir wê, bi vê rengê fahmkirinê û  li ser têgîna fahmkirinê re wê weke têgîna laş û gîyanê, wê di dîmenekî û wêneyekê de wê xwe bide dîyarkirin û wê werênê ser ziman. Her wusa, li vir, mirov dikarê vê yekê jî bi wê re wê werênê ser ziman ku wê têgîna zêhnê û rewşa fîzîkî, wê bi heyînî wê hebin. Zêhn, weke ku mirov li vir, bi wê têgîna wê ya li ser fahmkirinê re ku mirov wê fahm dike, wê weke têgînek serbixwe jî wê karibê xwe bide dîyarkirin. Ber ku ew heya, ew êdî dikarê xwe bi vê rengê bide dîyarkirin.

Rewşa zêhnî, wê her wusa wê weke rewşek heyînî w hebe. rewşa zêhnê, li vir, di çerçoveya vê têgîna weke ku ew serbixwe ya û her wusa bi têgîna hevyekîyê de divê ku mirov wê bi teybet wê hilde li dest. Ev rewş, wê rewşeka ku wê weke kirdeyekê wê ew wê têgîna afirandinê û rewşa wê jî wê di xwe de wê bihawênê. Hewldana me ya fahmkirina vê rewşa zêhnê, wê her wusa wê di çerçoveya fahmkirina rewşa zêhnê a weke serbixwe û bi hevîyekîyeka bi fîzîkê re wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa fahmkirina zêhnê, li vir, ew li ser wê hişmendîya wê re wê ew weke rewşek ku ew hem zanîna xwe û hem jî ew fîzîka xwe bixwe bê, wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, Ev rewşa zêhnê, wê weke rewşek teybet bê.  Di aslê xwe de wê ev rewş bê ku wê di temenê hemû têgînên weke hebûna rewşa fîzîkî bi zanînê re wê bikin ku wê werênina ser ziman û wê weke ku ´fîzîk nîn a´ wê li ser wê re wê hizra xwe wê werênina ser ziman bê. Li vir,

divê ku mirov fîzîkê, bi du şêwayan wê werênê ser ziman. Şêwayê pêşî, wê weke ya bi dîtin, destlêdan, bi hacm û cism bê. Lê aliyê din ê duyam jî wê weke ku wê vajî vê aliyê wê newê dîtin, destlênewêdayîn, bêhacm û cism bê. Her wusa, weke minaqek rewşeka darekê û ankû mirov, wê weke heyîn û hebûna fîzîkî a ku mirov wê karibê destlêbide, bibînê bê. Wê bi hacm û cism jî bê. Lê dengek, ku ew ji devê me derdikeve, wê ew ne xwediyê wan rewşan bê. Em deng nabînin, nikaribin bi dest wê bigrin, destlêbixin bê. Wê ne bi hacm û cism bê. Her wusa, ev rewş, wê dema ku mirov heyîna rewşa zêhnê hilde li dest, wê li ser rewşa aqil kirinî piretîkî re wê zêdetirî rewşa dûyem a bi deng re ku me weke rewşek fîzîkî hanî ser ziman, wê zêdetirî biwate bê. Li vir, em dema ku vê rewşê fahm bikin, divê ku em bi wê re her wusa ji aliyekî ve di mejiya mejiyê xwe de wê hin bi hin li wê bihizirin ku wê çawa ji pêvajoya rewşa fîzîkî a bêcism hacm wê bi ber ya rewşa fîzîka bi hacm û cism ve wê çûyîn bibê, mirov divê ku wê jî li wir bi wê re serî li ser wê biwastênê. Ev jî, wê ji aliyekî din ve wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa zêhnê, wê di aslê xwe de wê hinekî ji vê rewşê tevlîhevtir bê. Her wusa, rewşa fahmkirina xwestek, ajo, hêst, hêskirin, hazgirtin û hwd jî wê li vir, wê xwe weke aliyna ku mirov divê ku wan bike ku wê fahm bike. Li vir, Zerdeşt, dema ku ew ji aliyê **Key** Wistaspa(*) dil tê girtin, ew di xwe de wê êşê dijî lê ew nayênê ser ziman. Lê ew êşa xwe, di wê dema ku ew di zindanê de ya, ew hîs dike û wê ji dil dijî. Ew êş, wê weke êşeka ku wê laşê mirov wê pirr zêde ew wê hîs bike û bijî bê. Mejî, bi teybetî, wê di wê demê de wê di nava rewwşek afirandinê de bê. Wê ew bi wê afirandinê re wê xwe di laş de wê bide dîyarkirin. Her wusa, wê mirov carna ji wê êşa ku ew dikişênê wê bike nalanal. Lê ew nalanal wê, weke heyînê wê hebe. Mirov, dikarê wê nalanalê red bike? Na, mirov nikarê wê red bike. Li vir, wê di temenê wê de wê rewşna ku wê di nava wê rewşa mirov a jîyanî de ku wê vajî levkirina heyîna mirov wê xwe bide nîşandin wê hebe. Êş, wê hinekî jî wê ji wê, ew wê hebe. Rewşa êşê, hêskirinê û hwd, wê li vir, wê weke rewşna teybet ên ku mirov dikarê li wan bihizirê bê. Êş, hêskirin û hwd, wê weke rewşna hêstî bin. Ev jî wê xwe li ser xwestekê re wê bidina dîyarkirin. Hêst, çendî ku mirov wê weke rewşek ku mirov carna di jîyankirina wê de wê weke ku wê, ne bihizir bê û ankû wê dervî hizir bê, lê di rastîyê de wê rewşên aqilî ên weke xwestekê wê di temenê wê de wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê hêskirin jî wê wusa bê. Hêskirin jî, wê bi mêylî wê ew rewş bi mirov re wê hebe. Rewşa wê, di temenê wê de wê heyîna mirov a jîyanî wê hebe. Ev rewşên weke êş, hêskirin, hazgirtin û hwd, wê rewşna ku wê bi hebûna mirov a jîyanî ve wê girêdayî bin.

Rewşa zêhnê, dema ku mirov li wê dihizirê, wê ew xwe weke têgîneka ku ew di xwe de bi kirdeyî û xwediyê wê rewşa xwe ya darêjkî û pêşnûmayîyî jî bê.

-------------

(*)Key wistaspa wê weke keyekê dema Zerdeşt bê. Wî zerdeşt tê gotin ku zindakiriya û piûştre li ser başkirina haspê wî lê hatiya rahmê û ew berdaya.

Ya ku di aslê xwe de wê weke têgînek serbixwe ku wê bide dîyarkirin jî wê ev bê. Rewşa têgîna zêhnê, her wusa, wê bi wê re wê hertiştî wê weke bidarêjkî û pêşnûmeyîyî wê bihizirê bê. Li vir, rewş û pirsgirêka fahmkirina têgîna rewşa fîzîkê, wê bi wê li ser wê rewşa wê ya têgînî re wê bide dîyarkirin. Lê li vir, giringîya rewşa zêhnê ew a ku ew bi zanîna wê re ku wê ew karibê were bi darêjkkirin bê. Li vir, rewşa zêhnê a afrîner jî wê, hinekî jî ev bi wê re wê hebe.

Zêhn, wê weke aqilê mirov ê ku mirov ew hizirîya û ankû bi wê dihizirê wê bê. Mirov li tiştekî dihizirê. Li rewşekê dihizirê. Çerçoveya rewşê û ankû tiştê bi zêhnî di mejiyê mirov de ku ew nîn a. Wê li hûrgilên wê bihizirê. Wê têkiliya hûrgilên wê a bi hevdû re wê bihizirê û bitêgihiştin û hiş bike. Mirov, wê çerçoveyê bi zêhnî di mejî de wê çê bike. Wê li ser wê re wê rewşa rewşê wê bi xwe re wê di mejiyê xwe de wê çê bike û kifş bike. Ew rewşa rewşê, wê weke rewşek teybet a ku mirov wê karibê baş fahm bike bê. Rewşa rewşê, wê her wusa, wê weke têgîna pêşnûmeya rewşê jî bê. Lê li vir, em vê yekê bibêjin ku li ser têgîna zêhnê re ku mirov dihizirê, wê weke ku ew têgîna me ya zêhnî ku ew ji rewş ya, piştî ku ew bûya û pê de, têkiliya wê bi rewşê nebê, wê dîmenek bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, hinekî divê ku mirov li ser wê jî bisekinê. Ev rengê dîtinê ê bi hizir û ankû bi zanînê, wê bê temenê wê, ku wê gelek mirovên ku wê li ser rewşa hizir û rewşa fîzîkê bi hevdû re wê bihizirin, heta ku wê ew di mejiyê xwe de wê kifş bikin ku wê ´têkiliya rewşa fîzîkî ya zêhnî wê bi hevdû re nebê.´ Em li vir, divê ku vê rewşê bi awayekî baş wê divê ku li vir wê, hildina li dest û wê bikin ku wê fahm bikin. Rewşa têgîna zêhnî û rewşa fîzîkê, em dema ku bi têgîneka dûalîtîkî wê hildina li dest, wê bi awayekî di rewş û têgîna hevyekîyekê de wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî, wê, wan weke hevdû lê her yekê bi serê xwe ku ew were hildan li dest, wê di rewşekê de wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov, ku dihizirê, bi awayekî xweza wê li ser têgîna zêhnê re wê hizra serbixwe a zêhnê wê xwe bide dîyarkirin.

Li vir, rewşa zêhnê, dema ku mirov wê hilde li dest, ew têkilî û hûrgilên wê giring in ku mirov wan bi awayekî baş hilde li dest. Her wusa rewşa têkiliya wan ya bi hevdû re û ew ahenge di nava wan ya di çerçoveya wê zêhnê û ankû pêşnûmeya darêjkê de wê, giring bê. Li vir, em li vir, divê ku em vê yekê werênina ser ziman ku wê rewşek zêhnî a *pêşkifşkirî* wê nebê. Bo vê yekê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, ku mirov rewşa zêhnê çawa bihizirê û wê têkiliya wê bi çi hûrgil û têkiliyan a bi hevdû re dênê, wê bi awayekî xweza, wê rewşek darêjkî wê bi xwe re wê bide nîşandin. Di vê çerçoveyê de di şêwayekê hanîna li ser ziman de wê, kêmbûn û ankû têrne hanîna li ser ziman,wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek dîyarkirî wê nebê. Em dema ku vê bi vê rengê(rengê ku ew divê ku ew li gorî rewşek fîzîkî bê) werênina ser ziman, emê bi awayekî xwezayî ji aliyekî ve bikevina wê rewşa pêwîstînî (deternimismê(*))

------------

(*)Wê determinism wê rengekê hizirkirinê bê û wê bêjê ku ti kirinên me ne azad dibin, Wê ji aliyekê hêzekê ve bên dest nîşandin û kifşkirin. Azadiya teqez tûna ya. Wê bi wê bawerbikê.

de. Li vir, em vê yekê, werênina ser ziman, her rewşa salixkirî, wê karibê, rewşekê bi xwe re wê werênê ser ziman. Ev ku ew bi şîrove bê û ankû bi dahûrkirinê bê. Ev wê, bi wê re wê xwe bide dîyarkirin.

Rewşa têgîna zêhnê, ji aliyekî ve wê di vê çerçoveyê de wê weke rewwşek serbest bê. Yanî, wê bi serê xwe û di çerçoveya heyîna xwe ya rewşî de wê weke ku wê xwediyê rewşekê bê. Rewşa zêhnê wê weke zanînê wê bi darêjkî wê hebe. Ew pêşnûma û ankû darêjka wê ya ku ew bi wê re weke zêhn ku ew heya, wê ew wê çeçroveya wê ya zêhnî bê. Her wusa, wê bi wê re wê rastîya wê werênê ser ziman. Bêgûman, em dema ku li navaroka wê rewşa zêhnê bihizirin, weke rewşêne weke xwestek, mêyl û hwd, mirov wê hinek rewşên din jî wê kifş bike. Ew jî, wê weke aliyna din ên têgînî ên ku mirov wan ji aliyê wan ve wan hilde li dest bê. Lê li vir, di serî de mijara me, wê weke rewşa têgîna zêhnê ku mirov wê çawa dikarê bi têkiliyekê wê werênê ser ziman, ev jî wê weke aliyekî din ê ku em li vir pêşî bi serekeyî ku wê bikin ku fahm bikin bê. Rewşa têgîna zêhnê, li vir, weke aqil, bi hişbûna di derbarê xwe de re wê weke zanîneka ku ew di nava xwe de weke kirdeyek vêşarî wê têgîna xwe ya xwe ya rewşa fîzîkî jî wê di xwe de wê bihawênê û wê bide dîyarkirin bê.

Em li vir, divê ku wê rewşa têgîna zêhnê û rewşa têkiliya wê ya bi rewşa fîzîkê re weke têgînekê, divê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike. Em li vir, wê rewşa wê ya ku ew zêhn, weke têginek serbixwe ku ew xwe bi me dide hîskirin, ew têgîn û ew hîs, li vir, divê ku mirov hinekî li ser rastîya wê bihizirê. Ev, wê rastîyeka zanîna me ya bi aqil, ku wê ji aliyekî ve wê ji temen ve wê bide fahm kirin bê.

Li vir, rewşa zêhnê, di vê çerçoveyê de mirov divê ku hinekî li ser wê bisekinê. Her wusa, heta roja me, hertimî, mirov dema ku dikê ku wê rewşa zêhnî bi aqilî fahm bike, wê serî li têkiliya wê ya bi rewşa fîzîkî wê bide. Li vir, em di serî de divê ku vê yekê werênina ser ziman, em dema ku giştîya pêşketîya aqilê me bi zanîna me re ku em hildina li dest, emê nikaribin fêrbûn û ezmûnên bi demê re ku wê ew di mejiyê me de wê pêşbikevin, wan înkar bikin. Li vir, ji aliyekî ve wê weke ku wê ezmûn weke rewşek cerbî wê hebe û wê xwe bide dîyarkirin bi rewşa pêşketina aqilê mirov re.

Gelek rewşên ku mirov wan bi aqilê xwe te wan piştrast dike, wê bi dîtin û ankû wê salixkirin û ankû weke ku heta roja me di nava kurdan de ew dihê hanîn li ser ziman, ji mirov û ankû deverek bi êmin û ewla ku mirov xwe bigihênê zanîna ku mirov bi wê bi bawer bê. Di vê çerçoveyê de wê ew rewş wê were pêşxistin. Piştrastkirin, wê ji aliyekî wê weke rewşek aqilî a bi ezmûnî û ankû cerbî bê. Ev jî wê, bi bi jîyankirin, dîtin û ankû fêrbûna me re wê bi ezmûnî wê pêşbikeve bê. Di encama wê de mirov wê bigihijê zanîneka ku mirov ji wê bi bawer a û wê dikarê bi wê bawer bike bê. Bawerî, wê li ser ya ku mirov wê bi vîna xwe re wê herê dike re wê xwe weke têgîneka nirxî wê bide nîşandin.

Rewşa gihiştina aqil, wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, ji bilî sehên me ên weke çav, gûh, ziman û hwd, wê hîsên me jî wê li vir, wê weke ku wê rêyeka ku wê ew mirov karibê xwe bi wê re wê bigihênê zanînê bê. Li vir, bi teybetî dema ku rewş bi aqilê kirinî re were hanîn li ser ziman bê, wê çaxê, li vir, mirov dikarê hîsan û ankû hîskirinan wan hilde li dest.

Zanîn, wê weke rewşeka ku wê ew bi çerçoveyeka ku wê di wê de wê xwestek, seh, vîn û hwd, wê hebê, wê bi wê re wê zanînê wê biafirênê. Li vir, di aslê xwe de mirov dema ku zanînekê kifş dike û ankû bidest dixe, ew zanîn, wê di destpêkê de wê ne weke zanîneka ku mirov ew herê kirîya bê. Zanîn, herêkirina wê, wê bi levkirina wê ya li ser ahengeka ku wê bi me wê bixwe re çê bike re wê ew bibê. Di vê çerçoveyê de wê ew êdî wê xwe bide çêkirin.

Zanîn, piştî ku ew bû û bihişbû û pê de, wê êdî ew hebe. Her wusa, li vir zanîn, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşên keseyetî ên weke xwestek, mêyl, vîn û hwd bê di nava xwe de. Wê ji aliyekî ve her zanîna ku ew hat bidest xistin, wê vê rewş di wê de wê hebin. Bo vê yekê, mirov dikarê zanînê bi keseyetîyê re wê werênê ser ziman. Lê bi wê re têgihên zanînî ên ku ew dibina malê gelek mirovan û gelek mirov wan êdî dizanin, wê ew jî wê di vê çerçoveyê de wê di çerçoveyek keseyetek ku ku ew giştîbûya de wê ew xwe bide dîyarkirin.Li vir, rewşa keseyet û zanînê, wê li vir, wê rewşa zanînê, wê di çerçoveya wan xosletan de wê bike ku ew were hildan li dest bê.

Rewşa zanîna zêhnî, wê bi wê re wê weke rewşek pêşketî a bi pêşnûna a li ser wê re wê hebe. Zanîna zêhnî, wê xwe weke ku em ji rengê hizirkirina Zerdeşt a avêstayî fahm dikin, wê weke têgîneka zanînî ku ew di xwe de bi şenberîyek têgînî a di rengê rewşa fîzîkî de ku wê xwe bide dîyarkirin re wê hebe. Wê bi wê re wê ew hebe. Zêhn, weke rewşek, darêjkek, pêşnûmeyek û çerçoveyek zêhnî wê hebe. Weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ser ziman wê zêhn, wê xwe bi xwe re ew heya re wê hebe. Rewşa zanîna zêhnê, wê weke rewşek ezmûnî bê. Salixkirina fîzîka wê, wê weke rewşek tevlîhev bê. Lê li vir, mirov dikarê vê yekê jî werênê ser ziman ku ew zanîna zêhnî ku me ew bidestxist, wê ew weke zanînekê wê hebe. Mirov nikarê wê înkar bike. Rewşa zanîna zêhnî, wê dema ku mirov wê bike ku wê hilde ji rewşa fîzîkê, ew dema ku mirov wê ji rewşa fîzîkê wê dihilde, wê bi rengê ku me hizirkirîya û ew hildaya wê ew hebe. bo vê yekê, ew zanîna zêhnî a ku me ew hildaya di mejî de wê dema ku em bikin ku wê di çerçoveya levkirineka bi rewşa fîzîkê re ku wê werênina ser ziman de wê ew levkirin bi wê re wê hertimî wê xwe nede dîyarkirin. Ev jî, wê were wê wateyê ku wê ew zanîna me ya zêhnî a ku me ew bidest xistîya, wê weke rewşek serbixwe wê xwediyê rewşek heyînî bê. Zanîna rewşa fîzîkê bi zêhnê wê re ku mirov ew derkkir û hilda û pê de wê, ew piştre wê weke rewşek zêhnî a serbixwe bê. Wê ew rewşa zêhnî ku ew rewşa fîzîkî piştre ku ew ji holê rabê jî wê ew hebe. Piştî ku ew(rewşa zêhnî) bûya, ew êdî wê hebe. Ew êdî wê weke

rewşek têgîhî a rewşa fîzîkî a bitêgînî wê hebe. Lê em vê yekê jî li vir, divê ku wê werênina ser ziman ku wê rewşa zêhnî, li vir, wê ew têgîna zanîna wê ya zêhnî, wê di xwe de wê weke zanîneka ku ew di xwe de xwediyê wê rewşa fîzîkî û ya zanînî bi hevdû re bê. Bo vê yekê, wê weke rewşek zêhnî a ku ew têrî xwe dike jî wê ew hebe.

Rewşa fahmkirina zanîna zêhnê, wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rengekî têgînî bê. Rewşa fahmkirina zanînê û ankû bidestxistina zanînê, wê xwe bi wê re wê weke rewwşek ku ew diafirê, wê bide dîyarkirin. Em dema ku li wê rewşa zanînê a bi rewşa fîzîkê re wê bihizirin û bi demê re ku em dibînin ku hertimî ew rewşa fîzîkî wê di rewşek gûharînîyê de bê û wê ti tişt wê bi demê re wê weke xwe nemênê ku mirov li wê dihizirê, her wusa, li vir, zanîna me ya ku me ew bidest xistîya, wê weke rewşa mayînda a li ser rewşa fîzîkê re wê xwe bide dîyarkirin. Lê bi wê re jî mirov, divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku wê ew zanîna zêhnî, wê bi demê re wê êdî wê ew ne xwediyê rewşek fîzîkî a ku mirov wê bi wê re di levkirineka ahengî de wê bike ku wê werênê ser ziman bê. Ber ku wê rewşa fîzîkî wê di asta pêşî de wê hem di pêvajoya gûharînê de û wê weke xwe nemênê. Di asta duyemin de jî wê bi demê re wê ji holê wê winda bibê û herê. Bi gotinaka din, wê tûna bibê. Di vê rewşê de wê wê di hundûrê têgîna demê û zamanê de wê zêhn, weke rewşek ku ew li ser rewşa fîzîkê a ku ew bûyî û pêkhatî re wê ew hebe. Di vê çerçoveyê de ew têgîna bûyînê û pêkhatinê a rewşa fîzîkî, wê di nava têgîna wê zanîna wê zêhnê de wê weke hîsekê û ankû derkek ku ew dihê zanîn wê hebe. Rewşa têgîna fîzîkî, wê bi vê rengê wê li ser wê zanîna zêhnê re wê weke têgîneka bi hîsê re wê weke ku wê hebe.

Rewşa fahmkirina rewşa zanîna zanîna zêhnê, wê weke şêwayekî aqil ê ku ew mirov nikaribê wê bidest bigirê û wê bibînê bê. Her wusa, wê ew bi têgînî wê hebe. Li vir, em dema ku bikin ku wê rewşa zanîna zêhnê fahm bikin, em divê ku em hinekî derkevina dervî xosletên zanîna rewşa fîzîkî a weke yên destlêdanê, dîtinê, bidestgirtinê û hwd. Li vir, wê rewşek teybet a ku ew tenê derkên hîsên me yên ku ew li ser sehên me re ku em bi wê rewşa zanîna zêhnî re ku em xwediyê wê na, wê bi wê re wê hebe. Ev jî, wê li vir, rewşa têgîna derkkirinê û ya hîskirinê, wê weke rewşek teybet a zanînê bê.

Zanîna me, wê bi hişkirina me re wê hebe. Her wusa, em tişta ku wê dibînin, em wê derk dikin. Yan jî, wê ew derka me ya ku me ew bi dîtinê re dît, wê di mejiyê me de wê bi aqilê me re wê temenê afirandinna teybet bê. Minaq, ez mirov dibînin ku ew li ardê heya, dimeşê, diaxifê û cilan li xwe dike. Bi wê re ez tayrekî li azmana dibînim ku ew bi pirr a, difirê û li şûna cilan wê pirên ku wan laşê wê tayrê nûxûmandîya, ezê wan bibînim. Ez nûha, va xosletên herdû aliyan tevlîhevdû bikim. Ez bihizirim ku mirove, ku laşê wî bi perikan hatîya nûxûmandin û difirê, ez li wê bihhizirim. Yan jî vajî wê, ez bihizirim ku tayrek li ardê, li şûna perikan wê cil lê bin, wê biaxifê û wê nikaribê bifirê û wê

bimeşê. Her wusa wê ev rewşa afirandina li ser xosletên mirov û tayr re wê weke afirandinîyeka mejîyê mirov bê. Lê bo ku mirov wê afirandinê bike jî mirov di mejiyê xwe de divê ku ew xwediyê wê têgîna mirov û ya tayr bê. Divê ku ew xosletên wan bizanibê. Divê ku wan nas bike. Ku ew nedîtibin jî bi çavên xwe, divê ku wî bi şîrove û gotinan ew bihîstibê. Lê li vir, rewşek din nûha xwe dide li rû. Ew jî ew a ku mirov, heta ku bi çav nebînê, wê çawa karibê wê li berçav bivejênê? Li vir, sînorê afirandina li ser wan xosletan re wê nebê. Lê dîtin, derkirin û bihîstin û hwd, wê weke rewşna ku wê temenê wê rewşa afirandinê bin. Rewşa afirandinê, wê li ser levkirina xosletan re bin. Her xoslet jî wê weke beşek û ankû qatek zanîn a zêhnî bê. Yanî, bi gotineka din, wê her beş û ankû qat, wê weke xosletekî wê zêhnek bê. Li vir, di çerçoveyek giştî de ew hewl hatîya dayîn ku were levhanîn. Têgînên levhanîn, lêhatinê û lêkirinê, wê weke têgînna hişmendî a rewşî bin. Wê li gorî rewşek heyî û ankû bûyî û an jî kû ew hatîya dîtin, wê ew xwediyê wateyê bê.

.

**Yekîtî, başîûnebaşî û metafîzîka dûalîsmê**

Rewşa fahmkirina têgîna dûalîsmê, wê bi dem û mekanê re wê xwediyê têgînek zêhnî a rewşî a fîzîkî bê. Her wusa, rewşa fîzîkê, wê bi xwe re wê hebûna xwe ya ku ew heyî û dîtbarîya wê ya ku mirov wê bi hiş ji wê bidest dixe, wê ew hebe. Di vê çerçoveyê de wê dûîtîyek weke ya hebûn û hişê hebûnê û ankû zanîna hebûnê wê xwe hanîn li ser ziman. Li vir, gotina ´hiş´, wê zêdetîrê di vê çerçoveyê de wê rastîya rewşa fîzîkî û ya dîtina wê ya bi hişî wê werênê ser ziman. Dema ku mirov gotina ´zanînê´ bikarbênê, wê çaxê, gotina zanînê, dikarê hinek wateyên din jî wê bide me. Di serî de têgîna ku wê gotina zanînê wê bide me, wê ew bê ku wê hişmendîyek bêî rewşa rewşa fîzîkî bê. Ev têgîn, wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Lê bi wê re wê têgîneka weke ku mirov ew zanîn girtîya, mirov ew ji kû girtîya, ew ji rewşek heyî girtîya, wê ev jî weke têgînekê û ankû weke kirdeyek vêşarî a di gotina zanînê de bê ku wê xwe bide hanîn li ser ziman bê.

Rewşa têgîna zanînê ku mirov li ser gotinê(gotina ´zanînê´) re bimeşê, mirov wê heta serdema hûrî û mîtannîyan, wê herê. Gotina zanînê wê di dema wan de jî wê bi heman wateya girtina zanînê, wê hebe. Di dema gûtîyan de wê gotina zanînê´, bi rengê ´zû´ wê werê hanîn li ser ziman.´Zû´, wê bi wê re wê rewşek baş ku mirov wê dikarê bi gotina ´bihûştê´ re jî werênê ser ziman, wê bide me. Her wusa, wê gotina ´zû´ wê weke navê yazdanekî jî wê, were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de weke ´yê ku zanînê dide´ û ankû ´mirov bi şîretî´ dihilde û yan jî ku´mirov, bi wê di şêwirê´ bê.Lê gotina´zû´, li ser zimanê kurdî re wê weke kiteyek tawandî a ´za´ jî bê. teybetmendîya zimanê kurdî, ku ew dikarê hemû gotinên xwe bide tawandin, wê di vê çerçoveyê de derfete gihiştina zanînê a bêsînor wê ji me re li ser xwe re wê biafirênê.Em di vê çerçoveyê de em dikarê vê weke derfetekê şîrove bikin û wê bikina temenê pêdeçûna hanîna

xwe ya ku em bi wê re dihênina ser ziman jî. Minaq, rengên tawandina kiteya ´za´, wê weke ´zû´, ´zê´, ´zî´, ´zi´, ´ze´, ´zo´, ´zu´ û hwd bê. Ev nav jî, wê bi şêwayna wê karibin hinek wateyna wê bidina e. Di vê çerçoveyê de di vê zimanê kurdî de her kiteya ku em biafirênin, wê bêwate nemênê. Ev jî, wê weke teybetîyeka zimên ku em karibin ji wê sûd bigirin û wê bikarbênin bin.

Rewşa têgîna zanînê, em bi gotinê re ku em di dema hûrî û mîtannîyan de wê kifş dikin, wê bi rengekî pêşketî bê. Bi rengê "za-an-ni-in" mirov wê rastî gotina zanînê werê di dema hûrîyan de.Ev wê bi xwe re wê têgînê bide me ku wê di vê demê de jî wê zanîn wê bi şêwayekê wê pêşketîbê. Her wusa, wê zêdetîrî wê rewşeka pêşxistina znaînê, wê di dema wan de wê hebe û wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê, alaqadarbûna bi zanebûnê re wê zêdetirî wê di wê demê de wê hebe.Herwusa em vê yekê jî kifş dikin ku wê zanîna stêrzanîyê, wêrzeyê û ankû metamatîkê, gaometrîyê û hwd, wê di dema wan de wê pêşketî bê. Wê li ser wê re wê pergalek zanistî wê di nava xwe de wê ava bikin. Rewşa zanînê û hewldana xwe gihandina wê, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek teybet a ku mirov wê di dema wan de wê kifş dike bê. Rengên xwe gihandina zanînê, wê di nava xwe de wê pêşbixin. Her wusa, rewşên ku wê pêşbixin jî, wê mirov di navaroka wê de bê. Minaq, weke stêrzanîyê, wê falvanî û hwd, wê li ser rêmildarên demê re wê werê pêşxistin. Ev jî, wê mirov û ankû bawermendna ku ew ji yazdanan xwe digihênina agahîyan û di derbarê tişta ku ew nayê zanîn de wê xwediyê zanînê bin. Wê bi wê re wê, di derbarê baxt û ankû qadera mirov de wê weke ku wê karibin xwe bigihênina zanînê bin. Ew jî, wê li ser kirinên jîyane mirov, dîtinên mirov ên weke xewnan û hwd re wê bê. Her wusa, rewşa şîrovekirina xewnan, wê di nava wan de wê weke rengekî xwe gihandina zanînê wê pirr zêde wê were pêşxistin. Wê serî pirr zêde wê li ser xewnan û dîtina wan û dîtina navaroka xewnan wê biwestênin. Her tişta ku mirov ew di xewnê de dît ku ew zindî bê û ankû ew ne zindî bê, wê di derbarê wê de wê bikin ku ew xwe bigihênina zanînekê. Di vê çerçoveyê de wê xewn, weke rêyeka xwe gihandina zanînê bê. Li gorî wan, ´xewn, di derbar pêşaroja mirov a ku wê mirov bijî de wê nîşanakên jîyane mirov wê di xwe de wê bihawênê.´ Bo vê yekê, wê her tişt, wê bi şêwayekî qarakterîstîkî wê were şîrove kirin. Minaq, genim, weke tiştekî ku mirov wê dike nan û xwarin û dixwe, wê weke ´bereketê´ wê weke nîşanaka bereketê dîtina wê ya di xewnê de wê were şîrovekirin. Weke vê rewşê û rengê mirov wê karibê rastî gelek rewşên din wê werê. Her tişta ku ew heya ku ew bi cism û fîzîk û ankû ne bi cism û fîzîk a, wê şîrove li ser wê were pêşxistin. Di nava kurdan de ku wê ji wan deman û heta van deman wê weke têgînekê û ankû bawerîyekê wê hebûna xwe wê biparêzê, bahse *´acînîyan´*(*) dihê kirin. Acînî, ew jî zindîyna weke me mirovan, lê ku ew ne hebûnek fîzîkî û cism in. Lê ew dikarin xwe bi wê rengê jî bide dîyarkirin.

-----------

(*)Acini wê weke hebûnên gîyanî ên xiyalî bin. Di nava çîrokên kurdan ên weke yên keçellok de dihên ser ziman.

Rewşa fahmkirina hebûna acînîyan, wê di derbarê rewşa aqilê kirinî de jî wê têgînek baş wê bide me. Her wusa, li vir, ev bawerî li ser gotina ´*acînîyan*´ re heya ku ´acîn, tişta ku ew dihizirin, ew dikarin bibina weke wê.´ *Mirov, tişta ku ew dihizirê, nikarê bibê weke wê.*´ Her wusa *tişta ku mirov wê bihizirê wê bibê* weke wê, wê teybetmendîyeka serfîzîkê re wê ji mirov bixwezê ku mirov xwediyê wê bê. Li vir, rewşa aqil, wê bi weyna wê ya ku ew di vê rewşê de ew dihê şîrovekirin re wê derkeve li pêş. Ev weke zanînekê û bawerîyekê wê di nava kurdan de wê heta roja me jî wê, hebûn xwe di mejiyê wan de wê bide parastin û hanîn li ser ziman.

Rewşa fahmkirina aqilê kirinî, li vir, wê bi vê gotinê re wê têgînekê wê di derbarê wê de wê bide me. Li ser vê gotinê û şêwayê vê gotinê re wê, hinek hizirkirin wê werina kirin. Wê bi wê re wê werê hanîn li ser ziman ku ´*wê, tişta ku mirov ew hizirî û xwest ku ew bibê, wê ew jî wê bibê.*´ Di vê çerçoveyê de wê rewşek aqilî wê hebûna wê, wê were şîrovekirin û hanîn li ser ziman.

Tişta ku mirov ew hizirî ku mirov wê dikarê bike, wê weke têgînekê wê hin bi hin wê bi pêşketina aqil re wê xwe bi mirov re wê bide dîyarkirin û serdest kirin. Her wusa, mirov, ya ku wê dizanê, weke ku mirov li wê ´serdest´ a, wê têgînek ji vê aqilê û rengê aqil wê derkeve û wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa fahmkirina vê jî, wê weke rewşek heyînî a ku mirov wê divê ku wê bi teybetî wê hilde li dest bê.

Fahmkirina bi aqil, wê ji aliyekî ve wê di rastîyê de wê hêstîyarîyê wê bide mirov ku mirov xwediyê rewşek serdestî ya. Her wusa, wê hêstîyarîya wê serdestîyê jî wê bi mirov re wê çê bike. Li vir, ev têgîna ku mirov wê dikarê wê bi rewşa aqil re wê hilde li dest, wê weke rewşeka aqilî a bi aqilê piretîkî re ku wê weke rewşeka ku mirov bi aqilê xwe re bi wê serdest bê. Mirov, bi aqil, dibînê. Ya ku mirov wê dibînê jî, mirov wê weke fahm dike û ankû têdigihê. Lê bi wê re jî, mirov dikarê wê jî werênê ser ziman ku wê ev jî wê weke rewşeka bi aqil re ku wê xwe bide dîyarkirin bê. Rewşa fahmkirina bi aqil re wê, li vir, wê di rastiyê de wê di rewşa hebûna xwe de wê wê hêstîyarîya lê serdestbûnê jî wê bi xwe re wê bide me. Ev rewş, wê piştre wê bi vê rengê wê li ser aqil re wê were şîrovekirin ku mirov bi aqil xwe fahmkir mirov serdest dibê û mirov ku serdest bû jî, mirov wê bê weke yê mazinê li ser wê re. Di vê çerçoveyê de wê aqil, bi serdestîyê re wê mazinehiyekê jî wê bi xwe re wê weke ku wê bide çêkirin di mejî de. Mirov, di nava wê xwezaya ku mirov wê dijî de wê, mirov çendî ku wê fahm kir û tişt û zindiyên nava wê fahm kir, mirov wê karibê ji wan xwe biparêzê û bi wê re jî ji wan sûd jî bigirê. Ev jî, wê weke rewşekê wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin. Rewşa aqil, wê di vê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin. Rewşa aqil, wê di vê çerçoveyê de wê dîsa wê bi bizîvirê û wê were wê nûqtê ku wê tişta ku mirov wê hizirî wê karibê bibê ew. Ya rastî, ev weke têgîneka serdest, wê weke ku wê di mejî de wê were zindî kirin. Di mejî de wê, weke ku mirov di jîyanê de bi rewşa xwe ya fîzîkî û hebûnî heya, wê bi heman

rengê wê di aqil de jî wê afirandinên weke bi têgîna ´acînîyan´ re wê werina pêşxistin. Ev jî, wê ji aliyekî ve, wê rewşa acînîyan weke ´zindiyna ku ew dihên hizirkirin, ew hena´ wê weke beremberî wê hebûna me mirovan a fîzîkî a li jîyanê jî bê. Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de wê dûalîtîyek wê xwe li vir, wê bide dîyarkirin. Lê mirov dikarê vê rewşa pêşxistina acînîyan, weke kirina mirov weke hizrekê jî mirov dikarê wê ji aliyekî ve wê şîrove bike. Yanî, bi gotinaka din, mirov dikarê wê werênê ser ziman ku weke ku mirov ji wê rewşa wê ya fîzîkî dihê derxistin. Ew têgîna ku wê rewşa fîzîkî, weke rewşeka ku mirov bi sînor dike, wê mirov, wê vê jî weke kirdeyek vêşarî, wê bi vê têgînê re wê bide dîyarkirin. Bo vê yekê, wê bixwezê ku ew derkeve dervî wê heyîn û rewşa fîzîkî a li jîyanê ku ew heya. Derketîna dervî wê, wê weke rewşeka ku mirov li wê rewşa fîzîkî serdest bibê jî wê, xwediyê wateyekê bê. Di nava kurdan de wê hertimî heyîn û hebûna rewşa fîzîkî a li jîyanê ku ew zindî bê û ne zindî bê, wê bi têgînên weke yên acînîyan û hwd ku ew pêş dixin re wê ew wê bikina berlêpirsînê de. Em li vir, bi vê rewşa dervî rêgezên hebûna fîzîkê re em, hinekî li ser vê rewşa serfîzîkî divê ku em bi kûrehî herin û wê hinekî din jî fahm bikin.

Ev rewşa serfîzîkî, wê weke rewşeka ku wê ji du aliyan ve wê xwe bi aqilê me re bi teybet wê bide dîyarkirin. Yek, wê ew bê ku wê ne li gorî rêgezên hebûna fîzîkî bê. Ya din jî wê, ew bê ku mirov wê bi aqilê xwe re wê hewl bide ku ew serdest bê. Rewşa aqil, di vê çerçoveyê de wê xwediyê wê rewşê bê ku mirov wê bi wê re wê karibî dervî fîzîkê bihizirê. Hinekî jî, wê di vê çerçoveyê de wê wateyek wê hebe.

Karîna hizirkirina dervî rêgezên fîzîkê, wê di serî de wê aqilekî baş ê pêşketî wê ji mirov wê bixwezê, di serî de wê ji mirov bixwezê ku mirov rêgezên heyîna fîzîkî wê fahm bike û bi wê re derkeve ser wê re. Heta ku mirov wê fahm nekê, mirov wê nikaribê derkeve ser wê re. Hinekî jî, ev jî wê di rewşa pêşxistina aqilê xiyalî de jî wê wusa bê. Aqilê kirinî ku ew dervî fîzîkê mirov bi vê rengê wê li ser rewşa weke ya acînîyan re wê kifş dike, wê di derbarê pêşketina aqilê kirinî ê dervî fîzîkê û ankû serfîzîkê de wê têgînekê wê bide me. Her wusa, bi wê re jî wê teybetmendîya sereka a wê rengê hizirkirinê wê xwe bi gotina ´afrînerîyê´ û ankû afirandinê re wê bide dîyarkirin. Ji xwe, ku weke afrînerîyeka mejiyê kurdan a wê di vê çerçoveyê de wê di mejiyê kurdan de wê xosletên ku ew baxşî têgîna acînîyan dikin, wê di wê rengê de bê ku ew weke zindiyna xiyalî ku ew dikarin hertiştî bikin û xwe bikina reng û şamale her tiştî de. Her tişta ku wê bi fîzîkî wê hebê, wê ew karibin xwe bi qûlûbênina wê û bikina weke wê û ankû rengê wê de. Ev jî, wê weke teybetmendîya ya nefîzîkî bê. Ev jî, wê weke têgînekê wê werênê hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de ev rewşa ku wê xwe di têgîneka serfîzîkî de wê bide dîyarkirin, wê di navaroka wê de wê bi hizirîneka sermed a bi jîyanê re wê were hanîn li ser ziman. Zindiyên ku ew ne bi fîzîkî hena, wê rewşa jîyane wan û temenê wan jî wê, ne

weke ya mirovê bi rewşa fîzîkî ku ew heya bê. Di vê çerçoveyê de wê di navaroka wê rewşê de wê gelek rêgezên rewşa serfîzîkî wê bi demê re wê bi hevdû re di ahengekê de wê werina kifşkirin û wê bi wan re rewşek jîyanî wê werê hanîn li ser ziman.

Rewşa aqilê kirinî, her wusa, li vir mirov bi vê rewşê re wê jî bi wê re kifş dike, ku wê weke ku rewşa fîzîkî wê weke sînorekî wê yê xwe wergeranin û qûlûbandinê li rewşên din jî bê. Di rewşa nebûna fîzîkê de wê ev sînor nebin. Di vê çerçoveyê de wê weke ku ew ev rewş bi şêwayna wê bi wê rewşa têgînî a li ser serfîzîkî re wê were bi laşkirin. Mirov, di rewşek dervî rêgezên fîzîkê de wê çawa karibê bijî? Wê di vê çerçoveyê de wê çîrok û çîvanokên nava civake kurd ên li ser acinîyan, wê weke ku wê bixwezin di dîmenekî de wê fahm bikin. Wê di vê çerçoveyê de wê ev rewş jî, wê weke rengekî pêşxistina aqil ê dervî rewşa fîzîkê bê. Aqilê ku wê ne li gorî rewşa fîzîkê û ne bi rêgezên wê bihizirê, wê di vê çerçoveyê de wê weke ku wê pêşî cihanek xwe wê biafirênê di mejiyê mirov de, Mirov wê wê li ser wê cihanê re wê di meji de wê bihizirê. Wê rewşa dîtina dervî fîzîkê wê hin bi hin wê bi şêwayekî dervî jîyane bi rewşa fîzîkî wê bike ku wê bide dîyarkirin. Rewşa fahmkirina dervî fîzîkê, wê her wusa, di çerçoveya tgîna hebûnê de wê ji rewşa heyîna rewşa hebûnî a fîzîkî wê sûd wergirê. Lê wê, bi wê re wê weke şêwayekî ku wê bi aqil karibê bijî. Li vir, em divê ku vê yekê jî bi wê re wê werênina ser ziman ku wê rewşa dervî rewşa fîzîkê, bi aqilê mirov re wê cihanekê wê bi xwe re wê biafirênê. Ew serbestîya bi hizir û hizirkirina wê, wê çendî ku wê aqil pêşbikeve, wê ew jî zêdetir bibê. Di vê çerçoveyê de azadîya serbestîya hizirkirinê wê, hinekî jî wê bi asta aqilê mirov re wê bi sînor bê. Di vê rewşê de wê rewşa hizirkirinê wê weke rewşek hîmî a bingihînî wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa aqilê mirov, wê di vê çerçoveyê de xwe bide dîyarkirin.

Derketina dervî rewşa fîzîkê bi hizirkirinê, wê di rewşa rengê hizirkirina mirov de jî wê mirov bi aqilê mirov re wê derxe dervî wê. Lê li vir, mirov divê ku vê yekê jî bi wê re fahm bike ku wê di rewşa hizirkirinaka dervî rewşa fîzîkê de wê hizir, wê hertiştî di nava xwe de wê bi şêwayekî hizrî wê hilde li dest. Di wê çerçoveyê de wê wê her tişt, wê weke rengekî hizir bê. Di rewşa hildana li dest a kevirekî de wê, kevir, di mejiyê mirov de wê ne xwediyê wê wê xosleta hişkayîya bi xwe re bê. Kengî ku ew xoslet hat têgihkirin bi aqil, wê hingî ew xoslet, wê were kifşkirin. Bi wê re wê, êdî wê li ser wê re wê li kevir weke ´hişka´ wê were hizirîn.

Li vir, em vê yekê jî bi wê re wê werênina ser ziman ku wê her tişt, di nava aqilê me de wê, bi xosletên heyînî ên tiştê re wê hebe. Ew tiştên ku me bi cerb û ezmûn kirin wê weke xosletên wan, wê rewşa wan xwe bi aqilê me re wê bide dîyarkirin xoslet û rewşa têkiliyê, li vir, wê temenê rengê afirandina li ser hebûn û ankû rewşa fîzîkî û hwd re bê.

Aqilê mirov wê her wusa wê bi vegotinên weke ên dervî rewş û heyîna fîzîkî û hwd re wê fêrî jîyankirina dervî fîzîkê bê. Her wusa, wê bi wê re wê fêr û ezmûna xwe bixwe re wê bidest bixê. Çendî ku ev fêr û ezmûn wê di nava aqil de wê, pêşbikeve, wê bi wê re wê mirov fêrî afirandinê û hwd bê. Rewşên weke têgîna ´afsûnê´ û hwd ku ew wê di destpêka pêşketina aqilê me de wê weke şêwayekî aqilî ê hizirkirinê wê xwe bide dîyarkirin, wê di aslê xwe de wê weke şêwayekî *çêkerîya li ser aqil re* jî wê bi xwe re wê bide nîşandin bê. Çêkerîya li ser aqil re ku mirov li wê dihizirê, wê di cih de wê zêhn û afrînerîya zêhnê wê xwe bide hişê me. Têgîna zêhnê bêî bûjen ku ew dikarê bi xwe re hebê weke serbixwe, wê di vê çerçoveyê de wê di kirasê gîyane jîyan dike de wê bihizirênê û biafirênê. Gîyane ku ew ku ew dervî laş dikarê bijî, wê rastîya fahmkirina nîşanaka zêhnê ku ew bêî rewşa fîzîkî û bûjenî ku ew dikarê hebê û bijî wê, wê hîmê fahmkirinê bê. Ev rewşa aqilê zêhnî ku ew bêî rewşa fîzîkî û bûjenî heya, wê her wusa wê temenê hizirkirina me ya bêî rewşa fîzîkê û bûjenê jî bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê rewşa li ser aqil re wê weke rewşeka ku wê mirov çawa hin bi hin fêrî afirandinê dibê, wê jî bi wê re wê hilde li dest û wê fahm bike. Têgîna afsûnê wê di vê çerçoveyê de wê rengekî aqil bê. Mirov, dihizirê bi wê re. Mirov dihizirê ku wê tiştekê li gorî xwesteka mirov wê bibê. Mirov, dixwezê ku ew tişta ku mirov xwest ku ew bibê. Mirov dixwezê ku mirov li devereke ku mirov ne li wê ya bê. Her wusa, ev xwestekên di aqil de wê, hin bi hin, wê weke têgînekê wê xwe bidina li rû. Xwestek, li vir, bi têgînên weke ajoyî û hwd, ên ku ew di temenê wê de na wê, xwe di vê çerçoveyê de di rengekî afrîner de wê bi aqil re wê bide dîyarkirin. Xwestekek ku ew bû, wê xwesteka hanîna li cih a wê jî wê xwe bi hîs û ajoyan re wê bide dîyarkirin. Wê xwestek, wê weke rengekî hizirkirinê bê. Di vê çerçoveyê de wê xwestek, temen tevgerîyek mirov a ku mirov wê bike bê. Li vir, hêza kirna tevgerê a xwestekê wê xwe bide dîyarkirin.

Hêza kirina tevgerê a xwestekê, wê xwe di wê rewşê de wê bide dîyarkirin. Mirov, wê bi wê re wê weke ku wê mêylên wê xwestekê wê bidê dîyarkirin. Hizre têgîna xwestekê wê, wê weke rengekî ku wê mirov wê bi xwe re wê bike tevgerê de bê. Mirov wê wê li ser wê tişta ku xwest re wê xwestek bi pê re wê çê bike. Xwestek, wê hertimî wê li ser têgînên kirinî re wê xwediyê rewşek afirandinî bê di nava rewşa aqilê kirinî de. Ev jî wê, weke rengekî wê tişta ku mirov xwest ku wê bike, wê ew bê bike. Minaq, dema ku xwest ku ew avê vexwe, wê weke rengê wê xwestekê wê ew wê bike. Tîbûn, wê weke rewşekê ku wê xwestekê diafirênê bê. Lê kirin û pêkhanîna av vexwertinê, wê weke rengekî pêkhanîna wê xwestekê bê. Mirov jî wê li ser wê re wê bike ku ew xwe bigihênê avê û vexwe. Her wusa, rewşek xwestekî a bi afirîna wê re ku mirov wê dikarê bi awayekî xweza wê werênê ser ziman wê hebe. Bi wê re jî wê, li ser rewşa jîyanî re wê ew rewş xwe bide nîşandin. Tişta ku mirov ew hizirkir ku mirov wê bike, wê mirov wê hewl bide ku wê bike. Lê ez li vir vê yekê bibêjim

ku ew tişta ku mirov ew hizir kir ku ew bê kirin, wê ew tişt û ankû rewş ku ew newê kirin jî wê, weke rewşek ku ew hatî hizirkirin wê hebe. Rewşa hizirkirina me, wê weke destpêka wê ya pêşî a kirinî bê. Ew hizra ku ew hatî hizirkirin, ew bi wê hizirkirinê re ew bûya û ew heya.Mirov dikarê di vê çerçoveyê de wê êdî wê bahse wê bike weke tiştek û ankû rewşek ku ew heyî. Hizirkirin, wê xwe li gorî wê rewşa hizirkirinê wê bide dîyarkirin. Mirov xwestekîya ku çi bikê û ankû li çi bihizirê, wê ew bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa hizirkirinê, wê bi xwe re wê xwediyê rêgeza xwe ya bi rewşa hizirkirinê re bê. Mirov, tenê ber ku dikarê bihizirê mirov nahizirê, mirov wê hizirkirinê li gorî mêyl û xwestekê, bi armancekê dike. Di vê çerçoveyê de mirov dema ku wê hizirkirinê hilde li dest, wê ev rewş, wê weke rewşna dîyarker wê bi wê re wê xwe bide dina dîyarkirin bin. Mirov, wê karibê ji wê hizrê, wan jî bi wê re fahm bike. Ew hizirkirin, wê ew wê wan têgînan wê bide me.

Rewşa hizirkirinê, wê weke rewşeka ku wê weke ku wê li ser tişt û ankû heyîneka ku ew heyî re wê bibê. Di vê çerçoveyê de ku ev di aqil û ankû mejî de jî bê û ankû di dervî wê jî bê wê weke ku rewşek heyînî wê xwe di hîm de wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê rewşê re ew tişt û ankû heyîna ku ew heyî û ew li wê dihê hizirkirin, mirov divê ku wê ji bi hebûnî ji gelek aliyan ve wê hilde li dest. Di mejî de wê, tişta ku mirov ew derkkir û hizirî li wê, wê ew weke ku wê heyî wê li ser wê bê hizirin. Di jîyanê de bi rewşa fîzîkî re ku tiştek hebe jî û nebê jî lê ku mirov bi aqilê xwe re di mejî de li wê hizirî û ew hizirkir û pê de wê, ew weke ku ew heyî wê xwediyê wateyekê bê. Êdî wê ew, wê weke ku ew heyî, wê xwe bide dîyarkirin. Wê weke kirdeyek bûjenîkî a bi hiş re jî wê xwe bide dîyarkirin. Em dema ku bahse bûjenê dikin, her wusa wê di cih de wê tişta ku ew di jîyanê de bi rewşa xwe ya fîzîkî ew heya, wê ew were aqilê me. Lê em li vir, divê ku hinekî li ser aqilê xwe yê ku em bi wê hizirîna re jî wê, rewşê weke dîmenekî dûyem ê ku bi vê rengê wê werênina ser ziman. Rewşa bûjenî ku mirov ew di nava aqilê xwe de di mejî de afirand, wê ew weke rewşek bûjenî wê xwe bişenberî wê bide li berçav û dîyarkirin. Rewşa têgîna bûjenê, her wusa li vir, ji aliyê derkkirina dervîyayîyê ve ku mirov wê hilde li dest, wê hingî wê ji tişta ku mirov ew bi heyînî dît û derkkir ve wê ew were dîtin û wê weke ku ew hebe. Lê li vir, em ji aliyê aqil û ankû mejîyê xwe ve jî mirov, dema ku dihizirê, wê her wusa mejiyê mirov, wê bihizirê û wê biafirênê. Wê çerçoveyek bi pêşnûmeyî û darêjkî wê karibê biafirênê, bi wate bike û ppiştre wê bixwe jî bihiş bike bê. Ev jî wê, weke rewşek bûjenî a li ser aqil û hizirkirinê re wê xwe bide dîyarkirin. Em li vir, di aslê xwe de wê rewşa têgîna bûjen ku em bikin ku wê fahm bikin, em divê ku wê di çerçoveya têgînek rastîtî de wê fahm bike. Rastîtî, wê tişta ku ew

---------------

(*)Rastitî wê bi gotineka din wê realism bê. Wê realism wê weke felsefeya rastiyê wê hertiştê di muhasabeya raastiyê de wê bide derbaskirin. Wê temenê wê rastitiyê li ser ya rast, heya û ku mirov wê dikarê derkbikê wê werênê li ser ziman

heya, wê wê tştê bihebûna wê re wê herê bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê têgîna dûalîtîkî jî wê tişta ku ew li jîyanê heya, wê ew wê bi hebûna wê ya heyî re wê herê bike û wê bike ku wê fahm bike. Ji xwe, aqil, di vê çerçoveyê de wê weke rewşek fahmkirinê wê bike ku wê werênê ser ziman. Rastîtîya dûalîtîkî, her wusa li vir, wê li vir, di têgînekê de wê ew wê heyîn bûjenî wê herê bike. Wê ew wê, bike ku wê fahm bike û wê werênê ser ziman. Her wusa fahmkirina wê tiştê jî di dema wê de û ankû hebûna wê ya wê ku ew bûyî di dema wê de wê weke ezmûnek demkî a ku ew bûyî û ku mirov divê ku wê fahm bike jî wê dem bi dem wê hilde li dest.

Rastîtîya dûalîtîkî her wusa li vir, mirov wê divê ku ji aliyê wê rewşa heyînî ve wê hilde li dest. Dema ku mirov wê derkkirinê dike, wê her wusa, ew derkkirin, wê weke ku ew tişt dihê dîtin, wê ew bê kirin. Di vê çerçoveyê de wê hevyekîyek, wê di nava wê tiştê û ankû heyînê de wê bi derka wê ya hizirkî a ku ew bûya re wê hebe. Her wusa, wê bi wê re jî wê li wê dûalîteya wê wê were lêgerîn. Rewşa wê derkkirinê, wê her wusa wê li vir, wê weke rewşek têgînî bê. Lê ew derkkirin bixwe jî wê weke rastîtîyek ku ew heyî û ankû ew bûya, wê ew were herêkirin û dîtin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa têgîna wê derkê bi hizra wê ya hatî kirin û ankû hişê bi wê hizirkirinê ku ew hatîya derkirin re wê, ew were dîtin. Em li vir, vê yekê bi awayekî vekirî li vir wê jî werênina ser ziman ku wê her hildan weke fenomenekê(*) wê xwediyê heyînek rastî bê. Wê her tişt wê bibê. Wê di demekê de wê birastî wê hebe. Lê wê bi demekê re wê nebê. Bi wê re jî ew tişt piştî ku ew bûya û pê de wê mirov, nikaribê wê înkar bike ku ew nebûya. Her wusa, piştî bûyîna wê re wê ew hebûna wê tiştê bi heyînî, wê mirov bi aqilê xwe re wê nikaribê wê înkar bike. Wê ew weke rewşek paşerojî ku ew li şûn maya wê hebe. Her ku mirov li şûn xwe nerî, wê ew bûyîn, wê bi awayekî wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, rewşa hebûnê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastîtîyekê bê. Rastî, li vir, mirov dema ku wê salix bike, wê weke jîyankirina mirov, tevger û kirinên mirov ku mirov wan dike, dîtinên mirov ku mirov wan dibînê û hwd re wê xwediyê wateyekê bê. Minaq, laşê mirov heya, mirov nikarê wê înkar bike. Her wusa, gîyane mirov heya, ber ku laşê mirov heya. Hebûna laşê mirov bi rewşa wê ya fîzîkî re wê nîşanaka hebûna gîyane mirov jî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê bi têgîneka dûalîtîkî wê hebûna laş û gîyanê wê bi têgînek rastîtî wê were hanîn li ser ziman. Bi wê re jî bi laşê mirov re bûna xwedî hizirkirinê û hizirkirina mirov jî wê nîşanak hebûna gîyane mirov bê. Her wusa, bi demê re bûyîn û mirina laşê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê nîşaneyekê bê.

Tabî, têgîna rastîtîyê, wê her wusa li vir, bi têgîna hevrasttîtîyê û hevyekê re wê di ahengekê de wê xwediyê têgînek heyînî a bi hebûnî re bê.W li vir, li gorî

-------------

(*)Fenomen wê weke heyineka diyar a ku ew heya bê. Wê beşên tiştekê ku wê temem dikin wê weke fenomenê wê bin.

têgîna rastîtî a dûalîtîkî wê her tişta ku ew bi rastî heya, wê hevrastî û hevyekîya wê jî wê beremberî wê, ew w hebe. Ku şev hebê, wê roj jî wê hebe. Ku jîyan hebê, wê mirin jî wê hebe. Ku laş hebê, wê gîyan jî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê di hevyekê de wê têgîna rastîtîyê wê xwediyê hanînîyek ser ziman bê.

Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê bi têgîna rastîtî re wê hebûna gîyanê wê ne weke têgîneka ku ew ber ku em wê bihizir dikin û ew heya, wê ber ku ew heya wê hebe. Yanî, sedema hebûna wê, wê bi hizirkirina me re wê werênê ser ziman. Li vir, wê gîyan, dervî aqil û hizirkirinê û zanîne me, wê were hilda li dest. Em dibînin ku wê Zerdeşt, wê di dema xwe de wê bi şêwayekî wê aqil dervî laş û gîyanê wê weke beşek sêyem wê werênê ser ziman. Bi wê re jî wê li wê bihzirê ku wê piştî mirina laşê mirov wê ew aqil, wê bi laşê mirov re wê bimirê û ankû ew jî weke gîyane me nemir a û wê bi gîyanê re wê hebûna xwe wê bide domandin bê. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê wê were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê bitêgînek dervî derka gîyan û laşê wê ew were hildan li dest.Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê jî werênê ser ziman wê gîyan weke laş, wê bi têgînek rastîtî wê ew wê were hanîn li ser ziman. Rastîtîya gîyanî, wê her wusa wê bi hanîna wê ya dervî hizirkirina me re wê xwe wê weke rastîyekê wê bide dîyarkirin. Wê aqil, wê weke rastîyek fahmkirinê a li jîyanê, wê were hanîn li ser ziman.Di vê çerçoveyê de wê li aqil, hebûna aqil û sedema bûyîna wê wê were hizirkirin.

Rewşa aqil jî wê weke rastîyeka bi rastî a li jîyanê wê were dîtin û hanîn li ser ziman. Her wusa, aqil hebûna wê rast a. Mirov nikarê wê jî ji wê gûmanê bike. Di vê çerçoveyê de wê aqil, di nava xwe de wê li jîyanê de wê temenê fahmkirin û pêşketinê û ankû pêşxistinê bê. Li vir, rewşa aqil hanîna wê ya bi rewşa fahmkirinê re wê weke rewşeka ku ew tişta ku ew dibînê li jîyanê ku ew wan fahm bike û wê derk bike bê. Lê dema ku mirov wê bi rewşa pêşketinê û ankû pêşxistinê re wê hilde li dest, wê hingî wê bi ewşek afirandinînî a bi aqil û di hundûrê aqil de re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, rewşa hizirkirinê û afirandina bi aqilkî, wê ji aliyekî ve wê rewşek bi vî rengî wê bide dîyarkirin. Hebûna aqil, wê di vê çerçoveyê de wê weke temenekî pêşketinî ê jîyanî jî wê xwe bide dîyarkirin û wê hebe.

Rewşa rastîya aqil, wê bi aliyê xwe yê fahmkirinê ê bi jîyanê re wê xwediyê temenekî pêşketinê ê bi hişmendî bê. Mirov, wê hewirdora xwe û xwezaye xwe nas bike. Wê mirov, di derbarê xwezaya xwe de wê bê xwediyê aqil. Wê nas bike. Wê fahm bike. Her tişta ku ew bi hebûnî û zindî heya, wê ew weke afrînerîyek ku ew ji aliyê yazdanê mazin ve hatîya afirandin bê. Bo vê yekê, wê di çerçoveya têgîna pîrozkirina hebûna zîndîtîyê de wê Zerdeşt, wê pîrozîyekê li zindîyan baxş bike bi navê yazdanê xwe re. Di vê çerçoveyê de wê Zerdeşt, heta ku wê weke mirovekî ´wejeteryan(*)´ bê. Wê ew tişta bigoşt wê nexwê. Di vê

--------------

(*)Kesê ku ew goştê sawalan hîç heta ku ew bijî naxwe bê.

çerçoveyê de wê xwediyê rastîyekê bê. Ev rewşa Zerdeşt, wê tiştekî wê bi xwe re û bi hizra wî re wê bide dîyarkirin. Ew jî ew a ku ew her tişta zindî ya, hebûna wê herê dike û mafê wê yê jîyanê herê dike û destlênedana li jîyane wê jî wê pîroz dibînê. Di vê çerçoveyê de wê rewşekê bi vê rewşa jîyane xwe hizirkirina xwe re wê werênê ser ziman. Li vir, mirov vê yekê jî kifş dike û fahm dike ku wê hebûna her zindîyî bi heyînîya wê û bi hebûnîya wê were herê kirin. Li vir, di mantiqê Zerdeşt de wê, boraqkirina zindîyan jî wê nebê. Heta wê dema wî, wê bi awayekî wê zindî û berê wê demê wê mirov jî werina boraqkirin ji yazdan re, wê bibê. Lê Zerdeşt, wê vê qadaxa bike bi hizra xwe re. Wê vê jî wê werênê ser ziman. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê her hebûnê li jîyanê weke hebûnekê û rastîyekê ku ew heyî û mirov nikarê wê hebûna wê înkar bike, wê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de mirov têdigihê ku wê, her tişta ku ew li jîyanê heya wê weke heyîneka ku ew li jîyanê heyî, wê weke hebûna rast û rastteqîn wê were herê kirin û pejirendin. Ev hebûn, ne tenê ji dîtina me û hizirkirina me pêktê. Dervî wê jî, ew bi heyînî heya.

Rewşa fahmkirina hebûna jîyanê bi aqil, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bi rengekî fahmkirinê re wê bide dîyarkirin. Li ser têgih û têgînên mirovî ên bi aqil re wê mirov wê fahm bike. Tabî rewşa jîyanê, wê weke rewşek teybet bê. Di derbarê jîyanê de aqil meşandin, wê weke rewşek teybet bê. Jîyan, çawa di meşe di rêya xwe de? Her zindî, di wê çawa dijî û xwedîyê çi mafê ya? Mirov, di nava jîyanê û ankû xwezaya wê de çendî azad a? Wê li vir, weke ku mirov wê fahm dike û wê kifş dike, wê Zerdeşt serî li ser wê bi wastênê. Di vê çerçoveyê de têgîna serbestîtî û ya pêwîsîtînîyê(determinismê) wê weke têgînekê kku ew bi hevdû re wê werê hildan li dest bê. Li vir, fahmkirina têgîna srbestîtîyê wê bi jîyane mirov wê, li gorî derfet û rewşa kirinên mirov bê. Aqil, wê ji aliyekî ve wê hem sînoran dênê pêşîya azadîya mirov a di jîyanê de bi rêgezên ku ew li ser têgînên weke rewîstê û hwd re ew dide kifşkirin û hem jî wê ji aliyekî ve wê sînorê azadîya mirov bi tevgerîya mirov re wê berfirehtir bike. Di vê çerçoveyê de mirov, bi aqilê xwe re wê çendî ku karibê fahm bike, wê bi wê re di ahengekê de wê sînorê tevgerîya xwe ya bi azadî jî wê kifş bike. Têgînên ku wê ji zadîya mirov re wê weke sînor wê xwe bidina dîyarkirin, wê ew jî wê di şêwayê fahmkirina mirov de wê weke rengna di jîyanê de ku ew *hena,* wê xwe bidina dîyarkirin. Li vir, her wusa, têgîna azadîyê, wê Zerdeşt, wê hinekî li ser têgîna gîyanê re wê zêdetirî di çerçoveyek berfirehtir de wê werênê ser ziman. Li vir, mirov biqasî ku wê ji wan têgînên wî yên avêstayî wê fahm bike, wê werênê ser ziman, wê ew têgîna azadîyê, li ser gîyanê re wê di rewşek ku ew sînorê wê firehtira de wê ew werênê ser ziman. Di dema ku mirov bi laşê xwe re di jîyanê de heya û dijî de wê ew sînorê azadîyê, wê hinekî wê ji wê rewşa mirov a laşî wê xwe bide dîyarkirin. Minaq, wê di rengekî wê werê hanîn li ser ziman ku wê rewşa kişîna ardê wê li ser rewşa laşî a fîzîkî a laşê mirov re wê hebe. Lê piştî ku laşê mirov mir û pê de wê ew di reng û şêwayekî din de wê

hebe û wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê têgîna azadîyê, wê di aslê xwe de wê weke ku wê were dîtin, wê laş, wê weke astengîyekê li pêşîya wê jî wê di şêwayekî de wê li wê were hizirîn. Mirov, vê yekê di vê çerçoveyê de wê kifş dike. Lê di şêwayê kirinîya bi gîyanî de wê weke ku wê ew sînor wê nebin. Di vê çerçoveyê de gîyan, wê di şêwayekî de wê azad bê. Li vir, di dewama mijarê de mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku wê, di dema ku laşê mirov li jîyanê ku ew hê dijî de gihiştina wê têgîna azadîyê a bi gîyanê re wê li ser wê were hizirkirin. Her wusa, ev jî, wê bi şêwayekî wê weke derketina dervî wê sînorê bi laşê fîzîkî ê ku e heya re bê. Di vê çerçoveyê de wê ew derketina dervî wê, wê weke rewşekê wê xwe bi hizirkirinê re wê weke ku wê bê xwestin ku ew bê gihiştin li wê. Rewşa gîyanê û azadîyê, wê di vê çerçoveyê de wê her wusa wê weke mijarek giring ku wê pirr zêde wê li ser wê serî werê wastandin bê. Her wusa, gihiştina wê azadîya bi gîyanê re wê, wê weke gihiştina jîyanek azad a sermed jî bê. Wê di vê çerçoveyê de wê were fahm kirin. Dema ku ew gîyane mirov, ji wê sînorê heyînîya fîzîkî a laşê mirov derbas bû û ankû wê dema ku ew, laşê mirov mir û gîyane mirov ji wê derket û pê de wê igihijê azadîyê bi têgînekê, wê têgîna azadîyê û ya gîyanê wê bi hevdû re wê were hizirin. Em li vir, divê ku vê yekê jî baş fahm bikin ku wê hemû kirinên mirov ên ku mirov wan dijîyanê de bi laşê xwe re dike, wê weke ku wê di temenê kifşkirina wanû dana kirina wan de wê têgînek gîyanî wê hebê. Di vê çerçoveyê de wê li wê êdî wê were hizirîn.

Rewşa azadîya gîyanê, wê di vê çerçoveyê de wê hê di dema ku mirov di jîyaneka ku ew bi laşê wî re dijî û domênê de wê hewl bide ku ew bi aqilê xwe re ew derkeve ser wê rewşa heyînîya laşê xwe re. Rewşa ku weke rewşa *´serdestkirina gîyanê li laşê´* jî wê, di vê çerçoveyê de wê weke têgînekê wê xwe bide dîyarkirin bê. Li vir, em divê ku vê yekê jî bi wê re wê werênina ser ziman ku wê rewşa gîyanê û jîyankirina bi wê re û hewldana serdestkirina wê li laş, wê di temenê wê de wê ew têgîna ku wê bi wê were bawerkirin ku wê di temenê her kirin û tevgerîyên mirov de wê têgînek ji gîyanê wê hebe bê. Di vê çerçoveyê de ew hewldana serdestkirina gîyanê li laş, wê hem weke hewldana *azadkirina gîyanê* û xwe serbest kirinê bê û hem jî wê weke hewldanaka ku wê bi wê re wê bikin ku kirin û tevgerên xwe baştir bikin û wan bikina bin sehêt(kontrol)ê de jî bê. Ev rewş û têgîna ku wê bi wê re wê were bawerkirina ku wê gîyan hemû kirinên mirov ên di laş de wê bide dîyarkirin de jî wê, di vê çerçoveyê de wê bi wê were bawerkirin ku mirov dema ku wê çaxê derkeve dervî wê rewşa laş, wê ew tevger jî wê baştir, bi qûdrettir û bihêztir bin li gîyanê. Di vê çerçoveyê de wê di şêwayekî de wê li jîyanê û hebûna gîyanê û jîyankirina gîyanê li jîyanê wê were hizirkirin bi laş re.

Rewşa gîyanê, wê her wusa di vê çerçoveyê de wê weke rewşeka ku ew dervî hebûna aqilê me wê li wê were hizirkirin bê. Lê bi wê re jî wê, aqil wê weke hebûna ku mirov wê bi wê re wê bi aqil bê û wê gîyan jî wê bi wê re wê

were têgîhiştin bê. Bi wê re wê gîyan jî wê ber ku ew hebe, wê xwe bi aqilê mirov re wê weke zanînekê jî wê bide dîyarkirin. Wê gîyan, wê têgîhiştina wê, wê ew bi afirênê bi hebûna xwe re. Di vê çerçoveyê de wê têkilîyek gîyanî û jîyanî wê were danîn bi hevdû re. Rewşa gîyanê, wê di vê çerçoveyê de wê di wê rewşa wê ya azad û serbest de wê, li başî û nebaşîya wê jî wê were hizirkirin. Sînorê gîyanê wê pirr zêde wê berfirehtir bê. Wê her tişt wê bo wê bi derfet bê ku ew karibê bike û xwe bigihêniyê de. Di vê rewşê de jî wê, ew gîyan ku ew baş bê, wê sînorê wê başîya wê û vejene wê ya bi başî jî wê hebê. Bi heman rengê wê vajî wê jî wê rast bê. Di vê çerçoveyê de wê têgîna gîyane baş û ya nebaş wê li wan wê were hizirkirin. Her wusa gîyane baş, wê weke ku wê Zerdeşt jî wê bi ahûra-mazda re wê werênê ser ziman, wê weke dagera başîyê ku wê hertimî wê başîyê bike. Vajî wê, wê bi gîyane nebaş re jî wê Ahrîman, wê weke gîyane nebaş ku wê sînor di kirina nebaşîyê de wê nasnekê. Lê wê herdû jî wê hikmê wan di tevgerên wê ku wê di jîyanê de wê bibin, wê hebe. Mirov, çawa fahm dike ku tevgerek baş a û ankû nebaş a? Wê li ser encama wê re wê li wê were nerîn. Ku ew encama wê bi kirina wê re ku ew baş bê û başîyê bi xwe re bênê, wê ew baş bê. Vajî wê, ku ew tevger û ankû kirin ku nebaşîyê bi xwe re bênê, wê ew nebaş bê. Di vê çerçoveyê de wê di rewşa fahmkirinê de wê were zanîn. Aqil, li vir, wê weke erkeka wê jî wê, ew bê ku ew bike ku mirov karibê ya baş û ya nebaş ji hevdû cuda bike û vaqatênê. Di wê çerçoveyê de wê aqil, wê xwediyê rewş û tevgerîyekê bê. Tevgerên mirov, ên ku mirov wan dike, wê gîyane mirov nêzî aliyê gîyane baş bike û ankû wê nêzî aliyê gîyane nebaş bike. Di vê çerçoveyê de wê vê yekê jî wê kirinên miirov wê ew wê bide dîyarkirin. Mirov, li vir, bi aqil dikarê wan ji hevdû cuda bike. Hertimî bi kirinên xwe re ya baş bike û bi başî bike. Ev jî, wê weke tekoşîneka mirov a bi nebaşîyê û aliyê gîyane nebaş re bê. Wê dema ku mirov ya baş kir jî wê hertimî wê gîyane nebaş, wê binûqûtê li nava tevgerên mirov ku ew bi aliyê nebaş ve wê bide birin. Lê mirov, li vir, divê ku hertimî di têgîna ya baş de bê, bo ku mirov karibê pêşîya wê bigirê. Ku ew zanibê ya baş çî ya, wê bi wê re wê ya nebaş jî wê têbigihê. Lê li vir fahmkirina wê, wê tenê bi aliyekî bê ku mirov, dema ku gihişt têgîna baş, mirov wê têbigihê ya nebaş jî çi ya. Ev rewş jî wê di rewşeka weke ya tekoşîna di nava başî û nebaşîyê de wê xwe di jîyane mirov de wê bide domandin. Jîyan, wê ji aliyekî ve wê qada ku wê başî û nebaşî wê were berhevdû bê. Lê li vir, ya ku wê ew wê bide dîyarkirin, wê rengê kirinên mirov bê. Rewşa têgîna başî û nebaşîyê, wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê bi rewşa heyîna gîyanê re wê xwe bidina jîyankirin. Mirov, di kirin û bijartinên xwe de wê azad bê. Wê bi kîjan aliyê ve wê hilbijêrê û wê berê xwe bidiyê de wê mirov, di wê de wê bi aqilê xwe û hwd re wê azad û serbest bê. Bo vê yekê ya ku mirov piştî ku ew kirin ku bi başî û nebaşî kir û pê de wê, mesûlîyeta wê û berpirsîyarîya wê, wê li ser milê mirov bê. Mirov, wê bi gîyane xwe re wê rastî encamên wê yên bi başî û nebaşîyê re wê were.

Mirov, li vir, hinekî li ser rewşa fahmkirinê re jî wê, divê ku wê hilde li dest. Fahmkirina bi rengê ´dema ku mirov ya baş zanibê, mirov wê ya nebaş jî têbigihê´ wê weke têgîneka serdema kevn a dûalîsmê bê. Lê mirov, li vir, vê yekê jî, divê ku werênê ser ziman bi pêşketina aqilê mirov re ev jî dihê dîtin ku mirov, aliyê baş, wê tenê di derbarê têgîna başîyê de wê xwediyê wateyê bê. Wê tenê ji aliyekî ve wê ya ne baş wê, têgîna wê bide me. Lê giştîya têgîna nebaşîyê, ne li ser başîyê re lê li ser encamên nebaş re mirov wê têbigihê. Yanî, bi gotinaka din, wê dema ku ew rewşa têgîna nebaş, ku ew ji aliyekî ve weke rewşek nêrênî ku ew heya, ku ew bi encamên xwe re wê têgihê. Dema ku şev nebê, û tenê roj hebe, ku mirov wê tenê rojê bijî, mirov wê çawa zanibê ku ew şev heya? Ev jî, weke rewşek ku mirov li vir, dikarê wê bi serê xwe fahm bike. Her çendî ku têkilîya şev û rojê bi rengê jîyankirina me ya di jîyanê de re ku ew heya jî lê wê ew, rewşa şev û rojê, wê tenê di rewşek dewrûdayimî a di jîyanê de re wê ew hebe. Li vir, mirov, dema ku şevê jî û rojê jî wan hilde li dest, weke hûrgilna, mirov dikarê wan bi serê xwe têbigihê. Her wusa, Mirov, wê karibê wê fahm bike.

Lê bi wê re ev jî heya ku mirov divê ku wê baş fahm bike ku rewşa têgîna şev û rojê ku roj rohnî ya û şev tarî ya, wê bi rewşa hevdû a vajî hevdû re wê ne wekhevîya hevdû jî wê bi xwe re wê bidina dîyarkirin. Şev, weke rewşekê heya. Roj jî, weke rewşekê ew heya. Mirov, dikarê hebûna wan yek bi yek û ji hevdû cuda têbigihê. Her wusa, di vê çerçoveyê de ew rewşa têgihiştina wê ya ku ew roj a û ankû şev a, wê ji aliyekî ve wê bi serê xwe jî her yekê wê mejiyê me, wê karibê wê derk bike. Lê li vir, dema ku şev dibê sînorê rojê bi tarîya xwe bi xwe re û roj jî dibê sînorê şevê bi rohnîya bi xwe re wê, hingî ev rewş, wê di çerçoveyek ji şevê li rojê û ankû ji rojê li şevê wê bûhûrîn, wê bibê. Hingî, wê bi şêwayekê, wê ev jî wê bê temenê wê ku mirov dizanê ku şev di wê de tarî heya û ne rohnîya heya. Bi heman rengî mirov wê, wê jî têbigihê û fahm bike ku wê di rojê de rohnî hebê ku ew jî ne tarîya. Di vê çerçoveyê de ji hevdû cuda kirina tarî û rohnîyê bi rojê re wê ji aliyekî ve wê bê rengê rojê û şevê jî. Rengê rojê rohnî ya. Rengê şevê jê wê tarî bê.

Têgîna rojê a bi rohnîya wê re wê weke aliyê baş, wê were dîtin û hanîn li ser ziman. Bi heman rengê, wê şev jî wê bi tarîbûnê re wê weke aliyê nebaş wê were şîrovekirin û hanîn anîn li ser ziman. Rohnî, wê weke aliyê ku ew bi jîyanê re ew hebe, wê were ser ziman. Lê tarîtî jî wê aliyekî wê jîyanê ê reş bê. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de ev dûalîteya ku ew di jîyanê de mirov, wê di jîyanê de wê bi bûyîna şev û rojê re wê kifş dike, wê weke aliyekî ku ew ahengekê jî wê li ser derûnî û hwd re wê bi jîyane zindîyan re wê bide çêkirin bê. Di dema rohnîyê de wê mirov şîyar û bi tevger bê. Lê bi dema şevê de ku ew tarîtî ket ardê de wê herkesek razihê û wê di dema razandinê de wê xwe rehet bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê ev jî wê weke du aliyna ku wê bi jîyankirinê re wê her zindî wê mihtacê wê bê. Bo ku ew jîyan karibê hebûna xwe bide domandin,

wê vê dewrûdayimîtîyê wê bi xwe re wê bijî. Ji vê yekê, mirov fahm dike ku wê jîyane li dunyê, wê tenê wê hebûna ardê, hewa û avê bi tenê re w hebê. Her wusa, ev rewş jî wê ji aliyekî ve wê biqasî wê wan rewşên weke av, hewa û axê, wê di jîyane her zindîyî û domandina wê de wê xwediyê temenekê bê. Di vê çerçoveyê de wê ew ahenge ku ew bi jîyanê re ew hatî çêkirin, wê di nava wê de wê her zindî wê jîyane xwe wê bide domandin. Bi roj di rohnîyê de wê bi tevger û şîyar bê. Bi şev jî wê di tarîyê û reşîyê de wê bêtevger û razahî bê. Her wusa, piştî wê jîyankirin û şîyarbûyîna di rojê de wê zindî di şevê de wê weke zindîyekê ku ew wastîyayî û ji tevgerê ketî wê xwediyê rengekî bê û wê xwe bide alîkî li bêhvedanê. Wê di wê rewşa bêhnvedanê de wê bijî heta ku ew şev derbas bibê. Her wusa wê dema ku şev bi dawî bû û roj derket û rohnî hat û pê de wê her zindî wê şîyar bê. Wê di nava wê rojê û rohnîyê de wê bi awayekî ku ew bêhnvedayî wê bidest jîyankirinê bike bi şîyarî. Ji destpêka derketina rojê û heta çûna avayê a rojê, wê di wê şîyarîyê de wê bijî. Piştî dawîya rojê hat û pê de wê, êdî wê bidest xwe kişandina li bêhnvedanê bike. Wê xwe dirêj bike û razihê. Ev rewş, wê weke rewşek jîyanî a dayimî bê. Şev û roj jî, wê rewşna jîyanî ku wê jîyanê bi xwe re bi vê rengê wê biadilênin ên dayimî li dûv hevdû ku ew tên û dibin bin. Wê di vê çerçoveyê de wê ev dûalîteya bi dewrdayimîya şev û rojê re wê ahengek di mejî û derûnîya giştî a her zindîyî de wê biafirê.

Rewşa têgîna gîyanê wê bi aqil re wê xwediyê nasîneka di mejî de bê. Di vê çerçoveyê de wê aqil wê weke ku ew hatî bi wasifkirin bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku rewşa gîyan û aqil, wê bi hevdû re dem bi dem wê were hanîn li berhevdû jî. Her wusa, di serdemên piştre ên felsefeyê û pêşketina wê de wê, di çerçoveya hebûna aqil de wê ew were hanîn li ser ziman. Lê li vir em dema ku bi têgîna dualîsmê re li wê bihizirin, em divê ku wê di çerçoveya rastîtîyeka dûalîtîkî de wê werênina ser ziman.

Rewşa gîyanê, wê her wusa wê di çerçoveyek têgînî de wê xwediyê serwerîyeka li mirov jî bê. Di vê çerçoveyê de mirov, wê dikarê wê werênê ser ziman. Li vir, ew têkilîya laş û gîyanê a dûalîtîkî wê piştre weke ku wê Manî bi şêwayekê wê werênê ser ziman, wê di çerçoveyek dûalîtîkî a têkilîya aqil û bedenê de jî wê xwediyê rewşek hanîna li ser ziman bê. Li vir, rewşa têkiliya aqilê mirov ê li ser rastîya bedene mirov, wê di vê çerçoveyê de wê werê hanîn li ser ziman. Di serdemên zanyarîyê de wê, têgînên weke derûnîyê û ankû newrolojîyê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê têgînna ku mirov dikarê wan bibîr bike bê. Têkiliya nava zêhn û ankû aqil û bedenê, wê di rewşek çawa de bê, wê her wusa çawa ew were hanîn li ser ziman, wê li ser wê serî bi wastênê. Bi wê re jî wê, bandûra aqil a li ser bedenê û ankû wê rewşa têkilîya aqil û bedenê wê ew bi wê re wê were hanîn li ser ziman.

Her mirov, wê weke mirovekî ku ew xwedî aqil bê, wê karibê bihizirê. Lê her hizirkirina her mirovî jî wê ne weke hevdû bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku wê çendî di dîmenekî de wê weke

hevîyekîyek wê hebe jî di navê de lê wê, ew nebê. Di vê çerçoveyê de wê dema ku ne hevdû hizirkirinê ku mirov wê werênê ser ziman, li vir, wê weke ku wê pirsgirêkêk fahmkirinê a bi rewşa vê rengê fahmkirinê wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, ne wekehevdûbûn jî û weke hevdûbûn di hevîyekîyekê de bûyîn wê di dîmenekî dîtbarî de wê xwediyê rengekî dîtinî bê.

Rewşa fahmkirina bi aqil re gîyanê a bi laş re wê di çerçoveyekê weke ya hevyekîyekê de wê xwe bide dîyarkirin. Di nava wê têgîna dûalîteyê de wê, hevîyekîya nava du rewş û ankû heyînan wê weke rêgezekî dûalîtîkî a ku ew bi wê di çerçoveyek beremberî hevdû de wê dike ku wê fahm bike bê. Rewşa têgîna hevyekîyê, wê di vê çerçoveyê de wê bi şêwayekî wê hebe. Têkilîya nava laş û gîyanê û ankû nava zêhn û bedenê, wê di vê çerçoveyê de wê bi şêwayna darêjkî wê xwedîyê hinek şîroveyna ku wê bi wan re wê ew werênina hanîn li ser ziman bin. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku wê têgîna gîyanê wê weke têgîneka ku wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka zêhnî û di çerçoveya heyîna zêhnîyê de jî wê xwediyê wateyê bê. Li vir, rewşa fahmkirina zêhn û gîyanê, wê di şêwayekî de wê rewşa fahmkirina laş û bedenê a bi hevdû re di hevyekîyekê de bê. Di vê rewşa zêhnî a gîyanî de wê li vir, çendî ku wê weke rewşek aqilî wê werê hanîn li ser ziman de jî lê wê piştre ew rewşa darêjkî û pêşnûmeyî a zêhnî ku ew afirî û bi hiş bûya, wê ew weke rewşek heyînî wê xwediyê têgînekê bê. Li vir, rewşa hebûna zêhnê, wê di vê çerçoveyê de wê li ser rewşa aqilê mirov re wê li ser wê çerçoveya wê re wê ew weke rewşek hebûnî a bi hiş bûyî wê xwediyê rewşek heyînî bê. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî bi wê re wê werênê ser ziman ku wê rewşa zêhnê, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek bi hebûn, wê piştî bûyîn û bi hişbûnê re wê ew hebe. Di rewşa fahmkirina laş û ankû bedenê de wê aqil, wê rewşa têgîna laş û ankû bedenê wê bi xwe re wê bi hiş bike. Heyîna laş û bedenê bi hişkirina wê, wê weke ku wê ew hişê wê bixwe, weke ku ew dibê ew laş û ankû ew beden bixwe jî.Di vê çerçoveya vê têgînîya aqilî de wê rewşa fahmkirinê wê, li wê rewşa fîzîkî ku ew ji wê bi hiş bûya, wê ew wê weke rewşa rengê wê darêjkê wê bi xwe re wê bi têgînî wê ji aliyekî din ve jî wê bi hiş bike û wê li ser wê re wê bike ku wê bi başî fahm bike. Di rewşa têgînên weke başî û ankû nebaşîyê de wê ev têgîn, wê weke têgînna ku mirov wan dikarê weke têgînna nirxî û darazî wê werênê ser ziman. Ev li ser rewşa aqilê dahûrî ê darêjkî û hwd re wê weke rengekî hişkirinê ê ku wê mirov wê bi wê re wê wasif bike bê.

Li ser têgîna gîyanî re wê hertimî wê weke rewşek têgînî wê were hanîn li ser ziman. Di aslê xwe de li vir, ku mirov rewşa têgîna felsefîkî a mengîwerî û ankû ´îdealîsmê´ ku mirov wê hilde li dest, wê weke têgîneka ku wê bike ku ew rewşa gîyanê bi aqil re û ankû li ser aqil re wê fahm bike bê. Ev têgîn jî wê gîyanê dervî aqil weke darêjkekê wê hilde li dest û werênê ser ziman. Li ser wê re wê hewl bide ku wê gîyanê, weke serwerîya hertiştî wê fahm bike. Piştre ku

ew di têgîna xwe de kûr dibê jî wê, her tiştên ku ew li jîyanê hena ên wek rewşên fîzîkî jî wê weke rewş û tiştên ku wê di ancama wê hizirkirina wê gîyanê de ku ew bûna bin. Di rewşa fahmkirina têgîna gîyanê de wê têgîna mengîwerî, wê her wusa, wê weke têgîneka bi navê gîyanê, wê li vir wê xwediyê wê rewşa têgîna serdestîyê bê. Çendî ku wê gîyan wê serdest bê bi serwerî, wê ev têgîn wê weke têgîneka ku ew jî bi wê re wê serdest bê. Em li vir, nikarin vê rewşê ji wê cudatir wê werênina ser ziman. Lê li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê bi demê re wê şîroveyên demkî ên ji hevdû cuda ên vê bi vê têgîna mengîwerî jî wê biafirin. Di hinek têgînên weke weke yên mengîwerî de wê hebûna rewşa fîzîkî wê were herêkirin. Di vê çerçoveyê de wê têgînên mengîwerî ên **camîdî**(*) wê xwe bidina dîyarkirin. Mirov dikarê ji wan re wan weke mengîwerîyên camîdî û ankû ´îdealîsma camîdî´ wê werênê ser ziman. Ev wê di encamê de wê hebûna rewşa fîzîkî a li jîyanê wê herê bike. Lê wê weke afrînerîyê wê, wê ew hebûna ´xwûdê´ wê weke gîyane afrîner wê werênê ser ziman. Wê hertiştî ji hizirkirina wê wê gîyanê ku ew diafirê, wê ew wê werênê ser ziman. Şêwayê hanîna wê ya li ser ziman, wê di vê çerçoveyê de bê. Lê bi wê re em dema ku rewşa têgîna mengîwerî wê hinekî jî wê bikin ku wê fahm bikin, wê her wusa, ji aliyekî din ve jî wê rengê mengîwerîya kirdeyî´ wê hertiştî di hundurê aqil û di çerçoveya aqil de wê fahm bike, wê derkeve li holê. Ev jî, wê weke rengekî wê ya hanîna li ser ziman bê.

Têgîna mengîwerîya kirdeyî û ankû îdealîsme kirdeyî, wê di vê çerçoveyê de wê di şêwayekê de wê dernekeve dervî wê rewş û çerçoveya bi aqil ku ew afirîya û heya bê. Li gorî vê rewşa têgîna mengîwerîya kirdeyî jî wê her tişt ji dîtina mirov wê pêkwerê. Wê mirov, di wê çerçoveyê de wê, dihizirê û ew heya. Heta ku mirov wê dihizirê ew heya. Piştî ku mirov ew hizirnekir wê ew nebê. Yanî, bi gotineka din, wê ew tişt wê bi hizirkirina me re wê hebe. Ew zanîna wê ya tiştî jî wê, wê encama wê tişta ku mirov ew hizirkiriya, wê zanîna wê bê. Yanî bi gotinaka din, wê ew rewşa wê ya ku ew bi zanînî wê hebe, wê ew tenê weke rengê hizirkirina me wê hebe. Di vê çerçoveyê de wê hertişt wê bi rewşa hizirkirina li ser darêjkê û hizirkirina bi wê re wê hebe. Ev rengê hizirkirina şêwayê hizirkirina mengîwerîyê, wê weke şêwayekê hizirkirinê ku wê hizirkirinê û hizirînê wê derxe li pêş bê. Di vê çerçoveyê de wê rengekî hizirkirinê wê hebê. Tişta ku wê di jîyanê de wê hebe, wê ew tişt di aslê xwe de wê nebê. Ber ku mirov wê tefkîr dike û wê dihizirê wê ew hebe. Li gorî vê têgînê wê tişt nebê û mirov nikaribê destlê bide. Ew rewşa destlêdanê wê rewşeka ku ew sehên me li ser rêyên sehên me re ku ew diafirênê a bi aqil bê. Yanî, ew hîs bi me re çê dibê ku me destlêda ya. Lê tenê hertişt ji wê hîsê û pê de wê nebê. Lê mijara tişta ku ew li jîyanê heya û mirov dest li wê dide û hwd, li vir, wê ji aliyekî ve din wê li ser rewşên fîzîkî û hwd re wê têgîna pêzawerîyê

----------

(*)hizrî

û ankû ya ´metalyalismê´ bi xwe re w bi pêşxistin. Ev têgîn jî wê di wê çerçoveyê de wê rewşek fîzîkalskî wê esas bigirê. Wê li gorî wê têgînê wê bihizirê ku mirov, heta ku tiştê û ankû rewşa fîzîkî nebînê û wê derknekê, mirov wê nebê xwediyê zanînê. Her wusa, rewşa gihiştina zanînê, wê li ser rewşa fîzîkî û ankû a tiştayî re bê. Tişt, hebûn û ankû rewşa fîzîkî ber ku ew heya, mirov wê derk dike û digihijê zanîna wê. Dema ku kevirekê nebê, mirov mirov wê, wê kevirê nebînê û negihijê zanîna wê. Her wusa, dema ku mirov nebînê ku şev û roj heya, mirov wê negihijê têgîna şev rojê ku ew heya. Yanî, rewşa fîzîkî a ku ew dibê, wê li di temenê gihiştina zanînê de bê. Li vir jî wê gihiştina zanînê, wê bi rêyên weke dîtina bi çav, bihîstina bi gûh, destlêdana bi dest, tahm û ankû têjkirina bi ziman û destlêdana bi bîyên me re ew dibê. Wê rêyên gihiştina zanînê wê di vê çerçoveyê de bê. Têgîna pêzawerîyê jî wê li vir, wê ji aliyê rewşa têgîna bûjenîkî ve wê di asta pêşî de wê bûjenê wê di temen de wê weke temenê gihiştina zanînê wê werênê ser ziman. Ev rengê hanîna li ser ziman a bi bûjenê, wê temenê gihiştina zanînê wê bûjenê û rewşa fîzîkî û hwd wê di temen de wê esas bigirê û wê werênê ser ziman. Ev rewşa rengê hanîna li ser ziman a têgîna pêzawerîyê, wê tenê aliyek bê. Lê aliyê din jî wê, her wusa wê têgîna weke ya ku ew dihênê ser ziman ku ´bûjen heya û zanîna wê heya ku mirov dike ku wê bibînê û wê fahm bike bê.´ Yanî, weke tiştekî amedeyî li pêşîya me ku ew heya, tenê ya ku wê li me bikeve ku ew heya û tenê ku mirov karibê xwe bigihênê wê. Ev rewş, wê her wusa têgîneka pirr stûr û ne kûr wê xwe li ser rewşa têgîna bûjenê û fahmkirina wê re wê bide dîyarkirin.

Rewaş gihiştina têgîna tiştê, wê di vê çerçoveyê de wê di nava têgînên felsefîkî de wê di vê çerçoveyê de hem ji aliyê rewşa fîzîkî û bûjenîkî ve ku wê bi pêzawerî wê were hildan li dest û hem jî ji aliyê rewşa têgîna kirdeyî, aqil û derkirinê ve ku wê bi mengîwerî wê werê hildan li dest, wê di çerçoveyek dûalîtîkî de wê xwediyê wê rewşa fahmkirina bi rewşa hebûnê û rewşa heyîna jîyanî re bê.

Têgîna şîroveya pêzawerîyê jî û ya mengîwerîyê jî wê di vê çerçoveyê de wê ew her yekê ji aliyê xwe ve wê yekalî wê bimênê. Ev hîs, wê li ser herdû aliyan re wê bi xortayî wê bi mirov re wê çê bibê. Lê di çerçoveyekê de hanîna li ser ziman a dûalîtîya pêzawerîyê û mengîwerîyê bi hevdû re li ser ziman, wê di çerçoveyek rastîtî û ankû ´realîsmî´ de ku mirov wê bi dûalîteyek giştî de wê herdû aliyan bi hevdû re weke di çerçoveya hevyekîyekê de wan bi hevdû re hilde li dest re wê, hingî rewşa fahmkirina wê rastîya wê ya bi dûalîtîkî wê ji aliyekî ve wê xwe bide dîyarkirin. Têgîna rastîtîyê û ankû realîsmê, em li vir, divê ku wan herdû alîyên pêzawerî û mengîwerî ji aliyê wan ve weke dû alîyên heyî û mirov dikarê wan derk bike, divê ku mirov wan hilde li dest. Di vê çerçoveyê de wê têgîneka dûalîsmê jî wê di çerçoveyek realîstîkî û ankû rastîtî de wê di têgînek hevyekî de wê dûalîtîyê wê herê bike û wê bi wê re wê werênê ser ziman. Li ser wê re wê, bike ku wê rastîya têgînî ya bi aqil û ya rewşa fîzîkî

a bi tiştayî û ankû bi camîdî ku ew xwe dide dîyarkirin li jîyanê ku mirov wê fahm bike. Rewşa têgîna camîd û kirdeyê di vê çerçoveyê de wê li ser rewşa aqil re ku wê bi rengê derkirina ji rewşa fîzîkê û ankû bûjenî wê bibê, wê xwe bide dîyarkirin. Em dema ku vê rewşê bi rastîtîya dûalîtîkî re wê bikin wê hildina li dest, wê li vir, rastîtîya dûalîtîkî wê ew bi xwe re wê têgînê wê bide me di çerçoveya herêkirina dûalîyan de bi hevdû re di hevyekîyekê de wê, rewşa fahmkirina têgîna kirdeyî a ji têgîna camîdî û hwd, wê weke rewşna ku ew bi hevdû re di hevyekîyekê de bi hevdû re di di nava hevdû de ew hena bin. Ji aliyekî din ve jî wê têgîna rastîtîya dûalîsmê ku ew rewşa gîyanê û laş, aqil û bûjenê, rewşa fîzîkê û ya zêhnê û hwd ku ew ji hevdû cuda jî dikarê wê bihizirê, wê di vê çerçoveyê de wê di rengê vê têgîna rastîtîyê de wê xwe bi aqilê me re wê weke ya bi mantiqî wê bide dîyarkirin. Em li vir, dema ku herdû aliyan ji hevdû cuda û serbixwe wan şîrove bikin û wan werênina ser ziman, wê çaxê, di vê çerçoveyê de em dema ku ji aliyê pêzawerîyê û têgîna wê ya bûjenî ve wê hilde li dest, wê hingî wê ew têgîna wê ya bûjenî wê hişmendîya xwe wê bi xwe re wê bide çêkirin bê. Em ji ji aliyê din ê mengwerîya kirdeyî û aqilî ve wê hilde li dest, wê çaxê, ew aqilê ku ew heya, wê xwedîyê wê sîyan û karînê bê ku ew karibê rewşa xwe ya fîzîkî û bûjenî jî wê bi afirênê. Her wusa di roja me de wê, rewşa bi teknîkê û înternettê bi bernemeyên wê û hwd re ku mirov wê hilde li dest, wê di heman rewşê de wê ev rewşa rastîtî û ankû realîsmî wê xwe bide dîyarkirin. Têgîna realîsmê, li vir, di vê çerçovey de wê weke ku wê li ser aliyê xwe mengîwerî ve ku ew li gorî wê têgînê dikarê bibê xwediyê wê karîna afirandinê, wê hingî bi wê re wê pêdîvîya aqilekî kirinî û ankû piretîkî û pêşxistina wê, wê di jîyanê de wê zêdetirî wê bide nîşandin. Her wusa ev jî, wê weke aliyekî wê têgîna dûalîtîkî a ku mirov wê li ser aqil û pêşxistina aqil re wê bi zêdeyî fahm bike û wê pêşbixe bê. Lê em li vir, vê yekê jî werênina ser ziman ku wê ev alî, wê çendî ku wê weke bi têgînî wê biserbixweyî wê xwe bidina nîşandin jî, lê wê weke ku li hevdû hoyandî jî bê ji aliyekî ve. Ya ku wê, hinekî jî wê temenê wê bê ku bûjenîya pêzawerî ku ew karibê hişmendîya xwe bi aqilî pêşbixe û ankû li rexê din ku ew mengîwerîya kirdeyî ku ew li ser darêjkê û hwd re ku wê karibê rewşa xwe ya fîzîkî û piştre bûjenî û hwd jî wê pêşbixe, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê temenekê jî bê.

.

**Monîsm, realîsm û dûalîsm**

Di dewama rewşa fahmkirina mijara ´ yekîtî, başîûnebaşî û metafîzîka dûalîsmê´ de em, divê ku em rewşa têgîna realîsmê û monismê jî hildine li dest. Li vir, em di serî de divê ku serî li dema dûalîsme kevn bixin. Serdemên dûalîsma kevn de wê were were bawerkirin ku wê her tişt ji tozekê wê destpê bikê. Wê bi têgîna destpêkekê wê bê hanîn li ser ziman. Di vê xate felsefîkî de herwusa li gorî têgîna felsefîkî bi têgîna ´destpêkê´ re hanîna li ser ziman

felsefeya ´mirovê pêşî Yîma(*)´ jî wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê wate û têgînekê bê.

Destpêka jîyanê, wê çawa wê were destpêkirin? Wê, weke mijarekê mirov divê ku wê li rewşa têgîna felsefeya xate yazdanîyê binerê û wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de wê rastîya wê wê baştirîn wê were fahmkirin. Di nava felsefeya yazdanîyê de wê çêbûna hebûna jîyanê bi destpêka wê re û her wusa hebûna zindîyan, wê di vê çerçoveyê de wê bidestpêkekê wê were hanîn li ser ziman. Elementên weke av, agir, hewa û ax, wê hinek ji wan elementên ku wê di şîrove û vegotina di derbarê jîyanê û afirînê de ku wê di temen de wê werina esasgirtin bin. Di nava yazdanîyan de bi bawerîya ku wê her tişt ji êgir bibê, wê weke elementa pêşî, wê agir wê were hanîn li ser ziman. Her wusa di dewama wê de vegotina bûyîna ardê û ´meyîna wê´ wê, weke têgîneka ku em li vir divê ku serî li wê bixin bê.

Temenê hebûna jîyanê wê di vê çerçoveyê de wê bi têgîna bi destpêkekê wê were hanîn li ser ziman. Her wusa, wê weke destpkeê ku wê nûqteyek û ankû tozek wê ji wê ew destpê bibê, wê werê hanîn li ser ziman. Di destpêkên berê ên kevn ên dema sûmerîyan de wê, bê bawerkirin ku wê ´mirov, ji axê bûya´ bê. Ev têgîn, wê piştre wê bi têgîna ku hemû mirov wê ji axê bin re wê bikeve nava nakokîyê. Wê di nava wan de nîqaş û dijberîyên felsefîkî wê biafirin û wê bên hanîn li ser ziman.

Di vê çerçoveyê de elemenên agir û axê, wê di vê çerçoveyê de wê weke elementna wê werina hanîn li ser ziman. Lê bi wê re wê bi demê re wê rewşa li pêşîya elementên agir û axê danîna elementa ´hewayê´ wê derkeve li pêş. Em j inava çîrok û çîvanokên civake kurd, bi awayekî vekirî ku wê bibînin ku wan bi wê bawer kirîya wê, mirov wê ji hewayê jî bin. Ev jî, wê li ser têgîna ´acînîyan´ re wê werênina ser ziman. Di vegotineka ku em dikarin weke vegotina afirandinê a civakî ya nava kurdan jî wê werênina ser ziman, wê bê gotin ku ”wê mirov, dema ku ew bûn, wê ji dû tiştan wê bibin. Tişta wê wê ji axê bin. Yên ku wê ji axê bin, wê ew mirovên weke me bin. Lê wê tiştakî din jî hebê ku wê ji wê bibin. Ew jê hewaya. Ew jî acînî na. Ew dikarin xwe bikine her rengê û şeklê de. Ew dikarin di nava hewayê de bifirin. Ew, wê ti astengî di ti kirinê de wê li pêşîya wan nebê.” Ev rengê hanînîya li ser ziman, wê dewama wê jî wê hebe. Ew jî wê di vê çerçoveyê de bê ku wê dema ku ev herdû rengê zindîyan weke mirovan bûn, wê yazdan, wê perdeyekê di nava wan de wê bikişênê. Wê hinek li bin cilikê bin û hinek li ser cilikê bin. Yên li ser cilikê na, em mirov in. Yên ku wê dibin cilikê de jî bin, wê acînî bin.´ Wê bi vê rengê wê farqe nava wan, wê were dîtin.

Piştre jî wê di vê çerçoveyê de wê bi wan re wê bê hanîn li ser ziman ku wê wê ew bi hevdû re wê di jîyanê de wê bijîn. Lê wê temenê wan ne weke hevdû

-------------

(*)Yîma wê weke mirovê pêşî ê di mitolojiya kurdistanê de ku ew hatîya afirandin bê.

bê. Wê acînî, wê bi şêwayekî wê xwediyê jîyanek sermed bin. ´Wê pirr dirêj wê bijîn. Lê wê mirov wê xwediyê temenekî kin bin.´ Ev rewş û şêwayê vegotinê wê bi demê re wê her wusa, di çerçoveya hewldanên vegotinan afirandinê de wê temen ji vegotinên bi têgîna afirandinê re wê biafirênin. Rewşa têgîna ´afirandinê a mirovan weke acînîyan´ wê, wê di çerçoveyeka ku ew ne tabîîî kişnîna ardê na, wê werina hanîn li ser ziman. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bin. Bi vegotinên ku wê di wan de wê acînî wê werina hanîn li ser ziman de wê, têgînên ku ew bi rengê aqilê ku wê di wê de kişîna ardê wê serdest bê wê nebê. Di vê çerçoveyê de wê bi reng û şêwayekî din wê bê nivîsandin. Wê têgîna afirandinê wê di vê çerçoveyê de wê hewa, wê weke rengekî wê yê temen wê werê hanîn li ser ziman.

Bi wê re jî wê di şêwayekî wê li ser avê re jî wê werênê hanîn li ser ziman. Minaq, em di destana afirandinê yazdanê hûrîyan a Kumarbî de wê kifş dikin ku wê ew bi alikarîya keça yazdanê bahrê *´Šertapşuruhî´*(*) aferendêrîyê bi navê *´Hadammû´* wê ji avê wê biafirênê ku ew karibê wî li jîyanê serdest bike. Ev rengên vegotinî ên ku wê, bi şêwayekî mîtolojikî wê werina hanîn li ser zima, wê di demê de wê reng û temenekî bawerkirinê wê bi xwe re afirênê. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê werê hanîn li ser ziman. Di vê destana afirandinê dema hûrîyan de wê av wê weke elementeka ku wê pêşî ji wê jîyan wê were afirandin bê.

Rewşa van her çar elementên ku wê weke elementên bingihînî bin di rengê vegotina hanîna li ser ziman a afirandin, jîyan û domandina jîyanê de wê, piştre jî wê li ser wan re wê li dora wan, wê hizirkirinên felsefîkî wê li ser têgînên bawerîyan re bin û ankû wê li ser rengna vegotinên civakî ên hizirkî û hwd re bin, wê bên hanîn li ser ziman. Di rewşa fahmkirina van elementan weke elementên bingihînî ên ku ew temenê jîyanê û afirandinê na û ankû ji wan destpêk bûya, wê di vê çerçoveyê de wê piştre rengê hizirkirinê jî wê bi awayekî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin.

Em li vir, divê ku vê yekê jî wê werênina ser ziman ku wê ev her çar element, wê di nava têgîn û rengên bawerîya yazdanî de wê di pêvajoyên wê yên bi hezaran salan ên civakî û bawerîyî ku wê li mesopotamiya û ankû li kurdistanê wê bijîn de wê weke elementna temen bingihînî ên hîmî bin. Di nava bawerîya yazdanîyê de wê ev her çar element, wê bi şêwayekî wê di nava rengê bawerîya wê de jî wê werina hanîn li ser ziman. Elementa axê, wê piştre di pêşketina olên semewî de wê, weke elementek temen û bingihînî bê ku wê bi wê bawer bike ku wê ´mirov, wê ji axê wê hatibê çêkirin.´

Ev rengên bawerkirina ku wê têgînek, tozek û ankû elementek wê destpêka jîyanê û ankû afirandinê wê ji wê bê, wê temenê wê têgîna bi destpêkî a di derbarê jîyanê û afirandinê de jî bê. Wê bê bawerkirin ku wê destpêkek, wê bibê

----------

(*)Keça yazdan komarbi ya. Wê eferendiyê bi navê hadamû tê gotin afirand bi destûra komarbi.

û wê piştre di dewama wê de wê weke tovekê ku ew hatî çandin ku ew piştre ew tov mazin dibê û dibê dar û wê gelek çiqil wê bi wê darê ve wê bibin, wê di vê çerçoveyê de wê bê hanîn li ser ziman. Li vir, wusa dihê dîtin ku wê têgîna dûalîsmê, wê di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka ku em divê ku wê têgîna monismê jî di vê çerçoveyê de wê, bi wê re bigihênina wateyekê bê. Zerdeşt, wê di dema xwe de wê li ser ahrîman û ahûramazda û bavê wan ´zerwan´ re wê bike wê rewşê şîrove bike û wê werênê ser ziman. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê bike ku wê di ahengekê de wê bi hevdû re wê werênê ser ziman. Her tişta ku ew yek a, wê di xwe de du bê. Weke têgîna rewşa fîzîkî û zêhnê û hwd.

Rewşa fahmkirina têgîna dûalîsmê li vir, wê di vê çerçoveyê de wê weke dû alî û ankû hebûnên ku ew hena re wê xwediyê rewşek û têgînek rastîtî a fahmkirinî bê.Rewşa fahmkirina destpêka gerdûnê û ankû fezeyê de wê her wusa Zerwan wê feze û zamanê wê bi hevdû re wê bi hebûna xwe re wê werênê ser ziman. Wê di hundurê wê de wê Ahrîman û ahûramazda weke dû têgînên ku w yek baş û ya din nebaş bê û ku ew li dijî hevdû na, wê bi hevdû re wê gerdûnê wê bi rêve bibin. Wê di hundurê wê gerdûnê û fezeyê de wê weke du vejenên ku ew yek baş û yek nebaş in jî wê hebin. Ew jî wê yek hertimî bi aliyê nebaş de wê bikişênê û ya nebaş wê bide kirin. Ya baş jî wê vajî wê, wê hertimî wê ya baş wê bikê ku wê bide kirin. Wê di vê çerçoveyê de wê di nava wan de wê ahengek wê di jîyanê ku ew didomê de wê hebe. Ev rewş, wê heta ku wê jîyan hebe jî wê hebe. Di vê çerçoveyê de wê, di nava wê rewşê de wê jîyan wê dayimî wê xwe biafirênê. Wê zêde bibê. Wê sînorê wê fireh bibê. Her tişt, wê li vir, wê di vê çerçoveyê de wê di wê de wê ji ya baş jî û ya nebaş jî wê hebe. Lê wê di ahengekê de bê.Wê aliyê nebaş, wê hertimî wê bike ku wê ahengê xira bike û wê bi aliyê nebaş de wê bidê. Wê di vê çerçoveyê de wê hertimî wê tekoşînek di nava başî û nebaşîyê de wê hebe. Ev wê li ser tevger, kirin û gotinên mirov re jî wê xwe bide dîyarkirin. Çendî ku mirov ya ne baş kir û got, wê weke ku wê bi aliyê nebaş ve wê xwe bidiyê de. Ev jî, wê weke têgîneka bi bawerî wê bi têgîna dûalîtîkî re wê xwe bide hanîn li ser ziman. Di vê rewşê de rewşa fahmkirina rastîya jîyanê û destpêka wê jî wê, ji tozekê wê bê dayin destpêkirin. Ankû wê ji nûqteyekê wê bê dayîn destpêkirin. Zerwan, ji aliyekî ve wê navê wê destpêkê jî bê di vê xate têgînî de.

Têgîna başîyê û ne başîyê wê di nava wê demê û gerdûnê de wê bicih bibê. Wê ew hevdû di ahengekê de wê bigrin. Rewşa têgînîya dûalîtîkî li vir, mirov dema ku wê dihizirê, wê her wusa, wê bi têgîna dûîtîyê, wê di çerçoveyek têgînî a pirralîtîyî de wê xwe bide dîyarkirin. Em dema ku wê têgîna wê ya dûalîtî li wê dihizirin,wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Têgîna monismê, wê li vir, wê weke têgîneka ku ew bi teybetî li ser mijara destpêkê wê xwe bide hizirandin bê, wê bi wê re wê hewl bide dayîn ku wê fahm bike ku ew destpêka jîyanî çawa bûya. Li vir, em dema ku wê dikin ku wê rewşê fahm bikin, em

dibînin ku wê hinekî piştî Zerdeşt re wê Manî(*), wê zêdetirî wê bi têgîneka ew dike ku wê rewşa têgînî a gerdûnî wê bi têgînek fezeyî wê hilde li dest û fahm bike. Rewşa hizirkirina Manî a weke hewldana fahmkirina wê têgîna dûalîtîkî bi têkoşîna di nava tarîtîyê û rohniyê re wê ew mejiyê xwe wê li ser wê re wê bide hizirandin. Manî, wê di xwe de wê pirr zêde wê bihzirê. Wê bike û bixwezê ku ew nepenîyên di temenê jîyanê de bi gihiştina fahmkirina nepenîya reşî û rohniyê re wê fahm bike. Li vir, Manî, wê di şêwayekê de wê metafîzîkekê bi aqilê felsefîkî ê zanînî wê pêşbixe û wê li ser wê re wê pêde herê. Rewşa Manî, fahmkirina wê, wê her wusa wê di çerçoveya fahmkirina têgîna dûalîsmê a hemdem û her wusa têgîna wê ya metafîzîkî jî ku wê di nav de wê, mrov di nava wê de wê bike ku wê hinekî bi zanîn bike. Zerdeşt, wê di pêşxistina fahmkirina dûalîsmê de di xate yazdaniyê de wê pêvajoyek giring û dîrokî bê piştî ya Mîtra û mîtrawaniyê re. Lê Manî, wê piştî hemûyan wê di rewşek hemdem û bi aqilê zanistî ê hemdem de wê, wê rewşê wê bixwe re wê bide domandin.

Têgînîya dûalîtîkî a hemdem, bi aqilê felsefîkî ê hemdem ê zanyarî wê Manî, wê di wê de wê weke destpêkekê bê. Di vê çerçoveyê de hewldana fahmkirina nepenîyên wê yên stêrzanî, gerdûnî, jîyanî û aqilî û hwd, wê Manî, di van waran de wê gevek pêşketî a li pêş bê.

Di rewşa fahmkirina fezeyê û ankû gerdûnê, jîyanê, mirov, jîyanê, jîyane mirov, başî û nebaşîyê, rastteqînîyê û hwd, wê mijarên ku wê bi aqil re wê li ser wan re wê zêdetirî wê serî wê were wastandin bê. Mijara felsefeya dûalîsmê a teorîkî a hemdem, wê di vê çerçoveyê de wê li ser mijaran û her wusa mijarên têgînî ên metafîzîkî re wê gevekê herina li pêş. Li vir, ji destpêkê hewldana fahmkirina jîyanê û bi wê re di nava jîyanê de fahmkirina bi rengê pêşketina wê re baş û nebaşîyê û hwd, weke rengên navaroka wê, wê êdî wê weke mijarna ku wê mirov serî li ser wan biwastênê bê.

Tabî, li vir mijara têgîna destpêkê a jîyanê wê weke mijareka wê serî li ser wê were wastandin bê. Bi wê re jî wê bi pêşketina jîyane re wê li wê *zêdebûn* wê bibê. Bi gotinaka din wê pirranîtî wê bi wê re wê pêşbikeve. Her tişta ku ew di jîyanê de ew ku zindî bê û ne zindî bê, wê ew weke afrînerîyeka di jîyanê de bê. Di hundûrê demê de wê hertimî ew bûyîn û afirandin wê bibê. Bi wê re jî wê bi demê re wê tîrîtîya wê bi zêdebûna wê re wê xwe hertimî pêşde bibê wê xwe pêşbixe. Li vir, rewşa fahmkirina destpêkêa jîyanê, rengê pêşketina jîyanê, hêzên vejenî ku ew ji temen ve jîyanê didina jîyankirin û hwd, wê li vir, wê di çerçoveya fahmkirina wê de wê weke mijarên ku wê werina fahmkirin bin. Tişt, wê weke rewşeka ku wê bi demê re wê bibê. Lê wê ew ne mayînda bê. Lê her tişta ku ew bû, wê xwediyê wê rewşa xwe ya heyînî û ya bi hişkirinîya wê bê.

----------------

(*)Mani piûtî zerdeşt re li ser şopa wî û hizrên wê hatîya û ola xwe pêşxistiya. Li dora sadsale 2´min piştî zayina îsa hatîya û jîyankiriya. Ji aliyê behremê yekem ê keyê sasani ve hat qatilkirin. Mani li şûn xwe gelek nivis û pirtûk hiştin.

Tişt, wê bi rastîtîyekê wê xwediyê rewşa aqilê xwe bê û wê bi wê re wê xwediyê rewşa ku ew bi wê re heya jî bê. Ev rastîtîya dûalîtîkî, wê bi wê dûalîtîya rewşa zêhnê û ya fîzîkê û hwd re wê hebe. Em li vir, divê ku vê jî bi wê re wê werênina ser ziman ku rewşa fîzîkî û ya zêhnî, wê weke rewşna ku wê di jîyanê de wê bi hebûnîya ku ew heya re wê xwediyê rengê xwe yê heyînî bê. Tişta ku ew li jîyanê heya, tevgerên weke ku mirov wan dihê û hwd, wê rewşna ku wê bên kirin bin. Di jîyanê de wê bûjenên ku ew hena, wê bi rastîtîyek wê hebin. Ew tişt, afirîna û hena. Zindiyek di xwezayê de ku ew heya û tişteka ne zindî ku ew heya, mirov nikarê bêjê ku ew nîn a. Ew, hena. Ew hebûn, wê weke tevgerna di jîyanê de ku ew di bin jî bin. Mirov dikarê wan bi wê rengê jî wê werênê ser ziman. Tişta ku ew bûya û heya, wê weke tiştek ku ew hebê bê. Di vê çerçoveyê de em dikarin serî li serdema kevn a dûalîsmê bixin û wê têgîna pêwîstînîya wê, li vir bibîr bikin. Her wusa, rewşa baxt kirinê û hwd a ji aliyê yazdanan ve ku wê ew werê hanîn li ser ziman, wê li ser wê pirr zêde wê bisekin in. Hewldana xwendin û şîrovekirina xewnan û hwd, wê weke hewldanaka ku wê bi wê re wê bikin ku wê pêşarojê jî bi wê re wê kifş bikin. Bawerîya bi baxt, wê li ser wê re wê weke rewşekê û têgînekê wê bi xortayî wê hebe. Kurdên berê, wê boraqan wê hem ji yazdanên xwe yên baş re wê bidin û hem jî wê yên nebaş re jî wê bidin. Ji baş re wê bikin, ber ku wan bi wan bawer dikir û bo ku ew di her demê de li cem wan bin û wan ji rewşên xirab biparêzên. Lê wê ji yazdanên ne baş re jî wê bikin bo ku ew ti xirabiyê bi wan nekin. Di hewldanaka ahengî de wê ev herdû rewş wê bihevdû re û ankû di rex hevdû de wê bi hatan kirin û domandin.

Di dewama fahmkirina têgîna dûalîsmê li ser rewşa fahmkirinê û aqil re de wê, weke ku wê di dema Manî de wê were dîtin, wê bi wê re wê zêdetirî hizirkirin û aqil û bi teybetî jî rengê aqilê felsefîkî wê bi wê re wê derkeve li pêş. Bi wê re wê bikin ku wê fahm bikin. Di çerçoveya fahmkirina têgîna başîûnebaşîyê û her wusa têgîna destpêkê, gerdûnê û her wusa hebûna xwûdê weke *gîyane pîroz* jî wê di vê çerçoveyê de wê çerçoveyek têgînî a felsefîkî bi aqilî felsefîkî û metafîzîkî jî wê derxe li holê. Di aslê xwe de wê piştî Manî re wê zêdetirî ev rengê pêşketinê ê dûalîsmê wê piştî Manî re wê bi teybetî bi şêwayekî metafîzîkî û lêpirsînîyeka di wê çerçoveyê de wê bi aqil wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de mirov ku wê ji kîjan aliyê ve wê hilde li dest, wê ev rewşa têgînîya metafîzîkî, wê di bin kirasê nepenîyekê de wê bi rengê hizirkirin û aqilê Manî re wê di vê xatê de wê derkeve li pêş.

Mijara fahmkirina dûalîteyê, wê bi teybetî wê di vê çerçoveyê de wê zêdetirî piştî Manî re wê bi hizrên Bûda re wê li Asya û herêmên wê derkeve li pêş. Wê pergalek hizirkirinê wê bi wê re wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de wê di aqil û hizirkirinê de wê pirralîtî ku wê weke rengê pêşketina têgîna dûalîtîkî jî wê rast dibînê wê derkeve li holê. Her wusa, di çerçoveya hewldana fahmkirina rewşa gîyanê û têkiliya wê ya bi laş re wê, di vê çerçoveyê de wê bi şêwayekî

felsefîkî wê li ser rewşa têgîna zêhnê û ya fîzîkê û hwd re wê derkeve li pêş. Li vir, em divê ku vê yekê jî êdî werênina ser ziman ku wê ji vê demê û pê de wê, li ser gotinan re wê zimanekî têgînî wê bi têgîna dûalîsmê re wê were bi wate kirin û wê were hanîn li ser ziman. Gotinên weke ´du gîyan´, ´gîyane baş û gîyane nebaş´, ´gîyan û laş´, û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke rengna têgînî û felsefîkî ên dûalîstîkî ên serdemên kevnera ên serdemên dûalîsmê û rengê pêşketina wê bin. Piştre jî wê di dema wê de wê gotinên weke ´zêhn û fîzîk´, aqil(weke derûnîyê jî mirov dikarê vê rengê gotina aqil fahm bike) û beden´, ´hebûn û derkkirina wê´, ´têkiliya nava başî û nebaşîyê´, ´aramî û nearamî´ û hwd, wê bi rengên gotinên weke medîtasyonê, reankarnasyonê, yoga û hwd re wê weke rêgezna hizirkî û felsefîkî wê xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de ev rêgezê rêzkarî ku wê pêşbikevin, wê her wusa wê weke rewşna ku wê têkiliya aqilê dûalîtîkî di jîyanê de wê çawa bi kirinê û ankû piretîkê re wê dênin, bin. Rewşa fahmkirina rastîya têkiliya nava gîyan û laş, zêhn û mejî û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê li wan were lêpirsîn. Mirov, çawa dikarê zêdetirî baş bibê û ankû xwe di aramiyekê de bibînê û hîs bike? Ev pirsên weke van pirsan, wê weke pirsna ku wê li ser rewşa gîyanîya mirov a rûhî re wê werina pirsîn û wê li bersiva wan were lêgerîn. Rûhîyetê gîyanê, wê çawa were fahmkirin? Her wusa gîyan, wê xwedîyê rûhekî bê. Yanî bi gotinaka din weke ku kurdên berê dibêjin ”wê xwediyê rewşek jîyanî bê. Di vê çerçoveyê de wê ew jî xwediyê aqilekî ku mirov dikarê weke rewşa gîyane wê jî wê hilde li dest bê.” Rewşa têgîna dûalîsmê, li vir, mirov divê ku wê êdî wê fahm bike ku wê ji vê demê û pê de wê weke xateka felsefîkî ku wê di jîyanê de wê rastkirinê û başkirinê wê di rewşa mirov de wê bide çêkirin bê. Li ahengeka li nava gîyan û laş û ankû gîyanê û jîyanê ku wê were lêgerîn, wê di temenê wê de wê têgîna aramîyê û xwe gihandina başîyê di dil de wê hebe. Di vê çerçoveyê de wê têgîna başîyê, wê weke armancekê bê. Têgîna başîyê, li vir bûyîna wê ya weke armancek ku mirov divê ku xwe bi gîyan û jîyane xwe re bigihênê wê, wê êdî wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Temenê vê rewşê jî wê, bi felsefîkî û hwd wê di vê çerçoveyê de wê bi afirê. Rêbaz û şêwayên wê yên gihiştinê û xwe başkirinê jî wê hin bi hin wê werina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de wê ev rewşa têgînî wê, weke têgîneka ku wê ew bi teybetî tenê û tenê ji xwezayê jî ew sûddigirê û ji wê xwe diafirênê jî bê. Pêşxistina dermanan bo başkirina laş û ankû fîzîkê jî wê bibê. Her wusa, wê li laş weke amûrekî ku mirov bi gîyane xwe re bi wê dijî wê lê wê were nerîn. Di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya parastina wê de jî wê êdî wê rengên parastinê wê werina pêşxistin. Ev hemû, wê di armanca başkirin û di aramiyê de jîyankirina gîyane mirov de bin.

Gîyan, wê weke hebûna yegane ya serdest bê. Di vê çerçoveyê de ku ew xwe nebaş hîs bike, wê ew rewş, wê bandûra wê li laşê mirov jî bibê. Ku ew nebê, wê laşê mirov bêgîyan û ankû bêrûh bê. Wê di vê rewşê de jî wê laş, wê

nikaribê xwe zêde bide jîyankirin. Wê nikaribê jîyan xwe xwe li jîyanê li ser lingan wê bide domandin. Di laş de wê, gîyan hebê û wê bibînê. Wê çav wê çavên gîyanê bin. Wê ´nûrha(rohnîya) gîyanê´ bin. Di vê çerçoveyê de wê ku ew têgîna gîyanî û aqilê bi wê re nebê, wê laş jî wê nebînê. Wê nebê. Wê nikaribê xwe bide domandin. Bo ku gîyan karibê li dunyê bijî wê laş pêwîst bê. Lê bo ku laş jî bijî wê gîyan pêwîst bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveyê de wê hewceyîya wan wê bi hevdû wê hebe. Wê bêî hevdû û hewceyîya wan ya ji hevdû, wê nikaribin wê bijîn.

Rewşa gîyanê û têkiliya wê ya bi laş re wê, bi rewşa jîyanê re wê hebê. Gîyan, wê di rewşek gerdûnî de wê bijî. Lê laş, di rewşek dunyayî de ew dijî. Dema ku gîyan, derkeve dervî laş, wê ne tenê dunya ji wê re mekan bê. Wê gerdûn, wê ji wê re wê mekan bê. Wê hingî wê qada wê ya tevgerîyê wê firehtir bê. Wê xwe azadtir û bi bêhntir wê hîs bike. Di vê çerçoveyê de wê gerdûn wê mal û cihane gîyanê bê. Wê dunya jî wê rewş û cihane laş bê. Di vê rewşê de jî wê gîyan, wê weke ya serdest û serwer bê. Gîyan, wê têkiliya wê bi gîyane pîroz re wê hebe. Wê karibê xwe derxe wê asta gîyane pîroz û bi wê re ku ew hevnasîyê bike.

Di vê çerçoveyê de wê di rewşa jîyane bi gîyane dûalîtîkî re wê mirov ji tevger û kirinên xwe wê berpirsîyar bê. Wê her wusa, wê yan mirov nêzî başîyê û yan jî wê nêzî nebaşîyê bikê. Di rewşekê de jî wê bi mirov re di laşê mirov de wê vejene baş û nebaş wê hebe. Li gorî vê jî wê, mirov bi keseyetîya xwe re wê gih başîyê û gih nebaşîyê wê bijî.Nexweşîyêk, rewşek pirsgirêkî a zêhnî û derûnî û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek nebaş bê. Pirsgirêkên zêhnî, derûnî û hwd, wê weke pirsgirêkna gîyanî û ankû weke pirsgirêkna laş û gîyanê wê wê di demên berê de wê bi hetan şîrovekirin. Di serdema me de wê, weke *pirsgirêkên derûnî* û hwd, wê werina hanîn li ser ziman. Nexweşî, pirsgirêkên zêhnî û ankû derûnî, wê di demn berê de wê weke ketina gîyan û ankû rûhên xirab di laşê mirov de jî. Di vê çerçoveyê de di dema rûdayîna nexweşîyekê û ankû pirsgirêkna zêhnî û derûnî, wê serî li rêyên derxistina gîyanên xirab bidan. Di nava dûalîstên berê de wê bi rengê zêde serdest û serwerbûna aliyê nebaş li mirov jî wê bi hanîyan li ser ziman. Ev rengê şîrove û hanîna li ser ziman a dûalîstan, wê bê temenê lêgerînên wan li rengên jîyanê û di nava rewşek başîyê de girtinê jî. Şîroveyên weke serdestbûna vejene nebaş li mirov, wê bê temenê ´nexweşî´, ´ne zelalîyên zêhnî(*)´, ´nearamîyên di dil de´, ´rast ne dîtinên bi mejî re´ û ´ne fahmkirinên baş û rast bi aqil re´ û hwd, wê weke encama wê, wê were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, mirov xwe çawa ji van rewşan wê rizgar bike û wê di rewşek baş de bijî û jîyane xwe bidomênê, wê li rêyên wê êdî wê were lêgerîn. Her wusa, xwe vekişandina ji jîyanê, bi xwe re mayîn û hizirkirina li xwe, hewldanên fahmkirina rastîyê û bi wê re xwe gihandina rastteqînêyê, û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewş

----------

(*)Berê weke nexweşî û ankû rewşa ku gîyanê nebaş laşê mirov dagirbikin û wê were ser ziman.

û armancna têgînî ên ku wê li dora wan, di vê çerçoveyê de mirov bijî û xwegirêbide bê. Rewşa weke xwe rewşên xirab dûrgirtin, ya ku mirov rast nedît xwe ji wê dûrgirtin û hwd wê di temenê wê de wê hizirkirina hertimî xwe gihandina ya baş wê hebe. Mirov, wê tenê bi ya baş re wê karibê rast bijî. Ev têgîna weke ´mirov, wê karibê tenê bi ya baş re rast bijî, wê di temenê van kirin, tevger û hewldanên mirov de bin. Her rewşên ku heya mirov xira dikin û pêşîya çêkirina wê digirin, wê di temenê wan de wê ya nebaş wê hebe. Ya ku mirov dixwezê ku wê bijî, wê ew bi rewşa jîyane mirov re wê weke rastteqînîyekê wê hebe. Mirov, divê ku wê kifş bike û wê bijî. Lê dema ku mirov wê bijî jî wê, gelek rewş, tişt û têgînên ku wê heya mirov xirabkin, wê mirov ji rêya mirov derxistin û hwd, wê bibin. Ev jî, wê di wê rewşê de wê ya rastîya armancên ya nebaş wê werênina ser ziman. Ev rewş, wê weke rewşna ku wê rastîya tekoşîna di nava başî û nebaşîyê de ku wê bi xwe re bênina ser ziman û bidina dîyarkirin bin. Di rewşa ku mirov bi vejene baş re ne xwediyê serwerî û serdestîyekê bê, mirov wê nikaribê serkeve. Di vê çerçoveyê de wê hemû zayifî û lawazîyên mirovî wê di temenê wan de wê bêheybûn, ne zelalîyên zêhnî û hwd wê hebin. Ev jî, wê temenê rewşên weke sergêjek, serêş, xwe di bin zorekê de hîskirin û ankû bi navê wê yê roja me ´stressê´ de dîtin û hwd, wê pêşbikevin. Ev jî, wê weke rewşna nexweşî bin ku wê mirov wan bijî. Li dora mirov, wê hem vejene baş hebe û hem jî ya nebaş wê hebe. Wê mirov, wê weke zindiyekî bi aqil, wê bikeve bin bandûra hemû rewşên baş jî û nebaşî jî. Ev rewş hemû wê bi keseyetîyê re wê rewşên lewîtînî ên zêhnî jî bin. Mirov, di rastîya ku ew wê dijî de wê di nava gelek rewş û rêyan de wê rêya xwe ya rast wê kifş bike û wê di wê de wê bimeşê. Di vê çerçoveyê de mirov, çendî ku mirov rast kir, mirov wê di gîyane xwe de wê di aramiyekê de bê. Wê rewşên nerast, nexweşî, nebaşî, û hwd, wê hemû jî rewşên ku wê nearamiyê wê bi gîyanê re wê bidina çêkirin bin. Pirsgirêkên gîyanî wê li ser *zêhnê* re bin. Yên laş jî wê bi nexweşîyên *fîzîkî* bin.

Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê bijî. Bi keseyetîyê re wê xwe mazin dîtin, xwe li ser herkesekî re dîtin, herkesekê li dora xwe ji piçûktir dîtin û piçûkxistina wan, kîbîr û hwd, wê rewşên ku wê mirov ji başîyê dûrbikin bin. Bo vê yekê, di serî de mirov divê ku xwe ji rewşên weke van ên bi keseyetîyê re ku wê derkevin xwe û dûr bike. Gîyan, di rewşek jîyanî de wê xwe ne bi wê jîyan bike. Wê bi rewşa xwe re wê jîyan bikê. Li vir, rewşa keseyetîyê, wê weke rewşeka ku mirov divê ku wê bi teybetî wê hilde li dest bê. Rewşa keseyetîyê, wê weke malzarokeka ku wê di laş de wê temenê lewitînê jî bê. Di vê çerçoveyê de wê di şêwayekê de wê, bi tevgerên weke kîbrê û hwd re wê, karibê pêşîya pêşîya pêşketin û pêdeçûyîna mirov a di jîyanê de bi başî jî bigirê bê.Di vê çerçoveyê de mirov, weke ku Zerdeşt jî û Manî jî di vê çerçoveyê de dihênê ser ziman ku mirov, xwe ji wan rewşên lewîtînên kibrî xilas bike û paqij bike. Wê hingî wê karibê xwe bi başî bijî û di rêyek baş de wê karibê jîyane xwe wê bidomênê. Wê weke têgînekê ku wê heta roja me wê di nava kurdan de wê were

hanîn ser ziman bê ku ”wê bê gotin ku mirov çi jîyan kir ku ew bi başî bê û bi nebaşî bê, wê ew piştî mirina mirov re wê derkeve ber mirov, wê xwe şanî mirov bide û mirov wê bibînê ku mirov di jîyane xwe de ew bi başî û ankû bi nebaşî kirîya.” Di rewşa jîyankirinê de wê kurd bi wê bawer bikin ku mirov çi jîyankir, wê ew winda nebê. ´Wê ew di valahîya fezeyê de wê hebûna xwe mayînda biparêzê.´ Bo vê yekê, divê ku mirov di wê rewşa jîyankirinê de xwediyê wê heyîderîyê bê ku mirov hertimî di jîyane xwe de wê tişta ku mirov bi kirinî û tevgerî kir ku ew ya baş bê.Ya baş ku ew hatî kirin, wê qadrê mirov mazin bike, wê rewşa mirov baştir bike û wê mirov di derûnî û aramîya mirov a dilê mirov de wê, baştir û rehettir bike. Di vê çerçoveyê de wê kirina ya baş, wê temenê jîyane baş û bi aramî jî bê. Manî wê werênê ser ziman ku wê dema ku mirov kirinên nebaş kirin, wê vabalê wan wê piştî mirov wê bi bandûra wan re wê nifşên piştre jî wê bikişênê. Bo vê yekê, kirin, wê di rewşeka ku wê bandûrên wê, ji ya ku em dizanin wê zêdetirî wê xwedîyê bandûrê bê. Wê kifşkirinên bi wê re wê zêdetir wê hebin. Di vê çerçoveyê de wê pêşnîyar bike ku mirov hertimî di têgihiştina ku mirov çi kir û got de bê.

Rewşa têgîna başî û nebaşîyê wê her wusa wê di vê çerçoveyê de wê weke rengê kirin û tevgerên mirov jî wê xwediyê wateyekê bê. Rewşa têgîna başî û nebaşîyê, ku mirov wê dihizirê, ji aliyekî ve mirov li kirin û tevgerên xwe jî dihizirê. Ev kirin û tevger, wê piştî ku ew bûn û pê de wê, hebin. Mirov wê nikaribê, wan înkar bike. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna dûalîtîkî wê xwediyê têgînîyek pêwîstînî a li ser rewşa bûyînê bê. Weke ku me çawa li jor hanî hanî li ser ziman ku kurd, di nava xwe de ew bi wê bawer dikin ku mirov çi kir û got, wê mayînda bimênê, di vê çerçoveyê de wê rewşek pêwîstînî wê li ser vê rewşê de wê xwe bi heyînî wê bide dîyarkirin. Em dikarin vê rewşa pêwîstînî jî weke rewşa pêwîstînîya dûalîtîkî a li ser rewşa piştî bûyîna wê re ku em wê bênina ser ziman jî bê.

Rewşa bûyînê, wê her wusa li vir, wê li ser aqilê kirinî re wê xwediyê wateyekê bê. Mirov çi kir û got, wê her wusa ew wê piştre wê hebe. Li ser vê rewşa ´mirov çi kir û got ku wê winda nebê re´ wê, her wusa aqilekî kirinî wê xwe bi têgînek bûjenî wê xwe bi şenberî wê bide dîyarkirin. Lê ev têgînîya bi aqil bûjenî re em, nikarin wê tenê weke rewşek fîzîkî a bi giranî, hacm û cismî re wê werênina ser ziman. Her wusa rewşa têgîna vê rewşa bi aqilê bûjenîkî ku em wê werênina ser ziman, wê her wusa di çerçoveya aqilê kirinî de wê xwediyê wateyekê bê. Mirov, nikarê dengekî bi dest bigirê. Wê deng, giranî û ankû hacma wê nebê û mirov wê nikaribê wê bidest bigirê. Lê deng wê weke rewşek ku ew derketî û bûyî wê hebe. Piştî ku ew deng derket û pê de, mirov nikarê wê înkar bike.

Di rewşa têgînîya fahmkirina dûalîtîkî de wê ev rewş, wê weke rewşna jîyanî bin. Mirov, wê çawa van dengan salix bike û ankû bi wate bike? Ew jî, wê ji aliyê xwe ve wê xwediyê wateya xwe bê. Di rewşa fahmkirina dengê de wê

deng wê xwediyê rewşeka bbi watekirina xwe bê. Lê wê weke heyînekê jî wê ew jî ji aliyekî din ve jî wê hebe. Dengên ku mirov wan li ser ziman re wan dihênê ser ziman, mirov wan bi dîtîn, daraz û weke ku dixwezê ku wan bi wate dike û bi reng dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê piştre wê ew bi watekirin û salixkirina dengî wê, bê malê gelek mirovan. Ankû, wê bê malê civakekê. Di vê çerçoveyê de wê wateyên wê û têgînên wê, wê di serê gelek mirovên ku ew bi hevdû re dijîn de wê bi wate bibê. Wê di vê çerçoveyê de wê li ser wê hevbeşîya bi dengî û wateyî û nasîna wê wateyê re wê temenê têkilîya bi hevdû re jî wê bê danîn bi hevdû re.

Di rewşa salixkirina gotinê de wê, ev rewş, wê xwe wê bidina dîyarkirin. Rewşa gotinê, kirde, wate, salixkirin û her wusa têgîna ku ew bi wê re wê biafirê û wê hebê bi hişî, wê di vê çerçoveyê de wê weke rewşek teybet bê. Ziman, di aslê xwe de wê, wê hem rewşek teybet bê bi mirov re û hem jî wê rewşek gelemper bê. Wê di vê çerçoveyê de wê bi aliyê xwe yê teybet re wê keseyetîyê û bi aliyê gelemperî re jî wê civaketîyê wê bide dîyarkirin û hanîn li ser ziman. Li vir, rewşa ku wan gotinan bi wate dike, bi têkiliya wan wateyên gotinî, bîrkirina xêvî, mejî û her wusa têkiliya mirovî a bi wê re ku wê reng bistênê a bi hevdû re û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê bi hevdû re wê bi wê re wê hebe. Di aslê xwe de wê rewşa têgîna aqil wê, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Aqil, wê ji aliyekî ve wê hem bi gotinê re wê xwe bide çêkirin û hem jî wê ji aliyekî ve wê bi têkiliya nava gotinan a li ser wate, kita, kirpandin, lêker, daçek, pêşek, paşek û hwd re wê, bi wan rewşan re wê xwe bide dîyarkirin. Rewşa aqil û ziman, wê di rewşek dûalîtîkî de wê xwe bide dîyarkirin. Di nava kurdan de weke gotineka xalkê ku ew heya û ew dihê gotin ”ku mirov bi ziman bû, mirov êdî biaqil bû.” Di vê çerçoveyê de wê di çerçoveyeka weke ya bi rengê hevoka ´ku mirov bi ziman bû, mirov êdî wê bidest axiftinê bike.´ re wê bahse têkiliya ziman û aqil a bi hevdû re bikin. Mirov ku çendî ku ew aqil hebe jî ku mirov, ne xwediyê ziman bê, mirov wê nikaribê, wê aqilê werênê ser ziman. Li vir, weke encamakê ya ku wê derkeve li holê ew a ku aqil, bi rêya ziman re ew dihê ser ziman. Ankû aqil, bi rêya ziman ew dihê hanîn li ser ziman. Rewşa aqil û ziman, wê di vê çerçoveyê de wê bi awayekî pirralî wê bi hevdû re wê ji navikê ve wê girêdayî bê. Di vê çerçoveyê de wê aqil,wê xwediyê rewşek hişmendî a ku ew dihê hanîn li ser ziman. Dûalîteya nava aqil û ziman de wê, di çerçoveya afirandin, pêşxistin û hanîna wê ya li ser ziman de wê, xwe bide dîyarkirin. Hanîna li ser ziman, wê weke zindiyekî wê her mirovê bi aqil wê, mihtaciya wê bi xwe re wê hîs bike û wê bixwezê ku ew xwe bênê ser ziman.

Li vir, rewşa aqil û ziman, wê di çerçoveyekê de wê rewşa fahmkirinê a bi hiş re wê dîyar bikin. Mirov, bi aqil dibînê. Piştî ku mirov bi aqil bidest dîtinê kir û pê de wê aqil êdî wê temenê mirov ê ku wê li ser wê re xwe pêşbixe û wê

werên ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê bi giringiyekê wê hertimî wê bahse aqil û hanînîya wê li ser ziman wê were kirin.

Rengê hanînîya li ser ziman, wê li vir, wê giring bê ku mirov wê bi awayekî baş rewşa têgînên weke başî û nebaşîyê bi rengê li ser watekirinê re wê fahm bike bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê rengê bi watekirinê, wê weke rengekî hizirkirinê ê teybet ê wate li wateyê kirinê ê bi aqil bê. Têgînên weke rewîst û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pêşbikevin. Têgîna başî û nebaşîyê, wê di çerçoveya têgîna rewîstê û ankû ahlaqê de wê rengê pêşketina dûalîsmê a serdema Zerdeşt jî wê bi xwe re wê werênê ser ziman. Di vê demê de wê, rengê dûalîsmê ê ahlaqî û ankû mirov dikarê weke bi gotina *ahlaqê dûalîsmê* û ankû *rewîsta dûalîsmê* û hwd re wê werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de ku mirov li ser gotina ´ahlaqê´ re têgîna dûalîsmê, wê bike ku wê fahm bike, her wusa wê li vir, wê rewşa weke armancakeê gihiştina başîyê wê xwe wê bide dîyarkirin. Têgîna başîyê, wê di çerçoveya keseyetîyê de ku wê mirov, wê bixwezê ku wê hertimî wê xwe bigihênê ya baş, wê weke têgînekê wê xwe bide dîyarkirin. Li vir, têgîna başîyê û hwd, wê weke rengekî hizirkirinê û bi wê yê pêşketina rengekî jîyanê jî bê ku wê xwe bide dîyarkirin. Ahlaqê dûalîsmê, wê xwe di vê çerçoveyê de wê weke têgînekê wê di çerçoveya gotina başîyê de wê xwe bide dîyarkirin. Ya weke ´ahlaqî´ û ankû rewîstî ku ew dihê dîtin, ya ku ew dihê herêkirin û rast dîtin a jî bê. Di vê çerçoveyê de wê, kîjan ya rast û ku ew tê herêkirin bê? Wê ya baş ku ew dihê herkirin bê. Di vê çerçoveyê de wê êdî wê ya baş, wê weke temenekî zêhnî, aqilî û têgînî wê xwe di vê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin. Ahlaqê dûalîsmê, wê di vê çerçoveyê de wê ´bi gihiştina ya baş re´ wê xwe bide nîşandin.

Rewşa ahlaqê dûalîsmê, wê ji aliyekî ve wê, bi çerçoveya xwe ya jîyanî û têgînî re wê xwediyê rewşa jîyanê bê. Her wusa, her tiştê ku ew di jîyanê de û di xwezayê de ew heya, wê weke heyînna wê hebin û wê hebûna wan, wê were herê kirin. Di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka ahlaqê dûalîsmê, w parastina mafê jîyanê bi xwezaya wê re wê, xwe wê bide dîyarkirin bê. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê jî werênê ser ziman, ku wê rewşa ahlaqî a dûalîsmê, wê di du beşan de wê xwe bide dîyarkirin. Di serî de ya ku ew heyî û afirîya de wê xwe ji aliyekî ve wê bide dîyarkirin. Ji aliyê din ê duyem ve jî wê weke têgîneka darazî wê li ser ya ku ew heyî û bi aqil dihê hizirkirin û afirîn re wê xwe bide dîyarkirin. Her tişta ku ew heya, ew wusa herêkirina wê, wê ji aliyekî ve wê weke rêzikekê wê xwe li vir wê bide dîyarkirin. Ji aliyê din ve jî wê parastina ya ´başîyê´ bê. Parastina ya başîyê, wê weke aliyekî têgîna ahlaqî bê. Li vir, em divê ku vê yekê jî ji bîrnekin ku wê têgîna ahlaqî, wê di serî de wê xwe bi keseyetî wê bide dîyarkirin. Yanî, wê li ser darazên mirovî ên bi keseyetî re wê xwe bide dîyarkirin. Ya ku mirovekî rast dît, wê yê din rast nebînê. Yan jî, ya ku li gorî min rast bê, ew heya ku ew li gorî yê din ne rast bê. Di vê çerçoveyê de wê bi rewş û têgîneka pirralî, mirov dikarê wê hilde li dest. Di vê çerçoveyê

de rewşa têgîna ahlaqî a dûalîsmê, wê çendî ku wê di nava xwe de wê pirralî jî bê, wê di vê çerçoveyê de wê navaroka wê bi rengên cuda ên li jîyanê û ên xwezayê de wê hebe. Li vir, ji aliyekî ve wê têgîna dûalîsmê, wê her wusa wê ya rast û ku ew heyî, wê ji xwe re wê esas bigirê. Ya rast, vajî ya derewê ya. Ya derew, wê ne ya rast bê. Di vê çerçoveyê de wê ya rast, wê bi rewşa heyî û dûrûst re wê were ser ziman. Dema ku mirov rast bê, wê hingî, wê ku tiştek nebê, wê nebêjê ku ew heya. Dema ku tiştek hebe, wê nebêjê ku ew nîn a. Dema ku bi vê rengê vajî wê hanî ser ziman, wê ew derew bê. Ev jî, wê weke ya nebaş bê. Înkar, wê rewşek nebaş bê. Înkar, wê di serî de wê derew bê. Wê tişta ku ew heya û rast a, wê weke ku ew nîn a û ne rast a, wê hanîna wê ya li ser ziman bê. Di vê çerçoveyê de wê ev, weke rewşek pirr xirab û nebaş bê. Di nava çanda dûalîsmê a ahlaqî de wê, bo ku vê rewşê bi awayekî vekirî, wê gotina ´drug´ wê weke navê derewê ê berê, wê weke dagerekê û heta ku wê li cihna wê weke rewşek xirab wê werê hanîn li ser ziman. Wê weke rewşek gîyane xirab û nebaş wê werê hanîn li ser ziman. Wê weke nîşanaka wê gîyane ne baş û xirabûyî wê were hanîn li ser ziman. Tişta ku ew ne rast bê û ji rê derketî bê, wê weke ya xirabûyî jî wê were hanîn li ser ziman.

Mirov, dikarê bêjê ku wê her tişt bi cewherê xwe re wê baş bê? Li vir, ev wê weke darazekê bê. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman, domandina heyîna jîyanî û têkilîyê jî wê tenê û tenê wê têgîna başîyê re bê. Xwûdê bi xwe jî, wê tenê karibê hebûna xwe bi rastî û têgîna başîyê wê bide herêkirin û domandin. Kirina başîyê, wê ji vê çerçoveyê de wê weke rewşeka xwedewandî jî wê xwe bide nîşandin. Kirina başîyê, wê di vê çerçoveyê de wê di her ast û çerçoveyê de wê bê pîvana herêkirin û neherêkirinê jî.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku mirov dikarê bêjê ku wê tenê başî hebe? Ankû wê xwûdê wê tenê baş bê? Ku mirov, li rewşa şîroveyên di derbarê têgîna başî û nebaşîyê ji avsta dixwênin, em dibînin ku wê weke ku wê başî û nebaşî wê wê herdû alî wê hebin. Wê xwûdê, ne tanê bi başî wê hebe, weke ku çawa wê Zerdeşt bixwe jî wê bi ahrîman re wê wê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê weke ku çawa wê xwûdê hem bi başîya xwe re wê hebe û wê kirinên bi navê wî, wê bi başî wê werina şîrovekirin, vajî wê jî wê rast bê û wê hebe. Ev jî wê, wê weke rengekî dîtinî wê hebe. Li vir, vê yekê werênê ser ziman ku herkirina ku bi navê xwûdê ku ew hat kirin û ku ew nebaş bê, ku ew ber ku ew bi navê xwûdê re dihê hanîn li ser ziman, ma mirov dikarê wê weke ´kirineka baş´ wê şîrove bike û wê bênê ser ziman.? Kirina ku ew bi navê xwûdê hat kirin ku ew nebaş jî bê ku ew ji ber ku ew bi navê xwûdê hatîya kirin ew bi başî hanîna li ser ziman, wê tenê wê weke têgîneka spikûletîf a vajî nîşandin bê. Ev rewşa têgînî a li ser nebaşîyê re wê piştî Zerdeşt re wê bala Manî wê kişênê wû li ser wê, şîroveyna ku wê ew aliyê baş bi navê yazdan wê derxe li pêş weke aliyekî serdest û wê hebûna nebaşîyê weke ya tekoşîna li hemberî wê, wê ew werên ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê gotinên weke

Xwûdê, weke yê ku hêza wî têrî hemû tiştî dike û ew bi tememî baş a´ wê, gotinên vê dema Manî bin. Di vê çerçoveyê de wê Manî di nava navê xwûdê û başîyê de wê têkiliyê dênê û wê li ser wê re wê şîroveyên xwe wê pêşbixe. Her wusa wê di vê çerçoveyê de wê Manî, tenê wê biavêjê ku wê navê xwûdê û gotina başîyê wê bi hevdû re wê li hevdû wê weke yên serdest, wê bênê ser ziman. Piştre jî wê, bi olên ku wê piştî wî re wê werin, wê ji vê rengê wî yê hanîna ser ziman wê sûdbigirin û wê di vê çerçoveyê de wê bi şêwayekî yekalî wê bidest hanîna li ser ziman bikin û wê têgîna nebaşîyê û ankû xirabiyê jî wê weke têgîneka ku ew ´heyî´ wê herê bikin û wê li ber wê dênin. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê jî werênê ser ziman ku wê li ser têgîneka xwûdê û başîyê re wê werê hanîn li ser ziman ku xwûdê heya û baş a. Başî, vajî nebaşîyê ya. Başî û nebaşî jî bi rewşek fîzîkî wê li jîyanê xwediyê wateyê bê. Lê mirov ku ew qancî û ankû başîyan, dikarê bike wê xirabî û nebaşîyan jî wê bike. Hewce nakê ku mirov li ahrîmanekî bigerihê. Ew bixwe, bi kirinên xwe ya ew a û yan jî ne ew a.Nebaşî, wê encama wê xirabûnên di keseyetîyê de ên li ser tevger, kirin û her wusa bi gotineka roja me, wê di rengê xirabiya derûnîyê de bê. Rewşa têgîna baş û nebaşîyê ku wê di berê li ser têgînên weke ahlaqê û hwd re wê werê ser ziman, wê di roja me de wê bi têgîn û rewşên derûnî ên weke têkiliya nava zêhn û fîzîkê û hwd de wê, bi wê re wê werênê li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di dewema têgîna ahlaqa dûalîsmê de wê, di roja me de wê rewşa dûalîsma zêhn û fîzîkê û têkiliyên wan ên newrolojikî û hwd re wê hebûna xwe wê bide hanîn li ser ziman. Emê li ser li ser wê **bisekin** in, lê li vir em divê ku di dewama têgîna ahlaq dûalîsmê de wê rewşa xirabûyîna bi keseyetîyê re ku wê weke encama nebaşîyê û kirinên wê yên fîzîkî û hwd bê, wê bi şîroveyên bi başî û nebaşîyê re wê ew bê destnîşan kirin. Her xirabî, ne başîyek a. Di tevger, kirin û xûyên keseyetîyê de jî wê, kirin, tevger û xûyên nebaş, wê weke rewşên dervî ahlaqê ku wê werina ser ziman, wê bi gotina nebaşîyê re wê balê bikişênina li ser vê nûqtê. Yê ku ew hertimî hêza wî ya kirina başîyê hebe, wê karibê pêşîya kirina nebaşîyê bigirê. Li vir, dema ku mirov bibêjê ku ´yê ku hêza wî ya kirinê heya û xirabî heya, wê çaxê, mirov li vir, têgîna xirabiyê di jîyanê de wê kêm tênê ser ziman. Yanî, nebaşî û ankû xirabî, tenê weke tevgerna û ankû kirinna heya. Dema ku yê ku hêza wî ya kirina başîyê hebe, li vir, divê ku mirov, li ser wê têgîna nebaşîyê re wê jî werênê ser ziman ku yê ku hêza wî ya kirina nebaşîyê jî heya. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov bibêjê ku yê ku hêza wî ya kirina başîyê heya û nebaşîyê tenê li rex wê weke têgînek û ankû kirinekê werênina ser ziman, wê çaxê, ew hanîna mirov a li ser ziman, wê nîvçû wê bimênê. Wê ji aliyekî ve wê, ne rast bê. Ber ku yê ku hêza wî ya kirina kirina baş hebê, wê bi heman rengê ew û ankû yekî din wê hêza wî ya kirina nebaşîyê û ankû xirabiyê jî wê hebê. Li vir, em dema ku em hinekî din kûr herina temenê wê kirinê, wê li ser wê kirinê re wê têgîna başî û ankû nebaşî, wê weke perdeyek têgîhî wê li holê bimênê. Mirov dikarê bêjê ku xwûdê, tenê baş

a? Wê çaxê, ku ew tenê baş bê, wê çaxê, wê tenê başî hebê. Lê bi herdû alîyn başî û nebaşîyê re hanîna li ser ziman re wê hingî li vir, wê di çerçoveya têgîna ´hêza kirinê´ de wê ev rewş were dîtin. Wê bi hêza kirinê re wê mirov û ankû xwûdê, wê bike. Lê ew kirin baş a û ankû nebaş a, wê piştre wê di jîyanê de wê bi encamên wê re wê xwe bide nîşandin. Ku mirov xwûdê, tenê bi têgîna başîyê re werênê ser ziman, wê di vegotina nebaşîyê de wê ketina zorê wê bibê. Yekî ku ew karibê ´hertiştî bike´, wê di nava wê hertiştîyê de wê başî jî wê hebe û wê nebaşî jî wê hebe. Ber ku ew dikarê herdûyan jî bike.

Li vir, dema ku em bahse ahlaqê dûalîsmê dikin, di cih de hanînîya Zerdeşt a li ser ziman, wê were berbîra me. Zerdeşt, li ser têgîna baxtê re wê bahse ahlaqê bike û wê bênê ser ziman ku wê li ser kirinê re wê lu duyan wê beş bike. Beşa pêşî, wê bi kifşkirina yazdanîyê a baxt û baxtê ku ew hatîya nivîsandin re wê bênê ser ziman. Beşa duyem jî wê li ser kirin û emelê´ mirov re wê bênê ser ziman. Her wusa mirov, wê di kirina xwe de wê serbest bê. Lê wê, li kirina xwe jî wê bi berpirsîyar bê. Di vê çerçoveyê de wê bênê ser ziman ku ”mirov divê ku ew li kirina xwe baş bihizirê” bê. Vê jî wê, bi gotina ´hamata´ wê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de ew di dewama wê de dihênê ser ziman ku mirov di hanîna xwe ya li ser ziman de zelal û safî bê. Vê jî wê bi gotina ´hakhata´ wê bênê ser ziman. Beşa sêyem jî wê bi kirinê re wê bênê ser ziman û wê bêjê ´divê ku her tişt di cih, dem û ratîya wê de were kirin û baş bê kirin. Vê jî wê bi gotina ´hvarşta´ wê werênê ser ziman. Weke ku çawa mirov xwediyê jîyanê ya, wê her zindî ku ev çêlek, kuçik û ga jî bê, wê bi giringî wê wê rêzê ji jîyane wan re jî wê bigrin. Kuştin, zina, destavêtina haramiyê, piçûkxistin û hwd, wê weke kirinên haram ên ku ew newina kirin wê bên hanîn li ser ziman. Zilm kirin, wê weke kirineka dijîmirovî a xirab û nebaş wê were dîtin û wê were mahkûm kirin. Bi wê re jî zayifiyê jî jî wê, herê nekê û wê xirab bê dîtin. Di nava jîyane civakê de wê bi giringî dayîna pêşxistina civaknasî û her wusa têkiliyek rast a bi qadr a bi hevdû re. Di vê çerçoveyê de wê, têgîna ahlaqî a dûalîsmê, wê xwediyê rengekî pêşketinê a teybet bê. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku wê bi ahlaqî wê kirina rast û ba hatî kirin, tişta ku ew rast û baş hatî gotin û ya rast û baş hatî hizirkirin, wê weke sê sipertekên berpirsîyarî ên ahlaqî wê werina hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê ev her sê rewş, wê weke rewşna teybet û giring ê têgîna ahlaqî a dûalîsmê jî bin.

Têgîna ahlaqî a dûalîsmê, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek û çerçoveyek têgînî a bi jîyane civakî re bê. Her wusa mijarên ku wê têgîna ahlaqî wê wê hildê li dest, wê di çerçoveya têgîna başîyê de bê. Gotina ´ahlaq´ wê weke gotina ku wê rengê wê yê başîyê b. Vajî wê wê, weke k kurd jî wê di nava xwe de wê hertimî weke gotinek jîyanî wê werênina ser ziman wê gotina ´halakê´ wê weke ya nebaş ku wê derketina dervî ya ahlaqê bi xwe re dihênê ser ziman, wê were hanîn li ser ziman. Ahlaq û halak, wê vê dûalîteya baş û nebaşîyê a dûalîsmê û ankû têgîna ahlaqî a dûalîsmê wê bi xwe re wê werênina

ser ziman. Ya bêahlaq û ankû ji rêya ahlaqîyê derdikeve jî wê, halak bê. Di vê çerçoveyê de wê bi dûîtîyekê re wê têgîna dûalîtîkî a ahlaqî wê were ser ziman. Her wusa, wê li gorî têgîna herdû gîyanên ku ew yek baş û ya din nebaş a, wê were hizirkirin. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş, wê piştre wê li ser keseyetîyê re jî wê were şîrovekirin. Mirov, xwediyê keseyetîyekê ya ku wê bi wê re wê tevger, kirin û xûy û hwd wê hebin. Xûyên baş, wê başî û ahenge wê keseyetîyê, wê werênê ser ziman. Lê çendî ku nebaşî ket nava kirin, tevger û xûyan de û ew bi nebaşî hatina kirin û dayîn nîşandin, ev wê keseyetîyê jî bi tevger, kirin û xûyên wê re wê deforme bike û xira bike. Di serdeme me ya hemdem de wê şîroveyên li ser keseyetîyê ên bi derûnîyê re wê hinekî ku wê van rewşan ji xwe re weke temen esas bigrin wê bên pêşxistin. Şîroveyên li ser zêhnê û têkiliya wê ya bi rewşa fîzîkê re wê, di vê çerçoveyê de bê. Ev jî, weke mijareka dûalîtîkî a hemdem, di çerçoveya felsefeya wê de mirov, divê ku wê hilde li dest û wê bike fahm bike.Li vir, bi têgîna dûalîsmê re fahmkirina têgîna zêhnê, wê ji aliyekî hevyekî ve wê wekhevîyekê ku wê zêhn û rewşa fîzîkî wê bi wê ew wê weke hevdû werina ser ziman, wê ew werina ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, di serî de dema ku em bi têgîna dûalîtîkî têgîna zêhnê hildina li dest, em divê ku vê pirsê bikin ku wê bêî fizikê wê zêhn karibê bijî? Sedemeke me ya giring heya, ku em li vir vê pirsê li ser têgîna dûalîsmê re bi zêhnê re bikin. Her wusa, sedema pêşî wê rewşa laş û gîyanê bê. Dema ku laş mir, wê weke ku gîyan jî wê bimirê. Lê di aslê xwe de wê, bê bawerkirin ku wê gîyan piştî mirina laş jî wê bijî. Bi gotineka din, wê gîyan bêî ku mihtacî laş bê, wê karibê hebûna xwe bijî û jîyane xwe wê bide domandin. Nûha, em ji vê rewşê gav biavêjin û bikin ku vê rewşa zêhnê û ya rewşa fîzîkê hildina li dest û wê fahm bikin. Di nerîn û dîtina pêşî de wê bi fahmkirina me re wê were têgihiştin ku wê zêhn weke ku çawa ku wê gîyan karibê dervî laş bijî, wê zêhn jî dervî rewşa fîzîkî wê hebûna xwe karibê bijî. Yanî, bi gotineka din, wê zêhn, wê weke rewşeka serbixwe bêî ku ew fîzîk, wê bide jîyankirin, wê karibê bijî. Ev rewş, wê her wusa, zêhnê, wê weke têgîhiştinekê wê werênê ser ziman. Lê bi wê re ew têgihiştin, ew di nava xwe de bi wê şenberî, zelal û hşmendîya ku ew li ser darêjka xwe ya rewşî re ku ew bi xwe re dide çêkirin, wê ew di xwe de wê weke hişekê û rewşek fîzîkî a kirdeyî a xwe bixwe jî wê hebe. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de wê ev rewşa têgîna zêhnê, wê di serê gelek mirovên ku wê li ser zêhnê wê bihizirin re wê bê temenê wê hizirkirinê ku wê bihizirin û bênina ser ziman ku wê ´têkilîya zêhn û rewşa fîzîkî(*) wê bi hevdû re nebê, piştî ku zêhn afirî û bê.´ Di vê çerçoveyê de zêhn, dema ku ew afirî, wê çi pêvajo û prossesan wê derbas bike, ev jî wê, weke rewşên ku wê temenê rewşa

---------------

(*)Wê têkiliya zêhn û fizikê wê di demên piştî Mani de wê bi felsefeya spinoza û descartes re wê were kirin. Descartes wê hizrên xwe yên ku ew li ser dualismê dihênina li ser ziman wê, weke şîroveyna demkî ên di wê warê de wê werina dîtin û wê di warê têgînên weke yên newrrologi û zêhn û laş û têkiliyên wan êmn bi hevdû re wê werina hildan li dest.

afirîna zêhnê ku ew weke rewşek serbixwe ew werê hanîn li ser ziman bê.

Di rewşa fîzîkî ku wê fîzîk bi wê di nava şert û mercên xwe yê cismî, demî û hebûnî de ku wê dayimî gûharînê bi xwe re çê bike de wê, ew têgîna ku weke derka wê ku ew ji wê hat girtin, wê çendî ku karibê, wê bi xwe re wê werênê ser ziman? Yan jî, mirov, çendî dikarê di hevyekîyekê de wê zêhnê û rewşa fîzîkê a bi hevdû re wê, werênina ser ziman? Di dema ku em bi têgîna hevyekîyê werênina ser ziman, em divê ku weke hevdû ku wê ji hevdû ne cuda bin, em di wê çerçoveyê de wê dikarin wê werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, ev rengê hizirkirina me, wê mêyla me û rêya me ya hizirkirinê, wê berê wê bide bi wir ve ku emê bi wê bihizirin ku wê zêhnê bêî ku ew mihtacî wê bi rewşa fîzîkî bibînê û serbixwe wê karibê bijî bê. Her wusa, dema ku em vê rewşê bi vê rengê werênina ser ziman, di çerçoveya wê têgîna dûalîtîkî û têgîna wê ya hevyekîyê de jî em, divê ku wê rewşa fîzîkî jî bi wê rengê wê werênina ser ziman. Rewşa hildana li dest a zêhnê, weke rewşek serbixwe, wê di aslê xwe de wê têgînên mengîwerî ên weke ku ew bi ´nemirîya gîyanê´ re dihizirin û û ankû ku ew li ser ´derkkirina wê´ re dihizirin ku ew wê fahm bikin û hwd, wê ji aliyekî ve wê temenê wê jî bi xwe re wê bi afirênin bin. Rewşa gîyanê ku weke darêjkekê li wê bihizirînê û hewldana hanîna wê ya li ser ziman ku ew ne xwediyê rewşek fîzîkî a li jîyanê ya, wê bi wê re wê aqil û bi teybetî jî rewşa têgînên weke zêhnê, wê di vê çerçoveyê de wê li ser wê derkkirina me re wê bi şêwayekî serbixwe ku wê mihtacê bi rewşek fîzîkî û ankû bûjenî nebînê wê werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê piştre, di serdemên felsefeyê de wê bi pêşketina têgînên weke ´mengwerîyê´ û ´pêzawerîyê´ û hwd re ku wê ya pêşî wê zêhnê esas bigirê û ya piştre jî wê weke destpêkê wê bûjenê wê esas bigirê, wê bi wê re wê di çerçoveyek dûalîtîkî de wê werênê ser ziman. Rewşa têgîna dûalîsmê, li vir weke têgîneka rastîtî û ankû realîstî, wê hebûna zêhnê wê bi hebûna wê re wê herê bike û wê hebûna rewşa fîzîkê wê bi hebûna wê re wê herê bke. Di vê çerçoveyê de wê wan rewşan weke rewşna serbixwe wê werênê ser ziman. Di çerçoveyeka li hevdû hûnayî a gîyan û laş de wê li vir, biriqînekê li mejiyê me bike ku em bi wê re bihizirin ku wê rewşa zêhn û fîzîkê jî bi wê rengê, wan bi hevdû re werênina ser ziman. Lê li vir, pêşî bi wê re em li vir, divê ku vê pirsê bikin. Rewşa zêhnê û fîzîkê, dema ku ew serbixwe bin, wê karibin ji hevdû re bi heyînî sedemê bi afirênin? Di rewşek ku ew karibin serbixwe bijîn de wê, wê çaxê wê sedemê jî bi têgînî biafirênin û wê, li rex wê,di çerçoveyekê de wê zêhn bi rewşa xwe ya ku ew bi wê pêş dikeve, wê karibê sedeman biafirênê û wê bi heman rengî wê ji aliyê fîzîkê jî wê rewş wusa bê. Her wusa, ev rewşa ji hevdû re çêkirina sedemê, wê serbixwebûna wan ya ji hevdû jî wê ji holê ranekê. Li vir, di dewama wê de mirov, dikarê vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku rewş û bûyarên zêhnî ên ku ew di mejiyê mirov de diafirin, wê karibin, bi hebûna xwe re wê sedemê ji rewşa fîzîkî a laşê mirov re wê çêbikin. Yan jî, ew

zêhn, wê karibê bibê sedema afirînekê di laş de. Bi heman rengê wê rewşa fîzîkî ku wê çawa karibê wê ji aliyê xwe ve bi zêhnê re wê bike.

Her tişt, wê ji aliyekî ve wê hem serbixwe bê û hem jî wê ji aliyekî ve wê bi hebûna xwe ya ku ew bi wê heya re wê bi hevdû ve girêdayî jî bê. Yanî li vir, wê ev herdû, di çerçoveya heyîna hebûnê a bûjenî û zêhnî ve wê di çerçoveya hebûna jîyanê, doamîna û rastîya wê ya xwezayî de wê hebe. Şîhanîyek, bêî ku ew di ardê û di nava axê de çandî bê, wê ji ber xwe dervî wê şîn nebê. Her wusa, wê ev rewş, wê bo her tiştî jî wê wusa bê. Zindiyek, ew mihtacê xwarin û vexwerinê ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê bi xwezaya xwe ve wê girêdayî bê. Di vê çerçoveyê de çendî ku ew bi hevdû ve girdayî jî bê, lê ew tişta ku ew bû, weke ku ew mirov bê, zindiyek din bê û ankû şînahîyek û hwd bê, wê serbxwebûna wê ya ku ew ji hebûna wê tê, wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê rewşa wê re wê ew salixkirina wê, were kirin.

Di rewşa girêdana bi hevdû re û rewşa serbixwebûnîya ji hevdû ve wê, li vir, têgîna gîyane baş û nebaş, wê minaqek baş wê bide me. Her wusa di nava hevdû de wê bijîn. Di serdemên berê ên dûalîsmê de wê ev rewş li ser tevger, kirin û xûyên keseyetî ve wê, şîroveya wê were pêşxistin. Em dema ku li ser tevger, kirin û xûyên keseyetîyê ve wê fahm bikin, wê çaxê, em divê ku weke nirxek darazî, bi nerînê re wê têgîna başî û nebaşîyê wê hildina li dest û wê werênina ser ziman. Ev jî, wê bi xwe re wê ji aliyekî din ve wê têgînekê bide me ku wê hîmê wan wê ji hevdû bê. Yanî, li vir, başî û nebaşî jî wê, ji aliyekî ve wê bi nerîna me re bê. Lê encamên ku ew bi başî û ankû nebaşî re derdikevina li holê jî wê, êdî wê rewşê derxina dervî tevgerkirin, kirin û xûyan. Wê weke rewşek şenber wê êdî wê ew wê bide dîyarkirin.

Li vir, têgîna zêhnê, wê her wusa wê weke rewşek teybet a ku mirov wê di vê çerçoveyê de wê bi rewşa fahmkirinê re wê hilde li dest bê. Di rewşa fahmkirinê de wê de wê têgîna baş jî û ya nebaş jî wê di çerçoveya têgîna dûalîtîkî de wê, weke zêhna cuda û serbixwe, wê di nava wê fahmkirinê de wê temenê wê bi xwe re wê bi afirênê. Minaq, reng û rewşa gîyane nebaş a ahrîman ku ew weke zêhnê wê were ser ziman. Vajî wê, ya gîyane baş jî wê were ser ziman. Lê wê berê mirov, li ya baş bê. Ber ku wê ew di dewama xwe de wê bi herikîna jîyanê re wê di çerçoveyk afirandina jîyanê û xwezayê de wê xwediyê wate bê.

Rewşa zêhnê, di vê çerçoveyê de wê, xwe bide dîyarkirin. Bi wê re jî wê di nava jîyanê de wê, hertimî wê bi du aliyan ve wê herîkin wê bibê. Ji bûyînê û bi ber nebûnê ve wê rewş bibê. Di rewşa fahmkirina wê de wê, têgîna dûalîtîkî wê hizrê bi me re wê bide çêkirin ku wê jîyan di wê de her hebûnên ku ew hena, wê ji aliyê xwe ve wê xwediyê rewşek ku ew piştî bû û pê de wê bi ber nebûnê ve wê bijî. Yanî, wê bijî û piştre bimirê. Piştî mirinê, wê jîyan dîsa bidomê. Her wusa, piştî mirinê domîna jîyanê, wê temenê wê têgîna ku wê bê ser ziman ku wê piştî mirinê jî wê jîyan hebe bê. Têgîna dûalîtîkî, wê di vê çerçoveyê de wê

xwediyê têgîneka dewrûdayimî bê. Li ser vê têgîna wê re wê hizirkirina li nemirîya gîyanê ku ew piştî mirina laş ku ew di darêjkna din de wê hebûna xwe wê bide domandin bê. Têgînên weke rêankarnasyonê û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê sûdbigirin, bihîm bibin û pêşbikevin. Hizirkirina li domandina jîyanê piştî mirinê jî wê, di vê çerçoveyê de wê temenê hizrên nû ên ku wê werina pêşxistin jî bin. Her wusa, ya nemir wê gîyan bê. Ya ku ew dimirê û bimir a, wê laş bê. Ev jî, wê temenê hoyandina mejî û hizirkirinê a lli gîyanê jî bê. Her wusa, gîyanek nemir û ankû têgîna gîyan nemir, wê hertimî mejî û hizirkirinê li xwe bihoyê.

Dûalîsm, di vê çerçoveyê de wê weke têgîneka jîyanî ku ew jîyanê bi hebûnê re ji aliyê wê yê ku ew dijî û ji aliyê wê yê ku ew najî ve jî wê dihilde li dest. Aliyê najî, wê weke alîyê piştî mirina laş ku wê gîyan xwe bide domandin bê. Di vê çerçoveyê de wê piştî wê mirina laş re wê çi ji wê laşê wê were û wê piştre wê çi bibê û hwd, wê li ser wê re wê bi hizirîn û wê li bersivên pirsên jîyanî wê were lêgerîn. Ev têgîna dûalîtîkî, wê di vê çerçoveyê de wê di serdemên xwe yên destpêkê de wê li ser rewşa têgînên pîrozî û ahlaqî û hwd re wê xwe di rewşek felsefîkî û heta a olzanîkî de jî wê bênê hanîn li ser ziman. Lê li vir, mirov, dikarê bi vê têgînê re wê fahm bike ku wê, mejî û aqil pêşbikeve û wê bi aqil wê bi wê re wê êdî wê li jîyanê wê bê nerîn. Ev têgîn, wê di temenê hemû têgînên felsefîkî, olî û zanyarî ên ku wê pêşkeve de jî wê, xwe bide nîşandin. Her wusa, wê piştre di demên zanînê û pêşketina wê de wê li ser têgînên weke zêhn û bedenê û hwd de wê bide dîyakirin. Di roja me de derûnî, wê weke têgîneka ku wê ji dîtin û nerînan wê hewl bide ku wê rewşa wê bandûra wê ya li ser fîzîkê û ankû bedenê wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de lêkolînên bi newrolojikî ên li ser wan têkilîyan re ku ew dibin, wê di vê çerçoveyê de wê tiştekî piştrast bikin. Ew jî wê ew bê ku wê zêhn, wê xwediyê bandûrekê li ser laş bê. Bi wê re jî wê, ew rewşa ahengîya nava fîzîk û zêhnê û ankû zêhn û fîzîkê, wê çiqasî wê hebe? Li vir, ji aliyê van têgînên ku ew pêşketina û wê hin bi hin wê zêdetirî jî wê pêşbikevin ve wê, rewşa kifşkirina bi mejî û zêhnê re wê ji gelek aliyan ve wê werênina ser ziman.

Weke ku em bi rengê pêşketina serdema me a bi têgînên weke derûnîyê û hwd re wê kifş dikin, wê her wusa wê hoyandina li zêhnê û fîzîkê, ku ew pêşketîya wê li vir, ew rewşa dîtînî û nerînî, wê weke rewşeka zêhnî a ku ew xwe dide dîyarkirin bê. Bandûra wê ya li ser laş bi serdestîya wê re wê xwe bide dîyarkirin. Gelek rewşên ku wê mirov bi derûnî wê bijî, wê rewşna ku wê, di vê çerçoveyê de wê girêdayî têkiliya nava zêhn û bedenê bin. Di aslê xwe de mirov, dikarê têgînên weke têgînên derûnîyê, newrolojiyê û hwd, weke têgînên roja me ên fahmkirina têkiliya nava zêhn û bedenê jî wan werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê, bi encam û rewşa wan re wê, zêhn jî û beden jî wê, hem wê bi serbixwe wê werina hildan li dest û hem jî wê bi têkiliya wan a li/ji hevdû û ankû li ser hevdû ku ew dibê jî wê bike ku wê werênê ser ziman. Ev rewş, wê

weke rewşeka ku wê bi pêşketina têkiliya mirov a bi jîyanê û her wusa rengê domandina jîyane mirov jî wê, bi xwe re wê bide dîyarkirin bê. Di rewşek derûnî de mirov, ku ew têkiliya mirov ji jîyanê qût dibê, mirov wê çawa wê di jîyanê de wê bijî? Her wusa di vê çerçoveyê de wê, ji aliyekî ve wê ev rewşeka zêhnî bê. Lê zêhn jî wê, bi wê re wê weke ku wê tenê xwe serbixwe wê bijî bê.

Rewşên weke rewşa têkiliya nava zêhn û bedenê, wê di roja me de wê rastîya pêşketina dûalîsmê jî wê bi xwe re wê werêninê ser ziman. Di rengekî realîstîkî de wê, zêhn û fîzîk, wê weke du rewşên ku ew hena û ji/li hevdû bi bandûr in jî wê, temenê fahmkirinekê bi xwe re bidine me. Em li vir, ji hevdû cuda nikarin tiştekî hildina li dest. Her tişta ku ew serbixwe jî ya, bi wê têkilî û girêdanîya wê re mirov, divê ku wê hilde li dest. Di vê çerçoveyê de wê, rastîtîya dûalîstîkî û ankû realîsma dûalîstîkî wê xwe weke di çerçoveyekê de wê bide dîyarkirin û wê bi çerçoveyek jîyanî, hebûnî û heyînî re wê, pêşbikeve û wê pêşketina xwe wê bi hebûna jîyan, hebûn û tiştayîyê re wê bide domandin. Li vir, di şêwayekê de fahmkirina rastîtîya dûalîsmê, wê di aslê xwe de wê çerçoveyeka fahmkirinê a van têgînên ku em bahse wan bikin a di roja me de bê û bi vir ve girêdayî jî wê, wan têgînên ku me navê wan hilda û hanî li ser ziman jî wê rastîya wan di wê çerçoveyê de bi têgînîyek têgihiştî wê bide nîşandin û dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de mirov, divê ku ew vê rastîyê, bi wê re baş fahmbike ku têgînên weke têgîneka dûalîtîkî û bi teybetî jî rastîtîya(realîsma) dûalîtîkî, wê di çerçoveya rengê aqilê demê, pêşketin û wê rewşa wê ya pirralî a ku ew bi wê re pêş dikeve de wê xwe bide dîyarkirin. Di roja me de wê dûalîsm, di vê çerçoveyê de wê bi realîsma xwe re wê pêşbikeve û wê çerçoveya xwe ya hişmendî û zanînî wê dênê/bênê li holê. Di navaroka wê de jî wê, hertimî wê di xatekê de wê domandina wê pêşketinê di nava jîyanê de wê bi hebûna jîyanê re wê xwe bide domandin. Di roja me de wê rastîya dûalîsmê wê bi realîsme wê re wê xwe di çerçoveyên weke zêhn û fîzîkê û hwd de wê bide pêşxistin û dîyarkirin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê dîroka xwe ya olzanîyê, felsefe, stêrzanîyê, metafîzîk û têgînên weke têgînên serdema me ên weke derûnîyê, felsefeyên zêhnî û hwd re wê xwe bide pêşxistin û hanîn li ser ziman.

Çavkanî;


*Kant, Immenuel (1781): "kritikken av den renne fornuften"

*Aadnanes, Per M.(2012): "livssyn"

* Nietzsches, Friedrich (1883–1885): "Also sprach zarathustra"

*Gaarder, Jostein(1991): " sofis varden"

*Heredot(484-425 f.Kr.): "historie"

* "Gilgamesh(ca. 2210–2000f,kr.): "gilgamesh epiken"

* Homeros (ca 800 f Kr.): "iliaden"

* Zarathustra (cirka 1000 f.Kr.): "avesta"

* Ahmed Khani (1650-1707): "Men û Zin"

*Platon(428), Manon,
*Platon(428);Staten, føste bok
*Aristoteles(384), Fysikk,
*aristoteles(384); metafysikk
*Spinosa, Baruch (1632), The Ethics
*Descartes, Rene (1618) Compendium Musicae
* Descartes, Rene (1626–1628) Regulae ad directionem ingenii
* Descartes, Rene (1630–1633) Le Monde  L'Homme
* Descartes, Rene (1637) Discours de la méthode
* Descartes, Rene (1637) La Géométrie
* Descartes, Rene (1641) Meditationes de prima philosophia
* Descartes, Rene (1644) Principia philosophiae
* Descartes, Rene (1647) Notae in programma
* Descartes, Rene (1647) La description du corps humain
* Descartes, Rene (1648) Responsiones Renati Des Cartes
* Descartes, Rene (1649) Les passions de l'âme
*Childe, Gordon(1944-145), Progress and Archaeology
*Childe, Gorden(1930), The Bronze Age
*Darwin, Charles(1871) Artenes opprinnelse
*Næss, Arne (1967): Filosofiens historie. Bind 1: «Fra oldtid til renessanse»
*Russell, Bertrand (1961): Vestens Visdom,

**Abdusamet Yigit, Cizîra bota, kurdistan.** ..

,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,,